TÎRÊJ WWW.TIREJ.INFO Dîwana Helbestvan û Nivîskara
مجلس الادباء والمثقفين

www.tirej.info www.tirej.name

Ji wêjeya cîhanê

# 30 çîrokên bijare

**Bijartin û wergerandin**

Husein Muhammed

mehname@yahoo.com

## Naverok


Naverok........................................................ 1
Bazê nêçîrê.................................................... 2
Stêr........................................................... 8
Bihar û havîn.................................................. 14
Hêlîn.......................................................... 17
Pîremêrê li ber pirê........................................... 20
Tawisrês....................................................... 24
Aliyê dî....................................................... 32
Rojavabûn...................................................... 35
Bilbil û sorgul................................................ 44
Cilên nû yên paşayî............................................ 51
Pênc diyariyên jiyanê.......................................... 57
Mirina Baldassare Silvande..................................... 60
Pirç nîv dinya................................................. 85
Odeya cêwî..................................................... 86
Bêhêvîtiya pîrejinikê.......................................... 89
Her sermest bin................................................ 90
Mirina şaîr.................................................... 91
Bo xatirê jinê!................................................ 96
Li ser jiyanê..................................................105
Rojnivîska Mirovê Nepêwîst.....................................107
Çend gul ji Gulistanê..........................................115
Kuncik.........................................................127
KEŞÎŞÊ REŞ.....................................................129
Kefîsor........................................................170
Berfîn.........................................................174
Xwelîser.......................................................186
Rûvî û qirrereşk...............................................192
Rûvî û masîgir.................................................193
Sê çîrokên kurt................................................195

## Bazê nêçîrê

Giovanni Boccaccio (1313 – 1375)

*Nehem çîroka pêncem roja Decameroneyê*

Filomenayê bes kir. Dema şabanûyê diyar kir ku êdî wê rojê tenê dora wê û Dioneo maye, wê bi rûkenî dest pê kir.

"Ango niha dora min ya vegotinê ye, gelî xaniman, û ez dê bi kêfxweşî vebêjim jî. Ez dê ji we re çîrokek evînî vebêjim ku ji gelek aliyan ve wek ya berî xwe ye. Bi vê çîrokê dixwazim bo we diyar bikim ka hêza bedewiya we çend xurt e û ka çend baştir e ku hûn bi xwe evîna xwe bibexşin kesekî çiku felek yan qeder pirr car wa dike ku hûn dikevin dest hin mêran ku qet kêrî we nayên.

Wek belkî hûn dizanin, hebû - û belkî hê jî heye - li bajarê me zelamek bi navê Coppo di Borghese Domenichi, yê ku her kesî rêz jê re digirt û li bal her kesî qedirbilind bû, ne tenê ji ber malmeziniya xwe lê ji her tiştî zêdetir ji ber reftar û tevgera xwe ya bêlome. Li pîriya xwe wî herdem li gel cîran û biyanan jî li ser serhatiyên berê suhbet dikir, û bîrhatina wî, delalbêjiya wî û jîriya wî dibû sedema heyraniya giştî. Nemaze wî çîroka Federigoyê kurrê Filippo degli Alberighi vedigot ku xortek esilzade bû û li hemû herêma Toscanayê di çekbazî û mêraniyê de yek ji yên herî baş bû û ji ber hindê delalê ber dilê keç û zeriyan bû. Ew bû dildarî jinek ciwan ya malmezin û ya dema xwe yek ji spehîtirîn û dilbijîntirîn keç û jinên Firenzeyê dihat hesibandin. Navê jinê Monna Giovanna bû lê ax li bextê reş ku jin bimêr bû. Bo ku xwe bixe dilê wê, Federigo cejn û şahiyên siwarçakiyê û şûrbaziyê û yên ji gelek cûnên din li dar dixistin û bêqam malê xwe bo xatira wê pûç kir. Lê ka Monna Giovanna çend bedew bû,

ew hind jî binamûs bû û bala xwe nedida cejn û şahiyên bo xatira wê dihatin lidarxistin. Taliyê Federigo hema hemû malê xwe ji dest dabû. Wî tenê zevîkek erd mabû ku bi zor pê jiyana xwe didebirand, û herwa jî bazek hebû ku yên beraberî wî bazî dibe li ti derê peyda nebin. Evîna wî ji her demê gurr û geştir bû lê dema pê hesî ku êdî hew dikare wa li bajar bijî, wî xwe vekişand xanîkê zeviya xwe û li wir dema xwe bi firrindegiriyê ve borand û bi serbilindî xwe li ber hejariyê girt.

Dema Federigo di wê rewşa kembax de bû, mêrê Monna Giovannayê nesax ket û, dema tê derxist ku mirin nêz dibe, wesiyetnameya xwe nivîsî. Ew qewî zengîn bû û kurrê xwe yê yekane kir mîrasgirê xwe lê pê re biryar da ku ger kurrê wî bêûcax wefat bike, bila Monna Giovanna, ya ku wî pirr jê hez dikir, bibe wergira malê kurrikî. Piştî bicihanîna hindê ew çû ber dilovaniya Yezdan.

Ango Monna Giovanna bû bîjin, û piştî demekê wê bar kir ser eraziyê kurrê xwe daku wek edet havîna xwe lê biborîne. Madem wa bû ku ev erazî nêzî yê Federigo bû, tiştek siriştî ye ku kurrê wê nasî cîranên xwe bû, û ev xortê mirovhez bi dilxweşî li gel Federigo bi firrinde û kûçikan dilîst. Nemaze bazê watedar yê Federigo ketibû dilê wî û dixwest ew baz bibe yê wî lê nediwêrî ji Federigo bixwaze çiku dizanî ku Federigo jî bêhed heyranî wî bazî bû. Lê li çileyê havînê kurrik bi dijwarî nesax ket, û dayika wî bêtixûb jê xemgîn bû çiku ew kurrê wê yê yekane bû û wê di dinyayê de ji her tiştî pirrtir ji wî hez dikir. Bi şev û roj dayik li ber nivîna wî rûdinişt daku xemên wî verevîne û wî dilşad bike. Herî kêm bîst car wê daxwazên kurrikî jê dipirsîn û texsîr nedikir daku wan bi cih bîne. Rojekê kurrikî gotê: "Ger bazê Federigo ji min re bînî, dayê, bawer dikim ku ez ê sax bibim." Dema Giovannayê ev bihîst, ew ket raman û pûnijan daku bizane ka çi bike. Wê dizanî ku Federigo pirr ji wê hez dikir lê herwa dizanî ku ew bi xwe li hember wî xemsar bû. "Ma gelo ez dê bikarim jê bixwazim wî bazî yê ku li gor gotinan yek ji baştirîn bazên

nêçîrê yên hemû dinyayê ye û di ser re jî tek kêfxweşiya Federigo ye? Ma dikarim wa xweperest bim ku tek xemrevînê wî jî jê bistînim? Wê bênavbirr ev ji xwe dipirsî, û tevî ku dizanî jî ku dê Federigo bazê xwe bidiyê ger jê bixwaze, wê ti soz nedan kurrê xwe û bersiva daxwaza wî neda. Demek dirêj pê ve neçû berî ku evîna hemberî kurrê wê ser ji şik û gumanên wê stand û wê biryar da daxwaza wî bi cih bîne, çi dibe bila. Daku qedirê Federigo bigire, wê biryar da bi xwe biçe seredana wî, li şûna kesek din bişîne. Wê ji kurrê xwe re got: "Rehet be, lawê'm, û sax bibe! Soz be serê spêdeyê ez dê berî her tiştî bo te wî bazî bînim." Kurrik bi sozê wa şad bû ku wa dixwiya tavilê saxtir dibe.

Spêdeya roja din Monna Giovanna li gel jinek dî bi rê ket û qaşo bi tesadifî di ber xaniyê Federigo re borî. Seqa û hewa ne yê nêçîrê bû lew Federigo li malê di nav baxçeyê xwe de bû. Dema ew bi baxçe ve mijûl bû, yekî ji xizmetkaran peyam gihandê ku xanim Giovanna hatiye seredanê. Ew hêbetmayî û bi dilxweşî bezî mal ve û çav ket bi Giovannayê ya ku hurmetane silav kirê. Federigo camêrane xwe li ber çemand, û xanimê bersiv da awirên wî yên dipirsîn: "Rojbaş, Federigo! Hatim heqê wê ziyanê bidim ya giha te dema te pirr ji min hez dikir. Diyariya dixwazim bidim te ew e ku ez û hevrêya xwe dê firavînekê li cem te bixwin." Federigo bi nefsbiçûkî got: "Delaltirîn dilber Giovanna! Ne haydar im jê ku ti ziyan ji te gihabe min lê bi hebûna te wa bextiyar bûme ku ev seredana te ya li cem min - tevî ku neçar im wek mazûvan û mêvandar nekêrhatî diyar bibim jî - bi baweriya min ne heqê ti ziyanan lê berdewamiya wê qenciyê ye ya te diyarî min kiriye. Qet ne ji ber min bi xwe lê ji ber te lêborînê hêvî dikim ku nikarim te bi şeng û şayane pêşwazî bikim." Wî ji Monna Giovannayê daxwaz kir ku kerem bike hindirr û ew bir nav baxçe. Ji ber ku ti kes din tinebû li gel suhbetê bike, wî ji Monna Giovanna xwest kêlîkekê li gel jina pîr ya baxçevanî suhbetê bike ta ku ew bi xwe çavdêriya danîna sifreya firavînê bike.

Tevî nedarî û hejariya xwe jî Federigo ta niha pê nehesîbû ka wî çend nebaşiyek mezin kiribû dema zengîniya xwe hemî pûç kiribû. Lê niha ku wî ti tişt nebû dane ber vê xanimê ya ku wî ji bo xatira wê bi sedan mêvan mazûm dikirin ber maseyên sifreyên ji ber giraniya lezetên bihagiran li ber şkestinê bûn, niha ew tê gihişt ka wî çend bêhişî û bêaqilî kiriye, û ji dil lê poşman bû. Wî nifrîn li siûda xwe ya xirab dibarandin û bêhiş li dor xwe paş û pêş dihat û diçû lê ne pare û ne jî tiştên bihagiran didîtin ku bike gerew û rehîn daku pê firavînekê raberî vê xanimê bike. Pirr dem vekêşa û wî hê jî ti tişt nebû dane ser sifreya vê xanima nirxbilind ya wî dixwest li gor nirxê wê bide keremkirin. Li aliyê din wî ji serbilindiya xwe nedikir alîkariyê ji ti kesî bixwaze, û ku wî çavek li bazê xwe yê bihagiran gerrand, biryar da ku dawîn car wî bazî bi kar bîne. Wî zora xwe bir, baz ji lîsê wî deranî û stulk lê veçemand ji ber ku bawer dikir ku ew dê bi dilê mêvana wî be. Wî baz bi lez da rûçikandin û ferman da ku ew di tavikê de bêt qelandin. Û paşî mêzerek çûrr-spî, ji wan yên wî hê çend lib mabûn, li ser maseyê hat raxistin, ew vegerrî nav baxçe û ji mêvana xwe ya xweşdivî re ragihand ku ew firavîna sade, ya wî pê çêdibû, amade ye. Monna Giovanna li gel hevala xwe bi wî re çûn û rûniştin ser sifreyê. Bêyî ku bizanin ka çi bû raberî wan hatiye kirin, wan bi mêvandariya merdane ya Federigo têr xwar.

Piştî firavînê wan li ser gelek mijaran suhbet kir, û paşî Monna Giovanna biryar da xwe ku taliyê suhbetê bîne ser mijara bingehîn. Wê bi dengek nerm û narîn dest pê kir: "Federigo, dema bipûnijî li binamûsiya min, ya ku ihtimal e te pirrî car wek dilreqî yan bêdiliyê hesibandibe, dibe asantir tê bigihî ka dêbav çend dildariyê qurbanî zarroyên xwe dikin, û hingê hêvîdar im dê li min biborî ku diwêrim vê daxwazê ji te bikim. Jixwe te ti zarrok nînin lê min kurrek heye, û ez nikarim ji xwe qut bikim wan hestan yên dilê her dayikê vedijînin. Lew neçar im sinorên maqûliyê bigavînim û ji te wî tiştî bixwazim yê ku li ber dilê te pirr şirîn e çiku dixwiye ew tek tişt e ku xemên te vedirevîne û kêfa te tîne. Bi kurtî: Ez

bazê te dixwazim. Dilê kurrê min hind ketiye wî ku ditirsim nesaxiya wî kembaxtir bibe û kurrik ta belkî bimire ger nikarim wî bazî jê re bibim. Ji te hêvî dikim - ne ji ber wê evînê ya te hemberî min hest pê kiriye lê ji ber cewerî û camêriya te ya herdem diyar - wî bazî diyarî min bike. Hingê dikarim bibêjim spas bo merdiya te ya camêrane ku kurrê min ji merg û mirinê xilas kir, û ji ber vê qenciyê ez dê herdem deyndarî te bim."

Dema Federigo guhdarî daxwaza Monna Giovannayê dikir, ew ji qehran lal bû çiku tê gihişt ku wî ji dest daye ew tek delîva jiyana xwe ya ku dikarî carekê xizmetek bikêr bo dilbera xwe bike. Ji bilî axînek kûr ti jê nehat, û Giovannayê fam kir ev axîn wateya hindê ye ku ew nikare dest ji bazê xwe berde. Giovanna li ber bû bibêje ku ew êdî wî bazî naxwaze lê hê ew negihabû, Federigo dest bi axivînê kir: "Xanima çak. Ji wê gavê, ya ku Yezdan wa hez kir ku çirayê evîna te di dilê min de hilbibe, siûda min herdem kembax bûye, û heqdar im gilî û gazinan bikim ku felek li min xayin bûye. Lê hemî, ya ku hatiye serê min, kêm e li ber wê êş û azarê ya niha hest pê dikim, li ber vê êş û azara nayê tehemilkirin. Ca ku tu - ya li rojên zengînî û dewlemendiya min ti car piyek wê bi mala min nediket - niha hatiyî û te xwe avêtiye ber mala min ya belengaz daku vê diyariya bêqedir ji min bixwazî - û ku ez... û ku ez nikarim vê daxwaza te bi cih bînim. Ca ez dê bi kurtî ji te re bibêjim ka çima nikarim. Dema min bihîst ku tu dê wa pirr qedir bidî min ku li ser sifreya min bifermî firavînê, tavilê lê pûnijîm ka çi raberî mêvanek wiha qedirbilind bikim. Bêguman min xwest baştirîn tiştê heyî bidim keremkirin, ket hişê min ku bazê min bi kêr tê ji ber ku ew xweşdivîtirîn tişt bû ku min hebû - û wisan ew bû firavîna te. Min bawer dikir ku ew baştirîn awa bû ku wî bazî bidim. Lê ku niha wî bi awayek din dixwazî, ji qehran dipeqim ku nikarim daxwaza te bi cih bînim. Bawer dikim ku ev xem qet ji dilê min dernayê." Daku Monna Giovanna ti şikan ji gotinên wî nebe, çû nikil û nînokên wî anîn û danîn ber piyên wê.

Dema Monna Giovannayê mesele jê bihîst, pêşî lome lê kirin ku wisan bazê xwe kuştiye lê pirr dem pê ve neçû ku wê êdî nikarî nebe heyranî wê merdiya wî ya hejarî û nedariyê nikarîbû kêm bike. Lê ku ji ber vê sedemê wê êdî ti hêvî nemabû ku daxwaza kurrê xwe bi cih bîne û ji ber ku ew xemxwerî nesaxiya kurrê xwe bû, bi dilek bi derdan dagirtî vegerrî mala xwe. Ca sedem xeyalşkestina ji ber bidestnexistina bazî be yan jî nesaxî ji cûnek wa be ku encama wê dê her mirin ba, herhal kurrik piştî çend rojan mir û kul û kovanên dayika xwe pirr giran kirin. Monna Giovannayê heyamek pirr dirêj şîniya kurrê xwe kir lê ji ber ku hê ciwan bû û bûbû xwedî mîrasek mezin, birayên wê dest pê kir jê daxwaz kir ku dîsan bizewice. Pêşî Giovanna dijî hindê derket lê wan bela xwe jê venekir. Û dema lê pûnijî ka Federigo çend pirr jê hez dikir û çi mêranî kiribû ku bazê xwe yê fêris gorî wê kiriye, wê ji birayên xwe re got: "Ger hûn destûrê bidin, qet ne dijî hindê me ku ta dawiya jiyana xwe bîjin bijîm. Lê ger hûn îlle bixwazin ku bizewicim, hingê ez dê Federigo degli Alberighi - lê qet ne ti kes dî - bibijêrim." Birayên wê tinazî bi vebijarka wê kirin: "Ca ew bo çi ye?" ew jê pirsîn. Lê wê bersiv da: "Birayên delal. Dizanim ku ew ne zengîn e lê bo min zelamê bê zengînî çêtir e ji zengîniya bê zelam." Bira tê gihiştin ku wê ji dil biryara xwe daye, û ku ew jê agadar bûn ku Federigo camêrek bû ku bi şeref xwe li ber barê belengaziyê ragirtibû, wan xwişka xwe da wî û hemî mîrasê wê li wan kir next û qelen. Piştî Federigo li gel wê xanima hind pirr jê hez dikir zewicî, ew êdî bo camêrek yê ku dizanî baş sereguhiya mal û maliyeta xwe bike. Ew û jina xwe ya binamûs û pêbawer hê çendî çend salan bi hev re jiyan."

*Wergerandin: 01/2004*

*Name ji Aşê Min*

## Stêr

Alphonse Daudet (1840-1897)

*Çîroka şivanek provenceyî*

Hingê, dema min li çiyayê Luberoll şivaniya lawiran dikir, carinan bi hefteyan wext derbas dibû bê ku benderuhekî bibînim. Ez li çerîngehan bi tenê bi seyê xwe Labr û miyên xwe re bûm. Geh tenêtîperestê Mont-de-l'Ure di wan deran re diborî û li giyayin derman digerî, geh jî wisan dibû ku min serçavên tenîgirtî yên koçerekî didîtin; lê ew mirovên cahil û bêpêjnîxwaz bûn û haya wan ji bayê felekê û galegotên gund û bajarên geliyan tine bû û ew ne axivînxwaz bûn. Loma bi rastî bextiyar bûm dema min du hefteyan carekê dengê zengilên hêstira xanedanên xwe dibihîst dema ew bi evrazî re hildiket û min didît ku kurikê berdestk ê malê yan metê Norade ji piştbetenê xwiya dibû daku ji min re dîsan xwarin û pêxwarina du hefteyan bîne. Min bi mereqdarî nûçe-mûçeyên gundên gelî ji wan dipirsîn, min dixwest bizanim ka kî bûye, kî miriye, kî maye lê herî zêde bala min li ser dotzeriya malmezina min Stephanette bû ku bedewtirîn keça hemû cîhana min dîtî ye. Min dixwest balkêşiya xwe diyar nekim loma min bi awayek din rewşa wê dipirsî: gelo ew xweş diçû dîlan û şahiyan, gelo her kesên nû dihatin xwazgîniya wê; û heke niha kesek ji min bipirse ka ji min peritîrebenokê şivanê çiyayî re çi, ez ê bibersîvinim ku xort bûm û Stephanette bedewtirîn ronahî bû ku min li erd û asmanan dîtiye.

Yekşemekê, dema bendewarî xwarina xwe bûm, ew nehat. Danê spêdeyê fikirîm ku dibe ji ber nivêja dirêj a roja pîroz be. Nîvro bahozek bihêz rabû û ji xwe re ramîm ku hêstirê nikariye bimeşe çiku rê herrî ne. Dawiyê li derdorî sêyê, dema asman hedinîbû û çiyageha baranê daşûştî li ber rojê diteyisî, min ji nav şepîna xunavên baranê yên ji çilûyê daran diketin û ji nav xwişîna robarên baranê boşkirî dengê zengilên hêstirê, ku mîna dengê zengilên dêrê li roşanên hêkane û paskalyayê rewşen û şeng bû, sihirand. Lê siwar ne kurikê berdestk û ne jî Noradeya pîr bû. Ew... ma hûn dizanin kî bû! Dotzeriya malmezinan bi xwe bû. Ew bi şepalî di navbera zembîlên ji şivan çêkirî de siwar bû û gep û alekên wê ji ber bayê hên ê çiyayîn sor û hinarî bûbûn.

Kurikê berdestk nesax bû û Noradeya pîr jî li betlaneyê bû û çûbû cem zarokên xwe. Stephanetteya şirîn ev hemû yek di wê navberê re ji min re got dema ji hêstirê dihat xwarê û diyar kir ji ber wendabûna xwe ya bi rê ve dereng bûye lê bi cilên xwe yên cejn û şahiyan, gulîbendek bi pirçê ve, bi kiras û tentene û dantêlên xwe yên rengvekirî wer dixwiya ku ne li nav daristanan sereder nebûye lê li govend û dîlanan gîro bûye. Ya Yezdan, çi afirandiyek dilhebîn bû! Çavên min ji bejnûbala wê venedibûn! Ku rastiyê bibêjim, min ew ti caran wiha ji nêz ve nedîtibû. Carinan zivistanê, dema celeb ji zozanan berî deştê hatibû dan û ez êvaran diçûm di xanî ve şîvê bixwim, dibû ku ew di xanîkê em lê re biboriya bê ku ji berdestkan re gotinekê jî bibêje, hertim cilên xweşik lê bûn û piçekî jî serbilind bû... Lê niha ew li ber min bû mîna ku tenê ji min re be; ma êdî çi ecêb ku heke serê min hinekî gêjole bibe.

Ku Stephanette xwarin ji selikê û ji nav mêdekê derxist, wê dest pê kir bi mereqdarî li derdorên xwe nerî. Dangên fîstanê xwe yê cejnan hilda daku pîs nebe û ket hindirê kotana miyan. Wê dixwest wê quncikê bibîne ya doşeka min a ji kayê ya bi pîstê miyan niximandî, ketanê min ê

biserkulav, gopalê min ê şivanan û çifteya min lê bîbînr. Vê hemû yekê bişirek da ser rûyê wê.

- Tu li vir jiyana xwe diborînî, şivanê reben. Ma çawa sebra te tê ku bi tenê yî? Tu çi dikî? Çi difikirî?

Min dixwest bibersivînim: "Li te difikirim, zerîcanê", û hingê min ê qet derew nekira lê wisan heyirî bûbûm ku zimanê min nedigerî. Bawer dikim wê tê derdixist lê dixwest bi pirsên xwe hê zêdetir min matmayî bihêle:

- Pa xweştiviya te, tu carinan sera wê didî? Bawer dikim ew bizinek zêrîn e yan jî keçperî Estrella ye ku tenê li gupik û lûtkeyên çiyayan dimeşe…

Lê li wir, dema henek dikirin û dikenî, ew bi xwe dişibî keçperî Estrellayê, û ku diviyabû ew zû ji wir biçe, hemû hatina wê mîna xwiyabûna çîrokekê bû.

- Bi xatirê te, şivano.

- Xwedê bi te re be, zerîcanê.

Û wiha ew, selikên vala di destan de ket rê.

Dema ew wenda bû ser rêya bi betenê ve sernişîv diçe jêr, wer dixwiya ku kevirên ji bin simên hêstirê digindirîn û girêl dibûn yek bi yek bi dilê min diketin. Min demek dirêj, dirêj çûna wê bihîst; û hemû rojê ji min re wisan bû mîna ku di xewê de bim bê ku biwêrim xwe vebilivînim jî daku dîmenên vê xewna şirîn ji dest nedim. Êvartir, dema hengur û tarîgewrikê xwe da gelî, û miyan bi mehe-mehkî xwe dakişand nav hev re, min bihîst ku bangî min tê kirin û min dît ku zeriya me dîsan vedigere, vê carê ne wek berê rûken lê ji ber sarma û tirsê lerzok û şipîşil. Diyar bû li jêrî şkêreyê çemê Songue piştî şirrebaranê boş bûbû û di ser re avêtibû

û ku kêm mabû Stephanette dê bixeniqiya dema ji bo derbasbûnê li hember herikê li ber xwe dabû. Herî xerab: êdî vê dema êvarê veger nedihat hesabê çimkî keçzeriyê dê di jiyana xwe de nikariya li avek wiha derbas bibe, min ê jî nikariya pez tikîtenê bihêlim. Wê fikirê, ku diviyabû ew bi şev li çiya bimaya, ew pirr tengezar dikir, bi taybetî ji ber ku malikî ji ber wê dê şepirze bibûna. Min di aramkirina wê de texsîrî nekir:

- Şevên tîrmehê kurt in... Tenê kurtebîskekê...

Û min bi lez û bizav agirek gurr û geş hilkir daku ew bikare lingên xwe û cilên xwe yên şipîşil ziwa bike. Paşî min şîr û penîrê miyan anî ber wê lê keçika reben ne razî bû pariyekî bixwe û ne jî xwe germ bike, û ku min rondikên pivdanokî li ser gepên wê dîtin, girî hat çavên min jî.

Di wê bûbû tarî. Êdî tenê sorîgewrikek mijîn li gupikên çiyayan li hêla roj lê avabûyî dima. Min tembî keçzeriyê kir ku li kotana miyan xwe pal bide. Ku min pîstek nû yî bedew jê re li ser kaya paqij raxist, ez bi xwe derketim û li ber derî rûniştim... Asman govan û şahidê min e ku tevî şewata agirê evînê di demarên min de jî, ti mebestek xerab hema neket dilê min jî. Di dilê min tenê serbilindiyek mezin hebû dema diramîm ku li quncikek kotanê, hema li rex celebê min ê bi mereqdarî lê dinerî, keça malmezina min mîna ji berxikên ez şivan berxika bihagirantirîn û sîstirîn li wir paldayî bû. Ti caran mîna hingê asman ji min re ne wisan berfire û stêr jî geş bûne... Di gavekê de deriyê kotanê vebû û Stephanette hat derê. Wê nedizanî li wir binive. Miyan bi xwequlipandinê re ka dixijxijand û di xewê de dimehmehîn. Wê pêtir dixwest bê ber agir. Loma min ketanê xwe di ser milên wê werkir, agir gurrtir kir, û em herdu li wir li rex hev û bêdeng rûniştin. Heke hûn carekê jî bi şev li bin li ber ronahiya stêran mabin, hûn dizanin ku dema yên din radikevin, di tenêtî û bêdengiyê de cîhanek cihê, cîhanek razdar û nehîn vedijî. Hingê kanî bidengtir dilemelemin, li lîçên avê çirûskên biçûk hildipeqin. Giyanên çiyayan azad digerin, û hewa tijî vizevizek dengnizm e mîna ku mezinbûna pel û giya

bê bihîstin. Roj dema afirandiyên jîndar e lê bi şev xwerist û xwezaya nejî jî şiyar dibe. Heke yek fêr wê yekê nebûbe, ew jê ditirse... Stephanette jî hertim direcifî û bi bihîstina qirçepirçekê jî xwe dida ber teniştа min. Qîrînek dirêj, hawarek keserkûr a li hewa dilerziî ji gerrika avê ya li jêr diteyisî hat. Di heman demê de berqa xuricîna stêrekê li raserî me, li hêla wê nalînê xemilî, mîna ku wê hawarê ronahî bi xwe hilgirtibe.

- Ew çi bû? Stephanette hêdî pirsî.

- Giyanek bû ku raguhezî biheştê, min bersivand û navê Xwedê anî.

Wê jî wisan kir û bîskekê bi heyranî çavên xwe li asmanan gerandin. Dû re got:

- Ango rast e ku hûn şivan zanewer in?

- Qet na, zeriya delal. Lê nêztirî stêran dijîn û ji deştiyan baştir dizanin ka li jor çi diqewime.

Wê hê jî fedikir asman, ketan di milan werkirî, mîna keçşvanek biçûk a asmanî.

- Aax, çend gelek in! Çi bedew in! Min ti caran wiha pirr stêr nedîtine... Tu navê wan dizanî?

- Belê... Binere, li wê dera han li raserî me Rêya Yaqob Ewliya ye (Kadiz). Ew ji Fransayê rasterê diçe Îspanyayê. Yaqob Ewliyayê Galizyayê ew nîşanî wir kir daku rê nîşanî Charlemaignê Mezin ê çeleng bide dema ev çû şerê saraseniyan. Li wê deran han, dûrtir Erebeyên Giyanan û çar xirxalên wan ên biriqdar in. Ew sê stêrên han ên li pêşî wan Sê Bargir in, û ya biçûk a li teniştа ya sêyem jî Ajovan e. Dibînî ka çi baranek stêran li derdorî wan dadibare? Ew giyan in ên ku Yezdan nagire cem xwe... Ya li wê dera han, hinekî jêrtir Sêtilk ango Sê Mîr (Orîon) e. Ew ji me şivanan

re demjimêr e. Tenê ku berê xwe bidimê, niha jî dizanim ku nîvşev derbas bûye. Hinekî datir li hêla başûr Yohenneyê Mîlanoyî (Sîrîus), pêtalhilgirê stêran dibiriqe. Li ser wê stêrê şivan çîrokekê dibêjin. Wisan qewimî ku şevekê ji şevan Yohenneyê Mîlanoyî, Sê Mîr û Rekeha Mirîşkan (Hirça Mezin) vexwendiyên stêrdostekî bûn. Rekeha Mirîşkan, a ku herî zêde xwe lezand, pêşîn çû û rêya jorîn bijart. Li wê dera han li jor, hema li lûtkeya asman binere. Sê Mîr bi rêya jêrtir ve meşîn û gihan wê lê Yohenneyê Mîlanoyiyê keslan û tembel ji xewê şiyar nebûbû, pirr li pey ên din ma û xeyidî loma gopalê xwe li wan daweşand û xwest wan bigire. Loma Sê Mîr bi navê Gopalê Yohenneyê Mîlanoyî jî tên nasîn... Lê ji stêra bedewtirîn a me bi xwe ye ango Stêra Şivanan (Venus) ku li spêde û berbeyanê, dema em terş diajon çerîngehan û dema em wî tînin mexelê jî, ji me re dibiriqe. Em jê re Lovyanka Maguel jî dibêjin, Lovyanka Maguel a bedew ku radihêle Peterê Provenceyî (Saturnus) û her heft salan carekê pê re şû dike.

- Çi? Ma stêr jî şû dikin?

- Belê, belê.

Lê ku tê koşîm jê re ravebikim ka ew zewacên stêran çawan in, min hest pê kir ku tiştek nerm, tiştek pak bi nermî li ser milê min e. Serê wê yê li ber xewê xwe spartibû min, û bend, tentene û pirça wê ya pêldar xijxijek şirîn dikirin. Ew li wir, xwe dayî ber milê min raket û nelivlivî jî ta stêrên li asman neçilmisîn û rojek taze ew ji ber çavan ranemalîn. Min lê dinerî ka ew çawa li wir razabû û di nava min de hinek nearamî hebû lê wê şeva têrstêr, a ji bilî hestên bedew ramanek din di min de hilnedida, ez disitirandim. Li derdorî me stêran, mîna celebek boş î sernerm, li ser rêya xwe meşa xwe didomandin, û carinan hema ji min re dixwiya ku yek ji wan stêran, ya bedewtirîn û zelaltirîn, rêya xwe wenda kiribû û xwe dabû ser milê min û nivistibû.

## Bihar û havîn

Juhani Aho (1861 - 1921)

Pêşî ew wek evîna du ciwanan e. Ew hîn, zelal û pak e. Ew ne agir û gurr e lê geş û ronîdar e. Lê tavilê şirrebaranek ji esmanê gewrbûyî lê dide; bayek tezî avê dişilqîne û deviyan hildiçirrîne; hemû dinya bêçare dixwiye mîna ku li şûna havînê payiz hatibe û her tişt lêb û xapandin be... "Çivîka reben, bila tu mabayî li warên xwe yên her-havîn. Ma kê got te were vir bimire... Li vir tenê xem û rondik û recif hene, û tav wenda dibe nav mija şevîn."

Lê xem wek xemê nayê hesabê, dil naşkê û cî nade tarîtiya şevê çiku li der her ronahî ye. Û ew ronî jî her ji wî cî têt yê zivistanê tarîtî jê dihat. Her spêde ew zêdetir dibe, roj bi roj nêztir dibe, perdeyan ji ser xwe vedide û - mîna xwe veşartibe - virt xwe dide der.

Û spêdeyekê wa ye qey evîn hatibe ragihandin, wek nîşanî hatibe birrîn. Deryaçe aram û bextiyar e, giya serê xwe hilaniye, spîndar dibişkive, firrinde distrin, ji spêdeyê ta êvarê çû-çûya çivîkan e, axa zeviyan şiliya xwe hildifûrîne, rûbar bi xwişexwiş û lemelem in, terşûtewal derdikeve çerîngehan, li nîvgiravekê bilbilek li hindavî lehiya avê dixwîne, av dilerize - û sirişt gustîlkan diyarî biharê dike.

Hewa germ û nerm e, ewrek tenê jî li esmanan peyda nabe, dil dixwaze ji xweşiyan tilîliyan vede. Ne sar e û ne jî direcife, tenê hest bi şadiya jiyanê dike.

Lê hewa hê germtir dibin, tav derdoran dihemêzîne û dihedirîne, her spêde hetav berbanga xwe firetir vedike û dinyayê xurttir digivêşe koşa xwe, şarayîtir dimaçîne û gep û alekan lê disincirîne. Firrinde dikevin lîstik û baziyên xwe, ji gupikên daran ta reh û rîşên tirraşan bi hev re qulîpankan li xwe didin, pêşû-mêşû şiyarî vizevizînê dibin, masî li beravên mêrgên tavîn didin pey hev, pepûk bi duawazî dikû û hewa miştî keftûleft û deng û pêjnan e. Pelên daran mestane çengên xwe vedikin. Şerava erdê dikeve hinavî gilyazan, gul wê bêhed dinoşin, ax rengên geş dide wan - û sirişt haziriya dawet û dîlana afirandiyên xwe dike.

Ew hê armanca xwe fam nakin, hê tê nagin ka çi ye wan nearam dike.

Ew bişkivîn e ku digihe, ew tovê gulê ye ku di qalika xwe de amade dibe, ew nifşek e ku dixwaze xwe bigîne hemêza yê dî. Û her geştir dibe şîniya esman, her şêntir dibe beten û berroja darên peldar, her rengîntir dibe mêrg û çîmena guldar, her teyisoktir dibe dûrahî... Lê dîsan mijdartir dibe sersînga esman. Û li paş mijê ewrên qehweyiye vebûyî diperçivin. Ew jî mîna gulên gir yên li ber bişkivînê bicoş û dilgerm in. Ew berhewa dimeşin û li hev rast tên û bi hevbûnê mezin dibin. Êdî giran dibin û nikarin bilivin; li ber daketinê ne. Êvarê pelate dibin lê spêdeyê êdî ji duh jî girtir in, bi zorê xwe digirin.

Giyanê kulîlkan yê bîndar di ser ax û avan re belavî nav daristan, mêrg û zeviyan dibe. Sirişt mîna dîwana dîlanê distre. Dest destan digirin, gep li gepan digerin, dev li devan, û lêv xwe raberî lêvan dikin.

Birûsk ji esmanan dişirqin. Rûyê erdê wek rûyê rengguher yê keçzeriyan reş dibe û geş dibe. Ewr xwe diavêjin hemêza hev û ji hemêzandina wan

çiya digurmin û gelî bersivan didinê. Ew strana zemawendê ye, sirûda markirinê ye, û baran morîk û mircanan dadirijîne ber nivîna bûkaniyê.

Şeva kurt ya ewrîn hawirdor hêmin û hênik dike. Sirişt bêpêjn dinive, nalive, naqeliqe, bi kirpekê jî xwe ranagihîne.

Spêde êdî bayek nerm û pak tîne. Bi rêkî gupikên daran dihejin, dexlûdanê zeviyê hêdîka dadiçeme, pêl bi xweşrêzî dişilqin, û dêmê siriştê jidil e. Dema nîşaniya wê bi dawî hatiye, kêlîkên şadiyê borîne, wê zemawenda xwe kiriye û meha xwe ya hingivîn borandiye. Niha tovê xwe hildigire, berhemê xwe hildibere û xwe amadeyî armanca mezin dike: hilçinîn. Bihar çûye û havîn hilhatiye.

*Ji fînî: 5/2003*

## Hêlîn

Bjørnstjerne Bjørnson (1832 - 1910)

Mala Endre bû navê wî gundikê varê û bi çiyayên bilind dorpêçkirî. Gelî rastgeh û biber bû lê çemek fire yê ji çiyayan ew ker dikir. Ev çem dirijî deryaçeya li binê gund, cihê meydanek berfire.

Bi belemê bi deryaçeyê ve hatibû yekem kes yê ku ev dever çandibû. Navê wî Endre bû, û rûniştvanên gund dûndeha wî bûn. Hinan digot ku ew piştî kuştina kesekî revîbû vir lew ûcaxa wî wa reşbîn bû. Hinan jî digot ji ber çiyayan e ku wa bilind in ku ta li nîvroyên nîveka havînê jî tav li gelî nade.

Hêlîna xertelekê li raserî gund hebû. Ew li ser lêva zinarekî li rizdeyek bilind yê çiya hatibû çêkirin. Her kesî dikarî bibîne dema xertela mê dadida ser hêlînê lê kesî nedikarî hewa bikeve wir û xwe bigihîniyê. Nêrexertel teşîrêsk li raserî gund dikir, geh xwe di berxekê werdikir, geh di karikekê; carekê wî ta zarokek biçûk jî revandibû. Lew li gund aramî peyda nedibû hindî ku ew hêlîn li wir ba. Xelkê digot ku berê carekê du birayan xwe gihandibû hêlînê û ew xirab kiribû. Lê vî zemanî kesî nikarîbû xwe bigihîniyê.

Çi cara du kesan li gundê Endre hev dîtiba, suhbeta wan rikrast diçû ser hêlînê û wan serê xwe radikir û li wê dinerî. Wan ew hemû dizanî ka xertel kengî piştî sersalê vegerîbûn, ka wan li kû xwe di erdê werkiribû û ziyan kiribû û ka kî dawîn car tê koşîbû hewa bikeve hêlînê. Kurran hê ji zarokî ve xwe dielimand hilketina bi dar û zinaran ve daku carekê wek wan herdu birayan hilbikevin hêlînê û wê xirab bikin. Li dema çîroka me Leif fêristirîn xortê gundê Endre bû. Ew ne ji xelkê gund bû, pirça wî xelek û çavên wî hûr bûn û ew di hemû pêşbaziyan de jêhatî bû û dilketiyê keç û zeriyan bû. Wî hê ji zû ve pesna xwe dida ku dê carekê bigihe hêlînê, lê yên pîr texmîn dikir ku ya baş ew e ku bi hindê methên xwe neke.

Van gotinan ew zivêr dikir, û hê berî ew bibe zelam,wî xwe li hêlînê cerriband. Yekşemek zelal ya berhavînê bû; diyar e têjik ji hêkan derketibûn. Bi komên mezin xelk li binê rizdeyê çiya civîbûn daku lê temaşe bikin. Yên pîr ew hişyar dikir û yên genc ew def dida berev hewaketinê. Lê wî tenê guh dida daxwaza xwe, sekinî ta ku mêxertel ji ser hêlînê firrî, kurrik xwe hilavêt û li bilindiya çend bermilan şorr ma. Ew dar li kendek zinaran bû û kurrik dest pê kir pê ve hilket. Ber û kevirk ji ber piyên wî vediresîn, ax û xîz girrêl dibû xwarê. Wek din ti deng nedihat. Tenê xwişîna dengnizm ya bênavbirr ya çem dihat bîstin. Tavilê rizde dewr da. Kurrik demek dirêj bi destekî ma, piyên wî ji ber diçûn û wî nedikarî baş bibîne. Gelekan, bi taybetî jinan, berê xwe jê girt û got ku wî dê wiha nekira ger dêbavên wî sax ban. Lê taliyê wî xwe gihand bineciyê. Lê car destek wî û car piyek wî sist dibû û kurrik dihilisî lê cardî jî xwe pê ve dişidand. Yên li jêr dengê lêdana dilên hev dibîst. Hingê keçikek zirav, ya ku bi tenê li ser kevirekî rûniştî bû, rabû ser xwe. Wê destê xwe dirêjî jor kir û gazî kir: "Leif, Leif, çima wa dikî?" Hemû li wê zivirrîn, bavê wê li tenişt wê rawestî bû û hişk lê dinerî lê keçik pê nedihesî. "Were xwarê, Leif", wê bang kirê. "Ez ji te hez dikim. Tu bi hewaketina wir ti tiştî bi dest naxî.!" Xelk pê hesî ku kurrik li pêşniyaza

wê fikirî, çend kêlîkan rawestî lê paşî hewaketina xwe domand. Dest û piyên wî xwe baş zeft dikirin lew demek dirêj her tişt baş meşî lê paşî westînê dest pê kir ji ber ku kurrik pirr car radiwestî. Kevirkek gindirrî jêr. Ew mîna pêşbîniyê bû; hemû kesên li binê rizde lê nerî ta kevirk ket erdê. Pirraniya wan êdî xwe ranegirt lew ji wir pelate bûn. Tenê keçik hê li ser kevirê bilind sekinî bû, destên xwe dihejandin û li silal dinerî. Leif tê koşî bi destekî xwe bi rizde ve zeft bike lê destê wî dahilisî - keçikê baş dît - wî da xwe bi destê din lê ew jî daxijikî. "Leif", keçik wa bilind qîjî ku çiya deng veda, û hemûyên din jî beşdarî qîjîn û qîrrînê bûn. "Ew ê bikeve!" ew qîrrîn, û jin û mêran destên xwe ber wî ve dirêj kirin. Belê, ew dahilisî, zîx, ber û ax li gel xwe da-anîn, hê jî datehisî û hê lezgîntir dahat. Mirovan berê xwe jê girt, wan bîst ka çawan qajînek dirrinde ji rizdeyê çiyayê li pişt wan hat û ka çawan tiştek giran mîna gumtilek axa şil şepî erdê.

Dema wan dîsan wêrî awir bidinê, wan dît ku kurrik bi erda li binê rizde ve wa merriçîbû ku êdî nedihat nasîn. Keçik li ser kevir daketî bû, û bavê wê ew rakir û bir.

Xortan, ku herî zêde Leif ber bi hewaketinê pal dabû, hema newêrî li hawarê biçin, hinan ta newêrî lê binerin jî. Hingê yên pîr neçar man dest biavêjinê. Zelamê herî pîr, dema dest avêt kurrik, got: "Mixabin ku ev bi serî hat - lê" wî lê zêde kir, "baş e ku tiştek wa bilind heye ku her kes nikare xwe bigihîniyê."

*Wergerandin: 12/2003*

## Pîremêrê li ber pirê

Ernest Hemingway (1898 – 1961)

Zelamek pîr yê xwedî berçavkên milbendpolayî û cilên tozgirtî li rex rêyê rûniştî bû. Di ser çem re pirek berdemkî hatibû çêkirin û erebe, tirimpêlên barkêş, zelam, jin û zarrok di ser re derbas dibûn. Erebeyên hêstir û qantiran dikişandin hejhejokî bi evraziyê betena ber beravê ve hildiketin û eskeran bi defdanê alîkarî wan dikir. Kamyonan pirr hêz dida ta ku bi betenê ve hildiketin û ji wir dûr diketin û gundî pî ta bi gozekan di nav tozê re dimeşîn. Lê yê pîremêr li wir bê livîn rûniştî bû.

Erkê min ew bû ku li pirê derbas bibim, stasyona serekî ya ber pirê seh bikim û tê derxim ka dijmin gihaye kû derê. Min wa kir û di ser pirê re vegerrîm. Erebe kêm bûbûn û yên bi piyan dimeşîn jî tenê çend kes diyar mabûn lê yê pîremêr her li wir bû.

- Hûn ji kû tên? jê pirsîm.

- Ji San Carlos, wî got û bişirî.

Ew bajarê wî bû lew bilêvkirina wî navî dilxweşî dayê û ew bişirand.

- Min heywan xwedî dikirin, wî ravekir.

- Tu bi Xwedê kî, min hinekî ecêbgirtî got.

- Welle, wî got, - jixwe ez li ber heywanan mam. Dawîn kes bûm ku ji bajarê San Carlos revî.

Ew ne dişibî şivanan û ne jî gavanan. Min li cilên wî yên reş yên tozgirtî, li rûyê wî yê ji tozê gewr û li berçavkên wî yên milbendpolayî nerî û jê pirsîm:

- Çi heywan bûn?

- Heywanên cor-cor, wî got û serê xwe hejand. - Neçar mam wan bihêlim.

Min li pirê û dîmena wek deverine efrîqî dixwiya çavek gerrand, pûnijîm ka hê gelek maye bo dema em dijmin bibînin, min guh dida dengên pêşîn yên nîşana wê bûyera têr-raz in ya navê wê hevgihîn, û yê pîremêr hê jî li wir rûniştî bû.

- Çi heywan bûn? pirsîm.

- Sê cûn heywan bûn, wî got. - Du bizin û pisîkek û çar cot kotir.

- Ango neçar mayî wan bihêlî? pirsîm.

- Belê. Ji ber agirê topan. Fermandar ferman da ku ji ber agirê topan birevim.

- Ma te ti kesûkar nînin? pirsîm û min nerî serê dî yê pirê, cihê hê çend erebeyên dawîn bi lez û bez bi nişîviya betena beravê ve dadihatin.

- Na, wî got. - min tenê ew heywan hebûn. Bêguman kitik ne di ti tengasiyê de ye. Pisîk dizanin matî ji xwe bikin lê nizanim ka dê çi bi serê yên dî bêt.

- Bi siyasî tu çi yî?

- Ez li kû û siyaset li kû, wî got. - Ez heftê-û-şeşsalî me. Deh-dazde kîlometreyan meşîme lê bawer nakim zêdetir bikarim.

- Ne baş e li vir bimînî, min got. - Ger bikarî bi vê rêyê ve xwe bigihînî ser rêya Tortosayê, li wir dê kamyon hebin.

- Ez ê hinekî bisekinim, wî got, - û paşî biçim. Ew kamyon kû ve diçin?

- Berev Barcelonayê.

- Ez li wê hêlê ti kesî nanasim, wî got, - lê malava bî. Her malava bî.

Wî bê liv û westiyayî li min nerî û paşî - ji ber ku diviyabû xema xwe bi kesekî re parve bike - got: Ya pisîkê, ew dê her debara xwe bike, jê piştrast im. Ne hewce ye ji pisîkê xeman bixwim. Lê yên dî. Gelo bi baweriya te halê yên dî dê çawan be?

- Êê… bawer im ku dê debara xwe bikin.

- Tu wa bawer dikî?

- Çima na? min got û nerî berava dijber, cihê êdî erebe lê nedihatin dîtin.

- Lê gelo dê çi bi serê wan bêt li ber agirê topan madem ferman hat dan ku divê ez jî birevim?

- Te deriyê rekeha kotiran vekirî hêla?

- Belê.

- Madem wa ye, ew dê jê bifirrin.

- Belê, ew dê ji xwe re bifirrin. Lê yên dî. Hema baştir e li yên dî nepûnijim jî, wî got.

- Ger te bêna xwe vedabe, ez tu bim, dê niha biçim, min şîret dayê. - Niha rabe û bi rê keve.

- Malava bî, wî got û rabû piyan, bi herdu aliyan ve vehejî û paşî daket erdê û rûnişt.

- Min tenê heywan xwedî dikirin, wî betilî got lê êdî ne ji min re. - Min tenê heywan xwedî dikirin.

Ji min nedihat ti bo wî bikim. Yekşem bû û faşist ber bi Ebro pêş diketin. Rojek gewr ya ewrîn bû û ewr wa nizm û şorr bûn ku firrokeyên wan ne li hewa bûn. Ev yek û ew yek ku pisîk dikarin bi xwe debara xwe bikin tek tişt bûn ku wî pîremêrî dikarî pê bextiyar be.

*Wergerandin: 01/2004*

## Tawisrês

Hermann Hesse

Mêvan û dostê min Heinrich Mohr ji meşa xwe ya êvaran vegerîbû û em li odeya min a xebitînê li ber ronahiya dawîn a êvarê rûniştî bûn. Li ber pencereyan deryaçeyek berfire vedibû ku peravên tehtîn bi teşetûjî dorpêç dikirin. Ji ber ku kurê min ê biçûk aniha şevxweşî li me kiribû, em li ser zarokan û bîranînên zaroktiyê dipeyivîn.

- Niha ku min zarok hene, min got - hin ji mijûliyên min ên dema lawîniyê vejîne. Loma min berî qasî salekê dîsan dest bi berhevkirina pelatînkan kir. Tu dixwazî berhevoka min bibînî?

Wî bi erênî bersiv da û ez çûm çend qutiyên kartonî yên sivik anîn. Dema min ji wan a yekem vekir, ji me herduyan re diyar bû ka çend tarîgewrik bû: hema me derxet û sinorxîçên pelatînkên bi sêlikan ve girêdayî nedidîtin.

Min dest avêt lampeyê û zilikek şixartên vêxist û di çavmiçikekê de dîmena derve wenda bû û di pencereyê re tenê tarîtiya zilmatî ya şevê diyar bû.

Lê pelatînkên min di qutiya xwe de li ber ronahiya zelal a lampeyê dibiriqîn. Me xwe çemand alî wan, li nîşanokên rengîn nerî û navên wan rêz kirin.

- Ev şevgorîkê zer e, min ravekir, - navê latînî fulminea ye, li van deveran kêm peyda dibe.

Heinrich Mohr bi seqbêrî pelatînkek ji qutiya wê bi bizmarên wê ve rakiribû û li binçengên wî dinerî.

- Ecêb e, wî bi kûrponijî got, - ku ti tiştek hindî pelatînkan bi jîndarî bîranînên zaroktiyê naîne bîra min.

Paşî wî pelatînk dîsan xist ciyê wê û qepaxa qutiyê girt: - De bes e lo!

Wî ew bi lez û tûj got, mîna ku ev bîranîn li xweşiya wî neyên. Dema dû re min qutî birin û vegerîm odeyê, ew bi rûyê xwe yê qehweyî yî teng dibişirî û cixareyek xwest.

- Aciz nebe, wî pey re got, tevî ku min li berhevoka te venekolî jî. Min bi xwe jî carekê yek wisan hebû lê mixabin min bi xwe bîranînên li ser wê lewitandin. Dikarim ji te re çîroka wê bibêjim tevî ku di rastiyê de ew mijarek şermê ye.

Wî cixareya xwe bi silala (aliyê serî yê) şûşeya lampeyê vêxist, sîberdeka (abajûra) kesk dîsan xist ciyê wê û wisan bû ku rûyên me daketin nav tarîgewrikê, û ew li ber milbendê pencereyê rûnişt ku lê bejna wî ya ziraf hema qet ji derdora tarî cuda nedixwiya. Dema min cixareya xwe dikişand û qurequra beqan ji dûr di pencereya vekirî re diket hindir, dostê min ev çîroka jêrîn vegot.

Min di heşt- an nehsaliya xwe de dest bi berhevkirina pelatînkan kir û pêşî bê coşek taybet, ew jî mîna hemû yarî û mijûliyên din. Havîna

duyem, dema qasî dehsalî bûm, ev berhevkirin wisan ket dilê min û ez gorî xwe kirim û giha dildariyek wisan ku pirrî caran dihat xwestin ku ew li min bê qedexekirin çimkî ji ber wê min her tiştek din ji bîr dikir û nekirî dihişt. Dema li nêçîra pelatînkan bûm, min dengê zengilan nedibihîst, çi dema çûna dibistanê yan hatina ser sifreya xwarinê bûya, û li betlaneyan pirrî caran ji spêdeyê ta êvarê digerîm bê ku di ber re biçim malê tiştekî bixwim. Xwarina min hemû rojê tenê pariyek nan bû.

Dema pelatînkek bi taybetî bedew dibînim, hê niha jî bayek vê dildariyê min bi xwe re dibe. Di bîskekê de heyraniyek hesûdane yî bêmînak min digire ku tenê zarok dikarin hest pê bikin û ku bi hêza baskên wê heyraniyê min dabû pey yekem pelatînka xwe. Dema pelatînkek wisan dibînim, bêhejmar bîsk û rojên zaroktiyê, êvardanên kel û gurmijîn li mêrg û çîmenên bînbiheştîn, bîskên spêdeyan ên hên li nav baxçe yan êvar li nav daristanên razdar û nepenî, ku bi xeyal û hêviyên xwe ve mîna lêgerên gencîneyan, her bîsk û gavê amade ku pêrgî bûyerên nedîtî û yên ez ne li bendê yan jî şansê xwe yê nêçîrê bêm, min xwe li ber vedina. Dema min didît ku pelatînkek bedew, a ku bila ne kêmpeyda jî bûya, li ber tavê li ser gulekê dadayî û bi nefeskişandinê re baskên xwe yên rengîn jêr û jor dilivandin, û dema coşa nêçîrê kel bi ser nefesa min xistî min xwe nêztir dikir û ku min dikarî her nîşanek rengan, demarên krîstalî yên baskan û pûrtê reş î narîn ê şaxên sehekî bisihirînim, hingê min hest bi heyecan û bextiyariyê, bi pevgihanek dilşadiyek nazenîn û dildariyek fêrisane dikir ku di jiyana min a derengtir de kêm caran bûye para min.

Çimkî dêbavên min belengaz bûm û wan nedikarî ji min re alavên taybet peyda bikin, neçar bûm ku berhevoka xwe di qutiyek kartonî ya kevn û sade de biparêzim. Min lewheyên ji binê derqefankên şûşeyan birrî bi binê wê qutiyê ve zeliqandin ji bo pêvegirêdana keleman û min gencîneya xwe di çavikên bi navdîwarên ji kartonan veçemandî berpêkirî de bi cî kir.

Pêşî min pirrî caran û bi şanazî berhevoka xwe nîşanî hevalan dida lê hinan ji wan sandoqên darîn ên bincam, qutiyên tirtûlan ên qumaşê dolbendî yî yê kesk niximandî û awayên din ên bedew hebûn loma min hema qet nedikarî bi alavên xwe yên nenûjen serbilindiyê bikim. Pêdivîtiyek jî tine bû ku pesnên xwe bidim û hêjatiyên xwe diyar bikim loma hîn bûm ku bidestxistiyên xwe yên herî giring û balkêş jî bi hevalan nedim zanîn û encamên nêçîran jî tenê nîşanî xwişkên xwe bidim. Carekê min pelatînkek birqokî ji yên li cem me kêm peyda dibûn girt torra xwe û ku min ew ziwabûyî di qutiyê de bi cî kir, pozbilindiya min wisan kir ku ez xwe ranegirim loma min xwest wî hema nîşanî cîranê xwe, kurê mamoste yê li hêla din a kolanê dijiya bidim. Xerabiya wî hevalî bêkêmasiya wî bû, ew bêkêmasî ku li nik zarokan ducarî tirsnaktir e. Berhevoka wî bi xwe pirr biçûk û negiring bû lê wisan mînakane hatibû rêzkirin ku dilxweşiyek dida çavan. Wî ta hinêrek kêmpeyda û dijwar, pevzeliqandina baskên pelatînkan ên ziyanlêbûyî û şkestî jî dizanî, û bi her awayek din jî wisan kesek nimûne bû ku min bi hesûdî û nîvheyranî min serê wî nediviya.

Min pelatînkê xwe yê birqokî nîşanî vî kurikê îdeal da. Wî pisporane ew nirxandin, li xwe anî ku pelatînk ji yên kêmpeyda ye û diyar kir ku bihayê wî derdorî bîst qurûşan e çimkî vî Emilî nirxê diravî yê tiştên berhevkirinê, berî her tiştî jî yê pûlên posteyî û pelatînkan, dizanî. Dû re wî dest bi rexneyan kir, got ku ew nebaş hatiye girêdan, ku çengê rastê tewîye, yê çepê hatiye veçemandin, û hê kêmasiyek din jî lê dît: du piyên pelatînk jê kêm in. Min ev kêmasî wek tiştek mezin nedihesiband lê wî kêfxweşî li min herimandibû û ji hingê şûnde min êdî qet nêçîrkiriyên xwe nîşanî wî nedan.

Du salan derengtir - hingê em bûbûn xortên mezin jî, lê dîsan jî dildariya min her bihêz bû - galegotek belav bû ku Emil pelatînkek tawisrês girtiye. Wê yekê ez zêdetir coşandim ji hindê ku heke min bibihîsta ku mîrasek

milyonî bi hevalek min maye yan jî hevalek min pirtûkên wenda yên Livius dîtine. Kesek ji me pelatînkek tawisrês tine bû û min ew tenê ji pirtûkek kevn a pelatînkan dinasî ku nîgarên wê yên sifirî yên bidestçêkirî ji hemû wêneyên rengîn ên îroyîn bêhawe bedewtir û di rastiyê de birêkûpêktir jî bûn. Ji hemû pelatînkan, ên ku min navên wan dizanîn û ji qutiya min kêm bûn, min ti hindî pelatînkek tawisrês bi coşî nedixwestin. Min gelek caran ji pirtûka xwe li wêneya wî nerîbû û hevalek min ji min re gotibû ku dema ew pelatînkê qehwerengî li ser qurmê darekê yan li ser kevirekî dadayî be û firindeyek yan dijminek din bixwaze êrişî wî bike, ew pêşbaskên xwe yên rengtarîtir ên kombûyî ji hev vedike û paşbaskên bedew û şiklên çavîn ên ên rengvekirî û mezin, dema xwiya dibin, wisan sosret in ku dijmin bela xwe jê vedike.

Û ev pelatînkê wiha ecêb niha bi Emilê acizker bû! Dema min ev nûçe bihîst, pêşî min hest tenê bi kêfxweşiyê kir ji ber wê yekê ku dawiya dawîn min ê ew pelatînka kêmpeyda bidîta. Min herwiha hest bi mereqdariyek bişewat kir ku biçim lê binerim. Paşî çavnebarî û hesûdiyê serê xwe hilda û bi min pirr mixabin bû ku ne kesek din lê wî nazdarokî pelatînkek wisan bihagiran û razdar bi dest xistibû. Loma min xwe ragirt û nehişt wê dilxweşiyê bikim para wî ku bibezim li pelatînka wî binerim. Lê hizir û bîrên min bi berdewamî li ser wê mijarê bûn û dotira rojê, dema galegot li dibistanê rastî derket, min biryar da ku ez ê biçim nik vî cîranê xwe.

Zû piştî firavînê min xwe lezand qata sêyem a mala vî cîranî ku kurê mamoste bi rex odeyên xizmetkaran û çavikên darên bo şewitandinê ve di odeya xwe ya biçûk û ya ez pirrî caran pê çavnebar ve dijiya. Emil ne li wir bû, û ku min destikê derî bada, diyar bû ku rê vekirî ye tevî ku pirrî caran dema Emil derdiket, derî li pey xwe diqilifand.

Ketim hindir daku, qet nebe, wî pelatînkî bibînim û min zû herdu sandoqên mezin, ên ku Emil berhevoka xwe tê de diparast, derxistin.

Lêgerîna min bêsûde û jixwe bû ta ku ket hişê min ku divê pelatînk hê li ser dep û darê şidandinê be. Belê, min li wir pelatînkê tawisrês ê bi depik ve hilawîstî, baskên qehwerengî bi şelîtên zirav ên kaxezî ve rastşidandî dît. Min xwe bi ser wî de daçemand û min ji nêz ve li her dera wî, li şaxên wî yên sehekî yên qehwerengî yî vekirî yî têrpûrt, li serlêvikên baskên wî yên bedew û bêpayan rengnarîn, li pûrtika nerm a lêvikên hindirîn ên baskên jêrîn nerî. Tenê min çav nedîtin; ew bi şelîtên kaxezî hatibûn niximandin.

Bi dilek xurt lê dida, min hefsar da dest birina ji ser rêya rast ku kaxezan bidirînim û min korderzî ji depik hilkişand. Hingê min ew her çar çavên mezin î watedar, ên pirr ji nîgarên di pirtûkê de bedewtir û sosrettir dîtin, û xwestekek serjêstîn ez girtim ku divê ev pelatînkê wiha şirîn bibe yê min û, bê min hay jê bibe, bûm tawankarê yekem diziyê di jiyana xwe de, min hêdîka derzî jê hilkişand û pelatînkê ziwabûyî û yê dikarî teşeya xwe biparêze di destê min de ji odeyê derketim. Tekane hest, ku hingê dilê min dagirtibû, razîbûnek bêsinor bû.

Pelatînk di destê min ê rastê de, bi pêpelûkan ve daketim. Hingê min bihîst ku kesek ji jêr ve pêrgî min tê û wijdana min hilceniqî, min zû zanî ku diz û necamêr im. Pê re jî tirsek têrxof a diyarbûna diziya min ez girtim loma min bi dozîndarî destê xwe yê pelatînk tê de xist berîka saqoyê xwe. Hêdîka meşîm û hestek cemidî ya tawanbarî û şermê bi ser laşê min de girt, bi tirsonekî di ber keçikek xizmetkara malê, ya ku hewa diket jor, re borîm û bi dilê hilqut li ber deriyê malê rawestîm, xuhê xwe di eniya min re avêtibû der, şaş mabûm û ji xwe ditirsîm.

Di heman demê de ji min re zelal bû ku nedibû û min nedikarî jî pelatînk bi xwe bihêlim, ku diviyabû min ew vebigeranda û heke bi ti awayî gengaz bûya, min ya kirî bikira nekirî. Tevî hemû tirsa pêrgîhatina mirovan û hatingirtinê jî ez carekê bi lez li xwe zivirîm, bi pêpelûkan ve fişt bezîm jor û di deqeyekê de min dîsan xwe gihandibû odeya Emil. Bi

seqbêrî min destê xwe ji berîka xwe vekişand û pelatînk danî ser maseyê lê hê berî bigihim lê binerim jî, min dizanî ku belayek qewimiye û kizikên girî hatin çavên min çimkî tawisrês ruxîbû û pûç bû. Pêşbask û şaxê sehekî yê aliyê rastê jê kêm bûn, û dema min hewl da ku bi hişyarî çengê qetî ji berîka xwe derbînin, ew hûr-hûr bûbû û bicîkirina wî êdî nedihat hesabê jî.

Tawanbarî li ber wê hestê pirr kêm e ya ku hingê ez girtibûm dema min li vî pelatînkê kêmpeyda yê bedew dinerî. Min toza baskên pelatînk a qehwerengî ya hûr a bi dest û tilên min ve mayî û baskê şkestî yê li ser maseyê dîtin û min ê hema çi heyberî û kêfxweşiya xwe gorî û qurban bikira heke tenê ew dîsan wek berê saxlem bibûya.

Bi xemgînî vegerîm malê û hemû danê êvarê li nav baxçeyê me yê biçûk rûniştim ta ku li hengur û tarîgewrika êvarê min bisteyî da xwe ku hemû meseleyê ji diya xwe re bibêjim. Min dît ka ew çawan tirsî û xemgîn bû lê belkî ew herwiha tê gihî ku ev aşartin û îtîraf ji min re ji kişandina her celeb ceza û ezyetê dijwartir bû.

- Divê tu biçî nik Emil, wê şidayî got, - û ji wî bi xwe re bibêjî. Tiştek din nikarî bikî, û ta wisan nekî, ez ê nikarim te bibexişînim. Jê re bibêje ku ew dikare tiştek te li şûna wê ji xwe re bibijêre û divê ji wî lêborînê bixwazî.

Heke ne ev kurik bûya, kî din bûya, dê ji min re asantir bûya. Min hê bi pêşînkî fam kir ku ew ê di min negiha, belkî dê ti caran bawer jî nekira, û bû êvar û hema bû şev jî bê ku bikarim zorê bidim xwe biçim cem Emil. Paşî diya min ez li ber derî dîtim û hêdîka got: - Divê îro wisan bikî, de here!

Wiha çûm mala Emil û min li qata jêrîn li wî pirsî, ew hat û zû got ku yekî - kesek bîje yan belkî firindeyekî yan pisîkekê - tawisrêsê wî pûç

kiriye, û min daxwaz kir ku ew min bibe odeya xwe û nîşanî min bide. Em hewa ketim silal, wî deriyê odeya xwe vekir û şemalek hil kir û min pelatînkê tewizandî li ser depikê veşidandinê dît. Diyar bû ew tê koşîbû ku ziyanan bicebirîne, çengê şkestî bi hişyarî li ser kaxezek şil hatibû pankirin lê sererastkirin negengaz bû û di ser re jî yek ji herdu şaxên sehekî kêm bû.

Hingê min beyan kir ku ez im ê gunekar, tê koşîm meseleyê ravebikim û şîrove bikim.

Emil ne qehirî û ne jî qîrî, tenê di nav didanên xwe re fîtî û firîzî, bîskekê bi bêdengî li min nerî û paşî got:

- De baş e, tu hevalek wiha bûyî, ha, de baş e.

Min xwest hemû pêlîstokên xwe bidimê, û ku wî xwe xwînsar ragirt û her bi nirxnizmî li min nerî, min soz da ku hemû berhevoka xwe ya pelatînkan bidimê. Lê wî got:

- Hema li te pîroz be; ma ez berhevoka te nanasim. Ev jî dîsan nîşaneyek baş bû ji hindê ka tu çawan matî ji pelatînkan dikî.

Hingê kêm mabû ku min ê xwe biavêta hefika wî û ew bifetisanda. Ti tiştek ji dest min nedihat, ez bêwec bûm û her wisan mam lê Emil xwînsar û rêrast mîna sazûmana gerdûnî bi xwe bû. Wî hema ez lome jî nekirim, tenê carinan bi kubarî berê xwe dida min.

Hingê min yekem car dît ku mirov nikare tişta pûçkirî durist bike. Çûm malê û kêfxweş bûm ku diya min tiştek ji min nepirsî, tenê ez maç kirim û bela xwe ji min vekir. Diviyabû biçim rabikevim, ji min re êdî dereng bû. Lê ji berî hindê bi dizîkî û nepenî çûm odeya xwaringeh û min qutiyek qehwerengî ya mezin anî, danî ser doşeka xwe û di tarîtiyê de ew vekir.

Pey re min yek bi yek pelatînkên xwe jê derxistin û ew bi tiliyên xwe meriçandin û zirviçandin û kirin toz û qerpal.

## Aliyê dî

Maureen Manuel

David Morgan di xew de xwe vediqulipand. Xuh ji eniya wî dadirijî û çarçev ji lept û livên wî yên gevizok qurmiçîbûn. Hemşîreyê gazî kir doktor yê ku ji daîreya nêz lezî odeya taybet.

- Kengî? wî pirsî.

- Berî pênc deqeyan dest pê kir, hemşîreyê bersivand. - Pêşî livên wî tena û hêdîk bûn. Lê ev deqeyek e ew xirabtir bûne.

Doktorî Morgan vehejand û bi navê wî bang kirê. Bêsûde bû. Wî mêrik dîsan vehejand û paşî hin ava sar avêt rûyê wî. Hêdî-hêdî mêrikê nivistî vehewiya û paşî, pirr hêdîka, çavên xwe vekirin.

- Her car dirêjtir dem vedikêşe, doktor minminî. Wî ji hemşîreyê re got:

- Li nik wî bimîne. Ew dê dîsan bikeve xewa normal.

Doktor vegerrî daîreya xwe û nesaxnameya Morgan derxist: David Morgan, jî 35, pîşe mamoste, bêjin, nînin nesaxiyên cidî. Van salên

dawîn xewnên kabûs bela xwe li wî dabû û tenduristiya wî ya derûnî ji reh û rîş ve dihejand. Azmûn û ceribandinên psîkyatrîk ti çare jê re neanîbûn. Çar hefte berê spêdeyekê hatibû dîtin ku Morgan li gor serê xwe li kuçe û kolanan digerre. Ew di rewşek derûnî ya tevlihev de bû. Ji hingê ve ew li nesaxxaneyê dihat çarekirin. Doktor dosyeya wî deyna der. Tek tişta wî dizanî ew bû ku şiyarbûna ji kabûsan her car ji berê dijwartir bû. Cîhana xewnan dikoşî zora rastîniyê bibe.

Hê jî tarî bû dema David Morgan şiyar bû. Hemşîre li ber maseyê rûniştibû û bîrnot li ber ronahiya kiz ya lampeya maseyê dinivîsîn. Mêrik bêdeng paldayî bû bêyî ku bixwaze dên û bala hemşîreyê bikêşe ser xwe. Ew li xewna xwe dipûnijî.

Xewn her car eynî bû. Ew li gel komek mirovan dipeyivî. Mirovan li ser baştirîn cezayê gengaz suhbet dikir. Wî pêşniya dikir ku baştirîn ceza ew e ku tawanbar bêt zindankirin di hicreyek bêderî û bêpencere ve, bêyî ti tiştek hebe bike, bêyî ji borîna demê agadar bibe. Ew cezayek ji mirinê baştir e.

Wî xwe di hicreyek wisan ve didît. Ew dikoşî libinên dîwar bikirrîne daku bikare jê derkeve. Wa dixwiya ku dîwar bi ser wî de dihatin. Dîwaran hewl dida wî bifetisînin. Di wê delîvê re ew hertim şiyar dibû. Wî dizanî ku tek rêya ew bikare ji wê xewnê bifilite û xilas bibe ew bû ku dîwarî bipeqîne. Di her xewnê de wî tîkek mezintir li dîwarê ji libanan çêdikir û vê carê ew dê tê re derketiba eger doktor ew ji xewê şiyar nekiriba.

Ew koşîbû vê nerîna xwe şirove bike lê her kesî bawer dikir ku ew ji ber xwe diaxive. Wan digot ku xewn zêde dilê wî ditehibînin lew li demên ew di xew de çavdêriya wî dihat kirin. Lê mêrik hêvî dikir ku carekê bikare bi rehetî ta dawiya xewnê binive.

Wê êvarê du trênên lezgîn li hev qelibîn. Nexweşxane ji goriyên wê qezayê miştû tijî bû. David Morgan tam hatibû şiyarkirin dema desteyê yekem ji birîndaran giha wir. Çiku wa diyar bû ku ew li ber bû bikeve xewek normal, hemşîreyê bawer kir dikare wî kêlîkekê bi tenê bihêle. Û eger bi hişmendî lê bêt nerîn, ma çi ne xewnên xirab li ber birînên xedar yên bedenî?

David zû di xew çû û tavilê di hicreya xwe ve bû. Wî hemû cebl ji dor libinan raçirrandibû û dîwar êdî xwe ranegirt. Ew bi xurtî xebitî ta ku kunek mirov tê re biçe lê kir. Bi dijwarî wî xwe gihand aliyê dî yê dîwar. Li wir hicreyek hebû, tam wek ya berê!

Ew bêhêvî şewişî û ket erdê. Ti çareyek dî nebû ji bilî hindê ku bisekine ta bêt şiyarkirin. Piştî bîskekê hat guhê wî ku bi navê wî hawar dikinê. Ew rabû ser xwe, bendewar bû ku dawî li xewa wî bêt û kesên nexweşxaneyê yên nas li kêleka wî bin. Lê wa neqewimî. Wî dîsan deng bîstin lê qelstir. Ji nişkê tê derxist ku ew di hicreyek dî ve ye! Ew herdem li hicreya xwe hatibû şiyarkirin lew kesî nedizanî ku ew li vê hicreyê ye daku li pey wî bên. Wî xwe di kunikê re avêt hicreya dî. Lê li wir tenê bêdengî hebû.

Li odeyek nexweşxaneyê doktor çarçev vekişand ser çavên David Morgan.
- Dilê wî xwe êdî hew ragirt, wî got.

- Dibe ew niha bikare bizane ka çi li aliyê dî yê hicreyê heye.

*Wergerandin: 10/2003*

## **Rojavabûn** (*)

Mehabad Qeredaxî

*Diyarî canên pelatînkane yên zarrokên enfalkirî, yên wan pelatînkan yên me nedizanî ka kîjan mêrg kiriye biheşt ta ku taliyê li roja zarroyên cîhanê - 1.6.2003 - ji dojeha çalgorrên enfalkiriyan serik û hestîkên wan yên nazik û narîn li gel pêlîstok û yarîkên wan hatin dîtin... Bo canê wan yên ji bîra min naçin diyarî ye ev çîrrok û her bîr û tîrê ji qelema min biçe. (**)*

Dixwaze mirinê bibîne lê dîmenê rojavabûnê nebîne. Dema rengê narincî yê avabûna rojê dibîne, hindî jê bêt dike hawar û qîrrîn ta biweste û gêj bibe. Êvaran dibin hindirr daku rojavabûnê nebîne. Lê nebîne jî, hest pê dike. Hawar dike, hawarek wa ku pencere û dîwarên odeyê vedilerizîne. Dorberên xwe çol dike; pirr car xwe rahiştiye kêrê û dixwaze xwe bikuje û aram bibe. Cigare jî lê hatine qedexekirin; çendîn car cigare bi leşê xwe venaye taku temiriye: bi her awa xwe jan dide daku fikr û endîşeyên xwe kêm bike. Ku cigare bi leşê xwe vedina, hestek tijî aramî û asûdeyî ew digirt û rûyê wî vedigeşî.

Demek e neynik û awêne nedîtine. Nizane ew sîmayê esmerî delal, ku berê miştî şadî û hêwirî bû, niha reş dagerriye û çendîn xetik û xîçikan li eniya wî nexşeya pîriyek nedem nîgarandiye. Salek e li ber ti neynik û camên pencereyan rastî dêm û dîmenê xwe nebûye. Awêne lê hatine veşartin; pêşî dijminî bi awêneyan re hebû. Dema westayî vegerrî, Wefayê wek her car bi rûgeşî ew hemêzand lê ew - mîna ku her ne li vê dinyayê be - bêyî peyvek ji devî derbikeve ket odeyê. Wefa ji westîn, nerehetî û xerîbiya wî haydar bû lê nedizanî ka çi qewimiye, çima rengê xwe avêtiye. Xwest wî dilşad bike bi wê mizgîna xêrê ya ew çar sal li bendê bûn:

- Mizgîn, me zarrokek bûye!

Vê nûçeyê ne tenê ew dilxweş nekir lê hê pirrtir eniya wî şidand. Bêyî qet gotinekê bike çû odeya nivistinê û xwe pal da. Çi belayê ev peya guherrandiye? Wefa ket şikan ji wê bêdengiya sosret. Her dinijinand û diherrifand lê ti bersiv peyda nedikir.

Wî li binbanî dinerî û her dipûnijî mîna ku rûberî binbanî destanan bixwîne. Belkî li hemû jiyana xwe ya raborî pûnijîbe, li xortaniya xwe, belkî ta li yekem cotê pêlavên xwe yên bavo bi boneya çûna dibistanê jê re kirrîbûn. Soz dabûyê, ger ew biçe dibistanê, cotek solên sor bo bistîne. Bi şev, dema diçû binive, li hindê diramî ka dê kengî mezin bibe û jiyê wî bibe şeş sal û biçe dibistanê. Hind dibistan û pêlav di serî de bûn ku bawer dikir herdu peyv her hevwate ne. Dibistan û pêlav mijarên fikirîn û devikên xeyalên wî bûn. Sê sal hiş û bîrên wî li ser dibistanê û pêlavê bûn. Diçû kêleka diya xwe û dipirsî:

- Ez ê kengî biçim dibistanê?

- Dema didanên te yên şîrî bikevin, dê biçî dibistanê.

- Kengî didanên min yên şîrî dê bikevin?

- Dema bibî şeşsalî.

Bi tilên xwe yên hûrik didanên xwe yên pêşîn zeft dikirin û bi tundî dileqandin daku bi pêşdemî bikevin. Carekê bo xatirê pêlavan kevir li didanek xwe da daku leqok bibe û bikeve. Dixwest xap û lêban li temenê xwe bike daku herî zû bigihe şeşsaliyê. Didanên wî ketin lê hê jî bo şabûna bi pêlav û dibistanê dem mabû.

- Dayê can, va ye didanên min yên pêşîn ketine.

- Qurban, hê salek te bo dibistanê maye.

Xewn didîtin ku diçe dibistanek sor ya bi dirûvê pêlavê. Li serbanê dibistanê jî alaya welat dipêle. Werîsek sor yê zirav bi stûnê ve ye, werîs jî ji qeytana pêlavê diçe!

Bû şeşsalî, pêlava sor kir piyên xwe û çû dibistanê. Ji xweşiya pêlavê ji dibistanê jî pirr hez kir û çi ji devê mamosteyan derketiba, wî ji ber dikir. Birêveberê dibistanê her sal diyariyek didayê lê ti diyariyê bi qasî wê sola sor ew dilxweş nedikir, ta wê rojê jî ya taximek li xwe kir û yekem stubenda xwe kir stuyê xwe da biçe xwendingeha bilind.

- Kurrê min, bi gotina min bike, herre fêrgeha leşkerî.

- Bavo can, heza min li hîngeha endazyarî ye.

- Kurrê min, îro nan tenê di leşkeriyê de ye. Va ye sedan endazyar bêkar mane û paletî jî bi dest nakeve. Bi hezar sergêjiyan min tu dayî perwerdekirin. Niha pîr bûme û min şiyana karkirinê nemaye. Bi gotina min bike, bila tu jî betal nemînî!

Çû fêrgeha leşkerî. Bavê wî rûgeş dibû bi dîtina bejna bilind ya kurrê xwe, bi cilên wî yên leşkerî yên havînan bergspî û zivistanan bergşîn û şewqeyê wî yê pirr lê dihat! Tevî ku serê wî hatibû tiraşîn jî, sîmayê wî

her balkêş bû. Her bi wan cilan dên û bala Wefayê jî kişandibû. Dema hevdu nasî û li kinar Dîcle raz û niyazên xwe pev guherrandin, pirr ji hev hez kir. Evînek mezin herdu girtin. Li gel Wefayê zewicî û çar sal bû bi hev re dijiyan. Heyamek bû wan bêriya zarroyekî dikir ku jiyana wan rontir bike lê dema bû bav, êdî nedizanî ka bavînî çi ye!

- Welîd can, bêje, çi qewimiye! Çi tu nerehet kiriyî ku dilê te bi savakê me xweş nabe?! Binere, çendî spehî ye, tam bi te ve çûye.

Qey çavên wî ranebin li zarrokî binere, çavên xwe dineqandin û xwe dixwar. Ta êvarê bêdeng bû, bêyî ji ciyê xwe bilive paldayî bû. Dema rojavabûnê dîmenê xwe yê narincî di pencereyê re diyar kir, rabû piyan, hawar kir, hawarek bilind, pirr bilind. Xwe di neynika mezin re dît, mistek lê da û hûr-hûr kir û xwîn bi dest û tilan de hat. Dema xwîna destê xwe bînî û hest bi jana birînên dest û lepên xwe kir, henaseyek aramiyê hilkişand û li erdê di xew çû.

Wefa heyirîbû, nedizanî çima wa qewimî. Ev akar û reftar li bal wê pirr neasayî bû. Pehitî. Lê piştî her rojavabûnê dubare û sêbare û dehbare wa qewimî û hawar û nalîna Welîd hat bîstin. Ya ji wê hat tenê ew bû ku dixwest bizane ka sedema vê guherrîn û nearamiya Welîd çi ye!

Salek e li vê odeya vê nexweşxaneya taybet li ber çavdêriya bijîşkan e. Li ber her rojavabûnê jî dibe volkan û hilditeqe. Demên din jî ne asayî ye lê rojavabûn canê wî dide ber şûjinan. Dibê bombeyek e û di bedena wî de diteqe. Naxwaze çavê wî ta bi tekane zarrokê wî jî bikeve, nemaze li dema rojavabûnê. Sola sor û mezin wî dîn û har dike: her ku pêlava sore mezin dibîne, giş canê wî wek agir germ dibe û wî tûşî hîsteryayek tund dike û ew dike hawar û sedhawar ta gêj dibe û dikeve!

Wefa matmayî dibe ji wê belayê! Wê pirr car bîstiye ku wî wek bîranînek xweş basa cotê pêlavên xwe yên sor yên zarrokiyê kiriye. Wî digot: "Tevî

ku pirr dirêj vekêşa ta bûm xwediyê wî cotê pêlavan lê dîsan jî ew yadgarek şirîn ya serdema zarrokiya min e." Her ku ew bîranîn vedigot, bi beşoşî digot: "Niha jî ji pêlava sor hez dikim, her dîsan jî dîmenê pêlavên sor min dîn û har dike." Matmana wî her zêdetir dibû dema didît ew savayê ku ew bendewarî bû û hê ji yekem roja zemawenda xwe navê wî plan kiribû Xalid eger kurr be yan Heyfa eger keç be. Dema niha Xalidî dibîne, dibizde mîna ku sawirên mirinê bibîne. Xwedêyo, ev çi ye qewimiye?! Berê dema vedigerrî, diyariyek nedîtî delal bo Wefayê dianî û demek dirêj her dera wê dimaçand û digotê: "Hevsera min ya wefadar." Guhê xwe dida bi zikê wê re û digotê: "Savakê me dê kengî bê?" Lê niha awirekê jî nedide wê û ne jî yê sava! Ta ger bangî jî bêt kirin, bersivê nade mîna navê xwe ji bîr kiribe yan nexwaze guh li wî navî bibe. Berê çi gava Wefayê gazî kiribayê, wî digot: "Bi dengê te navê min pirr xweş e. Dema bangî min dikî, hest pê dikim ku min xweştirîn nav heye!"

Bi hemû wan xet û xîçên kurt û dirêj li devûlêv û serûçavan kî bawer dike ku tenê sî-û-pêncsalî ye?! Yê niha bibîne, dê bawer bike ku ducarî wî temenî ye. Yê li wêneyên wî yên dema şagirtiyê û leşkeriyê hûr binere, dê şik bike ku ev ew be: Hingê bedenek xurt û milpan, bejnek bilind, du çavên gir û geş, kenek jidil balkêş... Niha dibê qey hatiye hêrandin!

Hez dike mirinê bibîne lê rojavabûnê nebîne. Stêran dinya lê tal kiriye, wan stêran yên ew kiriye delodînek ku niha nojdar jî ji halê wî heyirî dimînin. Wan stêran wa kir ku kerb û kîna wî bigihe kurrê wî yê sava jî û dîmenê rojavabûnê lê bibe dojeh û pêlavên sor wî har û dîn bikin. Wan stêran wa kir ku bikerb bibe ji çirisîna stêran û ta ji navê xwe jî!

Dixwaze guh li mirinê bibe lê li navê bavê xwe nebe. Ta pirrtir ji navê xwe, kîna wî li yê bavê wî ye - wî bavî yê du kitî rojan xuha xwe li ber tavê darijand daku jê re bide bi cotek solên sor - ma kî hebû ji wî kurrî pêve! Heft keç li ber wan wek pûşê li ber ba bûn! Encax piştî jidayikbûna wî wan hest bi hebûna piştevaniyekê kir. Wan dixwest bi ti awayî dilê wî

neêşînin lê nedariyê rê nedida her tiştî bo bikirrin. Her ew destkurtî bû ya bû sedema hindê ku bavê wî bixwaze ew bibe efser. Çi rojek tirsnak bû ji serdema xortaniyê, çi belayek bû ku bêyî vîna xwe bû efser!

Wa ji her tiştî mat mabû! Baş li bîra wê ye ew cara vegerrî û destê xwe li stuyî aland û bi kenek tîqtîqî got:

- Min stêrek din jî wergirt.

Digot: "Divê spasiya bavê xwe bikim ku pêşniya kir biçim fêrgeha leşkerî."

Heman rojê destek gulan bir ser gorra bavê xwe.

Ji pîşeyê xwe pirr hez dikir, belkî ji wê rêzdariya bêpayan bû ya bindarên wî û xelkê didayê. Carinan şik dibir ji wê rêzdariya bênimûne, guman dikir û di dilê xwe de digot: Gelo ev ya xelk dike ji rêzdariya yan jî ji tirsa ji min e, ji tirsa ji efserekî? Lê taliyê baweriya wî xurt bû ku pîşeya wî giring e û hejî rêzdariyê ye.

Li leşkergeha xwe li hemû rojavabûnan li dîmenê narincîbûna rojê dipûnijî ta ku roj bi tevavî ava dibû. Wa hişên wî diçûn bal Wefayê ya ku ji ber dûrî û kar mehê tenê carekê lê vedigerrî û hefteyek li hemêza wê diborand. Evîna xwe ya li dema rojavabûnê li kinarî Dîcle bi bîr dianî dema herduyan bi pistînan danûstan dikir. Dîmenê narincî yê rojê ew nazik û narîn dikirin û destên wan di hev de bûn û ta roj ava dibû çavên wan li hev vediman û bedenên wan dibûn heman parçe dildarî. Wa diman ta roj ava dibû û wan Dîcle bi cî dihêla û her yek ber bi mala xwe vedigerrî lê bi şev jî her xewn bi hev û bîskên tijî hezkirin yên rojavabûnê ve didîtin...

Niha hez dike mirinê bibîne lê dîmenê rojavabûnê nebîne. Dîsan êvar e, kêlîka avabûna rojê teqînek di hindirrî de hildibe! Yekcar lawaz bûye,

maye tenê hestî û çermikek çirr û qaştîk. Rûyê wî tirsnak dixwiye, dibê qey mirî ye û ji bin axê derketiye. Rojavabûn jê re ne zeman e lê volkan e û di wijdana wî de diteqe û her roj komek ji hicreyên mejiyê wî dişewitîne. Dema rojavabûnê roj lê dibe gorristan û bedena wî jî dibe gorrek kûr û teng bo canê wî!

Tenê çend lib hicreyên sax di mejî de mane. Dilê wî sist bûye û tenê têra teqînek din ya volkanî dike. Dîsan êvar e. Dîsan hat ber çavan, ber wan çavan yên êdî têra tenê dîtinek dî ya wî dîmenê tirsnak dikin.

Li odeya xwe rûniştî bû, eskerek hat hindirr, silavek eskerî dayê, lîsteyek da dest û dubare silavek dayê û derket. Li lîsteyê sedan nav hebûn. Ji odeya xwe derket û dîtin sê otobusên dirêj yên rawestî û komek xelkê: jin û mêr, zarr û zêç, genc û pîr. Hemûyan serê xwe wa berjêr kiribû ku dibê qey ti car wan serê xwe ranekiriye... Ma ne dibe ev lîste şaşiyek be?! Nav yek bi yek xwendin, û yên navên wan xwendiban, diviya bibêjin: Belê.

Giha navê Şaxewan, Ti kesî bersiv neda. Pirsî: - Şaxewan kî ye? Çima bersivê nade?

Dayikekê dergûşanek raber kir. Nê ev zarrokê sava hê ji çilikên xwe derbas nebûye! Seyr û sosret e! Hebe-nebe ev lîste xelet e!

Çû nik rayid Elî, silavek leşkerî dayê û lîste da dest:

- Mezinê'm, wa diyar e ev lîste şaş e!

Elî lê nerî û eniya xwe kir girêk. Bazên sermilkên wî bi livîna kelexê wî yê gembolan re dibiriqîn mîna ku bixwazin serî lê bixwin!

- Çima diyar e ku şaş e?

- Mezinê'm, zarrokek sava tê de ye, tenê yekmehî ye!

- Vêca ma ew jî şaşî ye!?

- Mezinê'm, lê...

- Aniha fermanê bi cî bîne!

Derket. Elî rawestî û destên xwe danîn ser kemerê û piyên xwe ji hev belav kirin. Bazên ser milî dibiriqîn, dibê qey devên xwe beş kirine û dixwazin serî lê bixwin, pencirrkên wan li ber bûn çavan jê biqoqilînin. Xelk kirin rêz. Şaxewan di hemêza diya xwe de bû, bi sînga xwe ve şidandibû. Dayikê serê xwe şorr kiribû ser, wek bipiste guhî: - Ruha'm, çima hatî vê dinyaya kembax?!

Şaxewan girî. Elî destên xwe li hewa şepandin. Ku Şaxewan dest bi girînê kir, Elî jî jest û hêma da leşkerên xwe. Hawara hemûyan bilind bû û kêlîkekê xayand lê paşî veçopirî û tenê qorreqorra pêt ya Şaxewan dihat bîstin - mîna ku ji dêlva tevan biqîrre. Elî hêma da Welîd ku Welîd pênekê lê bide û dengê wî vebibirre. Şaxewan mîna çûçelokek çivîkan yê bêperr û bêbask bû. Kiraskek spî lê bû, spî wek rengê kefen. Welîd çirkeyekê rawestî û li Elî nerî. Çavên Elî zîq û biloq bûn û agir jê hildibarî, bazên ser milî dibiriqîn û dest li ser demanceyê bû. Hicreyên mejiyê Welîd di bîskekê de ketin lebitînek lezgîn. Kêlîka piyê xwe rakir ta giha ser zikê yê sava, li sermilkên xwe nerî: stêrên li ser milî diçirisîn; dê stêrek dî wergirtiba û bûba balyoz. Berê xwe da asoyê: dîmenê narincî yê rojavabûnê dît, mîna tabût be û wijdana wî tê de be... Berê xwe dagerrand: postala wî ya mezin di zikê yê sava re çûbû! Piyê xwe hilda, postala wî sor bûbû! Dawî li dengê Şaxewan hat! Li Elî nerî: bo li çepikan dida. Stêrek din jî li ser milî ket zîqzîqanê. Bazekî jî devê wî daxist!

Roja din, eynî dem, ji odeya xwe derket. Çal hatibûn dagirtin. Serê xwe hilda. Dema dîmenê narincî yê rojavabûnê dît, volkanek di derûnê de hilteqî! Volkan bû yan jî qarrewarra Şaxewan? Qîjîna Şaxewan bû yan jî

teqîna wijdanê?! Herdu çavên xwe miçandin daku rojavabûnê nebîne. Kir hawar, hawara xwe bilind kir ta ku gêj bû û ket!

Bênvedan bo hat nivîsîn lê qet ti car rehet nebû! Her êvar ew dengê Şaxewan wek volkan di dilî de diteqe. Hez dike mirinê bibîne lê rojavabûnê qet nebîne!

- - -

Zivistana 1993
Skinnskatteberg
Swêd

*Ji soranî: 9/2003*

---

** Ev çîrrok 1993 hatiye nivîsîn û 1994 di pirtûka Koç ya nivîskarê de çap û belav bûye. 9/2003 ew bo "Antolojiya Çîrokên Kurdî" (amadekar: Firat Cewerî, Weşanên Nûdem) ji soranî hatiye kurmancîkirin.*

*** Ev pêşgotin di çapa soranî de nîne, MQ ew bo wergerra kurmancî nivîsiye.*

## Bilbil û sorgul

Oscar Wilde (1854 - 1900)

'Wê got dê li gel min bireqise ger ez jê re gulên sor bînim', şagirtê xort got, 'lê li hemû gulistana min gulek sor nîne'.

Ji hêlîna xwe ya li ser dara gûzê bilbil dengê wî bîst, û di nav pelan re li derê nerî û pûnijî.

'Nîne ti gulek sor li hemû gulistana min!' yê şagirt got, û çavên wî yên spehî tijî rondik bûn. 'Ax, ji tiştên çend biçûk e dilşadî! Min xwendiye hemû hişmendiya mirovan nivîsî, û hemû nehîniyên felsefeyê yên min in lê ji ber daxwaza gulek sor jiyana min bûye kembaxî.'

'Taliyê ev e evîndarek rast', bilbil got. 'Her şev ez li ser wî strîme tevî ku min ew nenasiye jî; her şev min çîroka wî ji stêran re vegotiye û niha wî dibînim. Pirça wî reş e wek gula simbil, û lêvên wî sor in wek sorgula daxwaza wî; lê dildariyê rûyê wî mîna qerenfîl zerik û spîçolkî kiriye, û xemgîniyê mora xwe li eniya wî daniye.'

'Mîr dê sibe şehyanekê li dar bixe', şagirtê xort minminî, 'û dildara min dê di nav de be. Ger ez gulek sor ji wê re bînim, ew dê ta elindê bi min re bireqise. Ger ez gulek sor jê re bînim, ew dê di zendên min de be, û ew dê

serê xwe pal bide ber milê, û destê wê dê di yê min de be. Lê ti gulên sor li gulistana min nînin lew divê ez bi tenê rûnim, û ew dê di ber min re bibore. Ew dê ti pûte bi min neke, û dilê min dê bişkê.'

'Ev e, bi rastî, evîndarek ji dil', bilbil got. 'Tişta ez distrim, ew jê dinale; ya bo min şadî ye, bo wî jan e. Bêguman evîn tiştek ecêb e. Ew ji zimrûdan binirxtir e, ji opalan delaltir e. Hirmî û hinar ne hêjayî wê ne û ne jî ew li bazaran tê firotin. Ew ne ji bazirganan tê kirrîn û ne jî li ber zêrr tê kêşan.'

'Muzîkjen dê li dîwana xwe rûnin', şagirtê xort got, 'û têlên amûrên xwe bijenînin, û dildara min dê li ber awazên çeng û kemanê bidanse. Ew dê wa sivik bireqise ku piyên wê dê ji erdê negirin, û dîwanî dê bi cil û bergên xwe yên xweşik li dor wê bigerrin. Lê bi min re ew dê nedanse çiku min ti gulek sor nîne bidimê'; û wî xwe avêt nav giyayî, rûyê xwe di nav destên xwe de veşart û girî.

'Ew çima digirî?' margîsokek keskî biçûk pirsî dema kilik li hewa di ber re borî.

'Bi rastî, bo çi!' got pelatînkekê yê li pey tîrojekê dipirrpirrî.

'Bi rastî, bo çi?' pistî beybûnek guhê cîrana xwe, bi dengek nerm û nizm.

'Ew bo gulek sor digirî', bilbil got.

'Bo gulek sor?' ew qîrrîn; 'çi kenokane ye!' margîsok, yê ku hinekî reşbîn bû, rasterast kenî.

Lê bilbil di nehîniya xemgîniya şagirtê xort giha û bêdeng li ser darê nişt û li efsûniya evînê pûnijî.

Tavilê wî çengên xwe bo firrînê belav kirin û hilket hewa. Ew wek siyekê di nav daristanokê re borî û wek siyekê di gulistanê re seyirî.

Li nîveka zeviya giyayî deviyek delal ya sorgulan hebû, û dema bilbil ew dît, firriyê û dada ser çeqek wê.

'Gulek sor bide min', bilbil got, 'û ez dê bedewtirîn strana xwe bo te bibêjim.'

Lê darê serê xwe lê hejand. 'Gulên min spî ne', wê bersivand; 'spî şibî kefa deryayan û spîtir ji berfa gupika çiyayan. Lê herre nik xwişka min ya li ber rojenga kevn, belkî ew ya dixwazî bide te.'

Wa bilbil firrî ser dara li ber rojenga kevn.

'Gulek sor bide min', wî got, 'û ez dê bedewtirîn strana xwe bo te bibêjim.'

Lê darê serê xwe lê hejand. 'Gulên min zer in', wê bersiv da; 'zer hindî pirça keça avîn ya li ser kursiyek karîbanî rûniştî û zertir ji nêrgizên li mêrgan dipişkivin ji berî dirûvan bi tirpanan dikevin nav. Lê herre cem xwişka min ya li ber pencereya yê şagirt, belkî ew ya dixwazî bide te.'

Wa bilbil firrî ser dara sorgulan ya li ber pencereya yê şagirt.

'Gulek sor bide min', wî got, 'û ez dê bedewtirîn strana xwe bo te bibêjim.'

Lê darê serê xwe lê hejand.

'Gulên min sor in', wê bersivand, 'sor wek piyên kevokan, sortir ji morîk û mircanên gir yên di şkeftên okyanûsan ve her dipêlin. Lê zivistanê sirr û sar kirine demarên min û seqemê bişkojên min piçandine û bahozê çeqên min şkandine û îsal min qet ti gul nabin.'

'Ez tenê gulek sor dixwazim,' bilbil girî, 'tenê gulek sor! Ma ti rê nînin ku wê peyda bikim?'

'Rêyek heye', darê bersiv da; 'lê wa xirab e ku newêrim bibêjim te.'

'Wê ji min re bibêje', bilbil got, 'ez natirsim.'

'Ger gulek sor bixwazî', darê gotê, 'divê tu wê li ber tavheyvê ji muzîkê çêbikî û bi xwîna dilê xwe birengînî. Divê dilê xwe bidî ber striyekî û ji min re bistrî. Divê hemû şevê bo min bistrî, û divê strî dilê te biperritîne, û divê xwîna canê te biherrike demarên min û bibe ya min.'

'Mirin bihayek giran e bo gulek sor, bilbil got, 'û jiyan bo her yekî şirîn e. Dilşadî ye rûniştina li ser darên kesk û nerîna li rojê di erebaneya wê ya zêrrîn de û li heyvê di erebaneya wê ya morîkî de. Şirîn e bêna dargiwîjê û şirîn in gulberfînên xwe li geliyan vedişêrin û gulgêzikên li girik û zûrikan vedifirrin. Lê hê jî evîn xweştir e ji jiyanê, û ma çi ye dilê firrindeyan li ber yê mirovan?'

Wa wî çengên xwe yên gewr bo firrê vekirin û hilket hewa. Ew wek siyekê di nav daristanokê re pirrî û wek siyekê di gulistanê re seyirî.

Şagirtê xort hê jî li nav giya paldayî bû, li ciyê bilbil ew vehêlabû, û rondik hê jî ji çavên wî yên spehî ziha nebûbûn.

'Kêfxweş be', bilbil gotê, 'dilxweş be; gula te ya sor dê peyda bibe. Ez dê wê ji muzîka xwe li ber tavheyvê şên bikim û bi xwîna dilê xwe birengînim. Ya min wek berdel ji te divê tenê ew e ku tu evîndarek ji dil bî çiku Evîn hişmendtir e ji Felsefeyê tevî ku ev hişmend e jî, û xurttir e ji Hêzê tevî ku ev xurt e jî. Reng-agir in çengê wê û ji rengê agir e bedena wê. Lêvên wê şirîn in wek hingiv û hilma wê wek gulan.'

Yê şagirt ji erdê li bilbil guhdarî dikir lê tê nedigihî ka bilbil çi dibêje çiku wî tenê ew dizanî ya di pirtûkan de hatiye nivîsîn.

Lê dargûz tê gihî û pirr xemgîn bû çiku gelek hez dikir ji bilbilê biçûk yê hêlîna xwe li ser çeqên wê çêkiribû.

'Hê stranekê ji min re bistre', dargûz pistî, 'ez dê pirr hest bi tenêtiyê bikim piştî nemana te.'

Wa strî bilbil ji dargûzê re û dengê wî wek avê bû ya ji amanek zîvîn dibilqe.

Dema bilbil strana xwe xilas kir, yê şagirt rabû ser xwe û lênivîskek û pênivîskek ji berîka xwe deranîn.

'Ew şeng e', wî got dema di nav daristanokê re meşî - 'ew yek nikare jê bêt mandelkirin lê ma hest hene? Mixabin na. Bi rastî, ew mîna pirraniya hunermendan e: ew hemû stîl e bê dilpakî. Ew xwe gorî yên dî nake. Ew tenê li muzîkê dirame, û her yek dizane ku huner xweperestî ne. Dîsan jî, divê bêt dirkandin ku xwedî dengek delal e. Mixabin ti wateya wan dengan nîne yan jî kêrî tiştekî nayên.' Û ew çû odeya xwe û xwe dirêj kir ser doşekoka xwe ya ji kayê û dest bi pûnijîna li ser evîna xwe kir; û, piştî demekê, di xew çû.

Û dema heyvê şewqa xwe da, bilbil firrî ser dara sorgulan û sînga xwe da ber striyekî. Bi dirêjiya hemû şevê ew strî, sînga wî bi strî ve, û heyva belûrî sar daşorrî û guh dayê. Bi dirêjiya hemû şevê bilbil strî, û strî kûrtir û kûrtir di sînga wî daçû û xwîna canê wî jê darijî.

Bilbil pêşî strî li ser welidîna evînê di dilê keçekê û yê kurrekî de. Û bi gupika çeqê jorîn yê dara sorgulan ve gulek sosret pel bi pel dest bi pişkivînê kir dema stranek li pey ya dî hat xwendin. Sîs bû pêşî wek mija li hindavî çem - boz bû wek piyên spêdeyê û zîvîn bû wek çeng û baskên elindê. Wek siya gulekê di neynikekê re, wek sîbera gulekê di gerravekê de, wa bû gula dibişkivî bi gupika çeqê jorîn yê darê ve.

Lê darê bang kir bilbil daku hê pêttir xwe bi strî ve bişidîne. 'Xwe pê ve bişidîne, bilbiloko', dar qîrrî, 'yan roj dê derbikeve ji berî sorgul bigihe.'

Wa bilbil sînga xwe xurttir bi strî ve şidand û dengê strana xwe her bilindtir kir çiku ew distrî li ser welidîna dildariyê di canê kurrekî û yê keçekê de.

Û rengek delal yê sorî vebûyî xwe da pelên gulê, rengek wek yê li rûyê zava dema ew bûkê dimaçîne. Lê strî hê negihabû dilê wî lew dilê gulê hê spî mabû çiku tenê xwîna dilê bilbil dikare dilê gulê sor bike.

Û darê gazî bilbil kir daku xwe zêdetir bişidîniyê. 'Bişidîne, bilbiloko', dar qîrrî, 'yan roj dê derbikeve ji berî sorgul bigihe.'

Wa bilbil pirrtir xwe bi strî ve şidand, û strî xwe gihand dilê wî, û janek dijwar xwe di dilê wî re da der. Dijwartir, her dijwartir dibû jan, û tûjtir û her tûjtir dibû stran çiku ew li ser evînê bû ya bi mirinê kamil dibe, evîna di gorrê de namire.

Û gula sosret bû sorî geş, mîna sorgula esmanê rojhilat. Geş û gurr bûn bersîngên pelan û sor bû wek pagend û yaqûtan dilê gulê.

Lê dengê bilbil qels û lawaz bû û çengokên wî dest bi şepşepînê kirin û ewrek ket ser çavên wî. Lawaztir û her lawaztir bû dengê wî, û wî hest pê kir ku tiştek gewriya wê difetisîne.

Paşî ew cara dawîn strî. Heyva spî strana wî bîst û spêde ji bîr kir û li esmanan vema. Gula sor strana wî bîst û jihalçûyî velerizî û pelên xwe vekirin ber hewayê sar yê spêdeyê. Vedengê strana wî gihand şkeftên li serê giran û şivanên nivistî ji xewa wan şiyar kirin. Strana wî bi rûlên çem re dabezî û wan peyama wê gihand deryayê.

'Binere, binere!' darê bang kir, 'niha sorgul tevav bûye'; lê bilbil ti bersiv neda çiku ew mirî paldayî bû di nav giyayê borr re, strî di dilî re.

Û nîvro yê şagirt pencere vekir û li derê nerî.

'Ax çi parçeyek bextiyariyê ye', wî gazî kir; 'ev e sorgulek! Min di hemû jiyana xwe de sorgulek wa delal nedîtiye. Ew wa spehî ye ku piştrast im wê navek dirêj yê latînî heye.' Û wî xwe şorr kir û gul jê kir.

Paşî wî kumê xwe kir serê xwe û sorgul di dest de bezî mala yê profesor.

Keça profesorî li ber derî rûniştî bû û seyê wê jî li ber piyan bû.

'Te got dê li gel min bidansî eger ji te re gulek sor bînim', yê şagirt gotê. 'Ev e bo te sortirîn gula dinyayê. Tu dê wê bi xwe re hilgirî, û dema em bi hev re direqisin, ew dê ji te re bibêje ka ez çend ji te hez dikim.'

Lê keçikê eniya xwe lê qirmiçand.

'Mixabin ew li cilên min nayê', wê bersiv da, 'û, di ser re jî, birazayê dîwaniyekî hin dirr û cewerên rastîn ji min re şandine, û her kes dizane ku ew pirr ji gulan bihadartir in.'

'De ca, bi sond, tu pirr bêminet î', yê şagirt dilmayî got; û sorgula xwe avêt erdê, û sorgul ket cokekê, û xirxalek erebaneyekê da ser.

'Bêminet!' keçikê got. 'Ez dibêjim te ku tu pirr bêmarîfet î. Û ca ka tu kî yî? Tenê şagirtokek î. Na, ez bawer nakim ku te ta avzûnên zîvîn jî hebin wek kurrê yê dîwanî bixî pêlavên xwe', û keçik ji ser kursiya xwe rabû û çû hindirr.

'Çi tiştek pûç e evîn!' yê şagirt got dema ji wir dimeşî. 'Evîn bi nîvî jî ne mantiqî ye çiku ew ti tiştî napeyitîne û ew hertim hin tiştan dibêje yên dê neqewimin û tiştên nerast bi mirovan dide bawerkirin. Bi rastî, ew kêr nayê. Û madem di vê serdemê de kêrhatin her tişt e, divê ez li felsefeyê vegerim û metafîzîkê bixwînim.'

Wa ew vegerî odeka xwe û pirtûkek gir ya tozgirtî derkişand û dest bi xwendinê kir.

*Wergerandin: 8/2004*

## Cilên nû yên paşayî

Hans Christian Andersen (1805 – 1875)

Berî çendîn salan hebû paşayek yê wa pirr ji cilên nû hez dikir ku hemû pareyê xwe bi cil û bergan pûç dikir. Ne leşkerê wî û ne jî huner mereqa wî bûn, û ger ne bo nîşandana cilên xwe yên nû ba, ew ti car li nav gulistana xwe jî nedigerrî. Her saet wî qapût û saqoyê xwe diguherrand, û dema li welatên dî dihat gotin: paşa li dîwanê ye, li vî welatî dihat gotin: "Paşa li cilxanê ye."

Li wî bajarî, yê paşa lê dijiya, cejn û şahî dihatin kirin, û her roj mêvan û gerrvan dihatin wir. Carekê du hîlebaz li bajarî peyda bûn. Ew qaşo cildirû û qumaşvan bûn û wan pesn û senaya xwe dida ku ew spehîtirîn cilên dinyayê didirûn. Hem reng û hem jî dirûv nedîtî bedew bûn û herwa di cilên ew didirûn de ev taybetmendiya seyr û sosret heye: ew mirov, yê ku nikare erk û wezîfeyên xwe bi cî bîne yan jî qewî bêaqil e, wan cilan qet nabîne.

- De bo Xwedê, aha ew in cil, paşa pûnijî. Dema wan li xwe bikim, ez ê tavilê pê bihesim ka kî di dewleta min de nikarin erka xwe bi cî bînin: ez ê di cî de bikarim ji hev bikim ka kî hişmend û kî jî bêhiş e. Bila di zûtirîn demê de ew cil bo min bên dirûn! Û wî têr pare dan fêlbazan daku dest bi karê xwe bikin.

Wan du darik bo raçandina qumaşî çikilandin û qaşo lê dixebitîn tevî ku ne deziyek û ne jî derziyek pê re hebû. Bêyî dilê wan bi kesî bişewite, wan birengtirîn armûş û hevrîşm û şengtirîn zêrr û zîv xwestin lê hemû xistin cêb û berîkên xwe û bi şev û roj li ber darikên rût dest û piyên xwe dianîn û dibirin daku xelk bawer bike ku qumaşî radiçînin.

- Xwezî min bizaniya ka amadebûna qumaş gihaye kû! paşa di dilê xwe de got û jê re hinekî xweş hat pê bihese ka kî ye bêhiş yan nekar. Ew netirsî ku bi xwe bêhiş û bêşiyan derbikeve lê dîsan jî biryar da ku kesek din li şûna xwe bişîne bo agadariyan. Hemû bajar haydar bû ji sihra qumaş û her kesî dixwest bizane ka cîranê wî çend bêhiş e.

- Ez ê xweş-wezîrê xwe yê pîr bihinêrim nik qumaşvanan! paşayî got. - Ew herî baş nirxê cilan dinase çiku ew hişyar e û ti kes ji wî baştir erk û wezîfeyên xwe bi cî naîne.

Xweş-wezîrê kal çû salona yên cambaz lê mijûlî qumaşên neyî bûn. - Wey Xwedêyo! wezîrê pîr ji xwe re got û çavên xwe zîq û biloq kirin. Ez ti nabînim! Lê wî ew bi deng negot.

Yên xapînok daxwaz jê kir ku xwe nêzîktirî qumaşan bike û jê pirsîn, ma dirûv ne delal û reng ne spehî ne. Wan qumaşên neyî nîşanî wî dan, û wezîrê pîrî reben çavên xwe hê beltir kirin lê nikarî ti bibîne ji ber ku ti tinebû.

- Bi alîkariya te, ya Yezdan! ew pûnijî. Ma dibe ez bêhiş bim? Min ê qet bawer nekira ku mirov dikarin pê bihesin! Ma ez neşêm erk û wezîfeyên xwe bi rê ve bibim? Na, nabe ez bibêjimê ku ez qumaşan nabînim.

- Ê, hûn ti basa qumaşan nakin! yekî ji dirûvanan wezîr agadar kir.

- Wey, pirr xweşeng in! Bêqam bedew in! wezîrê kal gotê dema ji paş berçavkên xwe hêv dikirê. - Ev şikil û ev reng! Belê, welle ez ê bêjim paşayî ku ev qumaş pirr bi dilê min e.

- De mala te ava! qumaşvanan gotê û jê re ravekir ka çi reng û çi dirûv li qumaşî hatine mezaftin. Wezîrê pîr bi mereq û baldarî, bi sexbêrî û hişyarî guh dayê daku li pêşberî paşayê xwe hemû bibêje, û wa kir jî.

Yên lihbok her dawaya pirrtir pare, armûş û zêrran dikir. Qaşo ew pêdivî bûn bo qumaşî. Lê wan hemû dikir kîsê xwe. Yek ta ben jî bo qumaşî tine bû lê mêrikan bi lez û bez hewante dixebitîn.

Di nêz de paşayî karmendek xwe yê kêrhatî yê dî hinart cem wan daku bizane ka amadebûna qumaşî li çi qûnaxê ye. Ya wezîr bi serê yê karmend jî hat: wî kir û nekir ti qumaş nedît çiku ti qumaş nebûn û darik ripîrût bûn.

- Ma ne qumaşek spehî ye? yên hîleker gotê û delaliya dirûvên qumaşên neyî nîşanî wî da û jê re şirove kir.

- Çawan be ez ne bêhiş im! mêrik di xwe de pûnijî. Ma bi rastî ez nikarim erkên xwe bimeşînim? Ca hê ew kêm bû! Lê nabe ez xwe pê derînim! Lew wî dest bi pesna wî qumaşî kir yê ku wî nedidît û bawerand ku ew heyran û dilbijiyayî rengên qumaşî yên şirîn û dirûvên wî yên narîn e.

- Belê, ew qumaş bi rastî bênimûne bedew e! wî ji paşayî re got. Li wî bajarî êdî ji bilî wî qumaşê jêhatî û berkeftî basa ti nedihat kirin.

Ket dilê paşayî jî wî qumaşî bibîne hê dema dihat raçandin. Digel komek camêr û cindiyên giregir - di nav de herdu karmendên wî yên berê çûbûn wî qumaşî bibînin - paşa ket rê û çû bal yên hîlebazan. Çi ji dest qumaşvanan dihat, qaşo texsîr nedikir lê ne dezî û ne jî dirêzî pê re hebûn.

- Ma ne gir û giran e! herdu camêrên karmend got. - Paşayê'm, ka ji merdiya xwe hema li van reng û şikilan binere! Û paşî wan darikên rût nîşanî paşayê xwe dan çiku wan bawer dikir ku bi rastî jî xelk wî qumaşî dibîne.

- Ev çi ecêbî ye! paşa pûnijî. Ez ti nabînim! Ev erjengî ye! Ma ez wa bêhiş im? Ma ez kêrî paşatiyê nayêm? Ji vê mezintir bela nikarin bên serê min!
- Wey, pirr delal e! paşayî got. - Ez berztirîn bextiyariya xwe pê dibexşim! Û wî serê xwe dostane bo daçemand û li darikên rût dinerî bêyî ku biwêre bibêje ku ti nabîne.

Hemû peyrew û civata wî çav bi xwe ve nehêlan hindî fekirinê lê ti kesî ti qumaş nedît. Lê wan hemûyan li gel paşayî digot: "Wey, pirr delal e!" û pêşniya kir ku paşa bi wan cilan derbikeve nav wî karwanê cejn û şahiyê yê ku dê di zûtirîn demê de hatiba lidarxistin.

- Delal e, şeng e, şirîn e! ji her devî dihat bîstin, û hemû ji qumaşî razî bûn.

Paşayî paye û stêreyên pilebilind bi qumaşvanên hîlebaz bexşandin.

Diviyabû cejn li spêdeyê dest pê bike, û hemû şeva berî wê xew bi çavên yên fêlbaz neket û wan li ber ronahiya şazde find û şemalan texsîrî nekir daku xelk bibîne ku ew bêrawestan dixebitin ji bo cil û bergên nû yên paşayî amade bibin. Dirûnvanan qaşo qumaş ji darikan vedikir, bi meqesan hewa dibirrî, didirû bi derziyekê ya ku dezî di kunika wê re nebû.

- Va ye, niha cil û berg amade ne!

Dema paşa û mezinên din yên dîwanê hatin, cambazan destên xwe radikirin qaşo tiştekî pê bilind bikin û digot: - Va ye, ev şelwal e, ev çakêt e, ev eba ye, û ta dawiyê pê ve çûn. - Ew pirr sivik in mîna tevnê

tevnpîrkê! Dibê qey ti tişt li mirovî nîne dema ev cil lê bin. Lê ji ber hindê ew wa jêhatî ne.

- Rast e! dîwaniyan got. Lê wan ti nedidît ji ber ku ti tinebû.

- Ger ji mezinahî û merdaniya xwe cilên xwe yên niha li xwe ji xwe bikî, yên xapînok got paşayî, - em ê li ber vê neynik û awêneya mezin van cilên nû li te bikin.

Paşayî xwe rûs kir, û hîlebazan qaşo yek bi yek cilên nû yên ku wan qaşo dirûbûn danê. Wan destên xwe li dor wî dialandin daku qaşo şal û şûtikê lê girê bidin, û paşa jî li ber neynikê li dor xwe dizivirrî.

- Wey Xwedê, çend xweşik li te tên! Ew bi spehîtirîn awa hatine fesilandin! hemûyan bi yekdengî digot. - Ax çi şikil e! Wax çi reng e! Wey çend bihagiran e!

- Sîwana şerefê, ya ku dê li nav karwanê şahiyê li raserî te bêt hilgirtin, amade ye, Paşayê mezin! rêveberê serekî yê şahiyê ragihandê.

- De ka, ez jî amade me! paşayî got. Ma ne pir li min tên ev cil? ew li ber neynikê hê carekê li dor xwe zivirrî mîna heyranî keşxetiya bejnûbala xwe be.

Berdestikên dîwanê, yên ku diviyabû serê berdayî yê şal û şûtika paşayî hilgirin, destên xwe bi erdê ve radikişandin ku qaşo şalê hildigirin. Ti kesî nedigot ku ew ti tiştî nabînin.

Paşa bi karwanê cejnê re li bin sîbera sîwanê dimeşî, û hemû mirovan li ser kuçe û kolanan û di pencere û şaneşînan de digot:

- Xwedêyo, çi xweşeng û keşxe ne cilên nû yên paşayî! Ca çi şalek şeng e! Way çend xweş li hev tên!

Ti kesî nedixwest bibêje ku ti nabîne çiku dê hingê ew bi xwe diyar bûba ku bêhiş e yan kêrî erka xwe nayê. Ti car berê xelk wa nebûbû heyranî cilên paşayî.

- Lê qet ti cil li paşayî nînin! zarrokek biçûk got.

- Wey Xwedêyo, de guh bidinê, ev zarrokê dilsaf û bêguneh çi dibêje! bavê wî got, û xelkê ew gotin pistî guhê hev.

- Qet ti cil li paşayî nînin! taliyê hemû gel got.

Tezînek bi ser pişta paşayî de hat çiku wî dizanî gel rast dibêje lê ji xwe re digot: - Çawan be jî, divê ez ta dawiyê tehemilê bikim!

Û wî serê xwe hê bilindtir kir, û berdestikan hildigirt serek wê şalê ya ku qet tine bû.

*Wergerandin: 10/2003*

## Pênc diyariyên jiyanê

Mark Twain (1835-1910)

I

Li spêdeya jiyanê periyek qenc li gel zembîla xwe hat û got: - Ev pênc diyariyên jiyanê ne. Yekê jê bigire, yên dî bihêle. Û hişyar be, bi hişmendî bibijêre! Wey, bi hişmendî bibijêre! çiku tenê yek ji wan binirx e.

Diyarî pênc bûn: Navdarî, Evîn, Zengînî, Zewq, Mirin.

Yê xort bi coşî got:

- Ti sedem nîne ku zêde bipûnijim.

Û Zewq bijart.

Û ew bi dinyayê ket û gerrî li zewqan yên xortaniyê şa dikin. Lê her yek ji wan zewqan jîkurt bû û bûn sedema dilsariyê, bêkêr û bênaverrok bûn. Û her zewqê tirrane û tinaziyên xwe pê dikirin dema jê vediqetîn. Taliyê wî got: - Min ev hemû sal pûç borandine. Xwezî min bikariya dîsan bibijarta daku min bi hişmendî bibijarta.

II

Perî dîsan diyar bû û got:

- Çar diyarî mane. Vê carê jî bibijêre; lê ax, ji bîr neke - dem diherrike, tenê yek ji wan bihagiran e.

Mêrik pirr pûnijî û paşî Evîn bijart; û haya wî ji wan rondikan nebû yên ku ji çavên periyê hatin.

Piştî çendî çend salan mêrik li mala xwe ya xirrûxalî li ber tabûtekê rûniştî bû. Ew ji xwe re dipeyivî û digot: - Yek li pey yên din ew çûne û ez bi tenê hêlame; û niha ev jî çû, ev ya delaltirîn û dawîn. Kul û derdan li pey hev daye ser min. Her kêlîka bextiyariyê, ya ku bazirgana fêlbaz ango Evînê firotin min, min bi hezaran xeman kirriye. Ji kûriya dilê xwe ez Evînê nefret dikim.

III

- Dîsan bibijêre. Ya dipeyivî perî bû. - Salan hişmendî fêrî te kiriye. Divê wa be. Hê sê diyarî mane. Tenê yekê ji wan ti nirx heye - ji bîr neke, û bi sexbêrî bibijêre.

Mêrik dirêj pûnijî û paşî Navdarî bijart; û bi axînên kûr perî derçû.

Sal borîn û perî vegerrî û rawestî li pişt mêrik yê ku rûniştî bû û bi tenê bû digel ramanên xwe dema roj ava dibû. Û perî haydar bû ji ramanên wî:

- Navê min dinya dagirtibû û pesndana min li ser zimanê her kesî bû, û demek kurt ji min ew tiştek baş bû. Lê ax ew çi demek kin bû! Paşî hatin çavnebarî û newehî, paşî kerb û kîn, dawiyê zilm û zordarî. Û taliya tevan jî dilsojî ya ku gorra şan û navdarîê ye. Wey li reşî û rebeniya navdariyê! Bûm hedefa navreşiyê dema serkeftî bûm, bûm armanca tirrane û tinaziyan dema ruxîm.

IV

- Hê carekê bibijêre. Ew dengê periyê bû. - Du diyarî mane. Nekeve bêhêvîtiyê. Tenê yek ji wan binirx bû û ew hê jî maye.

- Zengînî - ew hêz e! Ax, ez çend kor bûm berê! mêrik got. - Niha dê jiyana min bibe hejî jînê. Ez dê xerc bikim, pûç bikim, bimezêfim. Hemû yên yariyên xwe bi min dikin û min biçûk dihesibînin dê xwe li nav tozê bigevêzin û ez dê dilê xwe hesûdiya wan têr bikim. Ez dê ji xwe re peyda bikim hemû xweşiyan, şadiyan, jihalçûnan, hemû rezamendiyên li ber dilê mirovan ezîz. Ez dê bikirrim şan û navdarîê, bistînim nirx û nirxdariyê, perêzvaniyê - hemû xweşiyên bêkêr yên jiyanê yên ku li bazarên dinyaya bêwec peyda dibin. Min berî niha bijartinên nebaş kirine û pirr dem ji dest daye. Hingê ez nezan bûm û min ew tişt baş dihesibandin yên ku tenê baş dixwiyan.

Sê salên kurt derbas bûn û rojek hat ku mêrik li serdavka xwe rûniştibû û direcifî. Ew çilmisî û rengavêtî bû û cilên wî jî perritî bûn. Wî pariyek nanê req dikirrand û diminminî:

- Nalet li hemû diyariyên dinyayê çiku ew tirrane û derewên zêrrkirî ne! Û bi navên sexte ne, her yek. Ew ne diyarî ne lê deyn in. Zewq, Evîn, Navdarî, Zengînî. Hemû tenê cilên derewîn yên berdemkî ne li rûyê rastiyan: Janê, Xemê, Şermê, Hejariyê. Periyê rast digot: di vebijarkiyên wê de tenê diyariyek hebû ku bihagiran bû, tenê yek bû ku ne bênirx bû. Ax çend rezîl û riswa dibînim wan hemûyên din li ber wê ya ku nayê pîvan, ya ku dilîn û şirîn û nermîn e, ya ku difetisîne xewek reş û bêdawî hemû janên bedenê azar didin û şerm û xemên dilan hildikolin! Wê bîne! Ez westiyame, dixwazim bihedirim.

V

Perî hat, dîsan çar diyarî digel xwe anîn lê Mirin jê kêm bû. Wê got:

- Min ew da delalek ber dilê dayika xwe, zarokek sava. Ew nezan bû û baweriya xwe bi min anî û hêla ez jê re bibijêrim.

- Wey li min ê reben! Bo min çi maye?

- Ma çi maye ku tu ne hejî bî: Ezyeta bêsebeb ya pîriyê.

## Mirina Baldassare Silvande

Cîgirê Kontê Silvanyayê

Marcel Proust

*Apollo şivaniya terşûtewalê Admetos dikir, helbestvan dibêjin. Di her mirovî de yezdanek heye ku zarî şêtan dike.*

Emerson

### I

- Alexisê birêzok, wisan negirîn. Hema dibe ku cîgirê kontê Silvanyayê hespekî jî bide we.

- Hespek mezin an canîkekî?

- Belkî hespek mezin mîna yê birêz Cardenio. Lê bi rastî jî dibêjim, niha wisan... li rojbûna çardehsaliya xwe... negirîn!

Çavên Alexis ji pişt rondikan geş bûn dema ew ponijî ku dibe hespek lê bê diyarîkirin û rojbûna wî jî hat bîrê. Lê dîsan jî xemgîniya wî bi temamî

xelas nebû çimkî diviyabû ew biçûya nik mamê xwe Baldassare Silvande, cîgirê kontê Silvanyayê. Erê Alexis, piştî bihîstibû ku apê wî nikare sax bibe jî, çend caran çûbûn seredana wî. Lê piştî hingê tiştek wek berê nemabû. Baldassare hay ji nesaxiya xwe bûbû û dizanî ku wî, herî zêde, sê jînsal mabûn. Alexis tê nedigiha ka çawa vê piştrastiyê mamê wî bi xemgîniyê nekuştibû yan dîn nekiribû, û hest pê kir ku nikare li ber xwe bide û apê xwe bibîne. Ew diramî ku mam dê bêguman ji dawiya xwe ya nêz dibû bipeyive û wî dê nikariya xemên mamê xwe vebirevîne û ta dê nikariya rondik û hêsirên xwe jî newerîne. Wî herdem li hember apê xwe, mezintirîn, keşxetirîn, xurttirîn, şengtirîn û dilnermtirîn lêzimê xwe hurmetek mezin hebû. Wî pirr hez dikir ji çavên mamê xwe yên gewer, simêlên wî yên boz û çokên wî, yên ku jê re di dema zaroktiyê de penagehek bizewq î narîn bûn û dişibîn asêgehek dijmin ticaran nikaribe xwe bigihîniyê, bi qasî hespikên hêsk û colankî xweşik û ji ayingehan jî pîroztir bûn. Bûneweriya reşbîn û tund a bavê Alexis jê re xerîb û ne-ecibandî bû û ew di aşop û xeyalên xwe de li pêşerojekê bû ku bi berdewamî li ser pişta hespekî mîna xanimek nazenîn qeşeng û hindî padîşahekî jî wurşedar be, û zelamên mengî û îdeal li ber wî kesên mîna mamê wî bûn. Wî dizanî ku bi xwe jî dişibe mamê xwe yê keşxe û lewend û dizanî ku ew mam jîr, qenc e, bi qasî metranan an generalan bihêz û bibandor e. Erê wî ji gotinên dêbavên xwe fam kiribû ku mamo xwedî hin kêmasiyan jî bû. Ta dihat bîrê ka mam çiqas bînteng bû dema pismamê wî Jean Galéas henek pê dikirin, û herwiha dihat bîrê ka çawa çirîskên çavên mamê wî zewqa wî ya xweperestî peyitandibû dema kontê Parmayê soz dabû ku xwişka xwe bidiyê (hingê mam ji bo veşartina kêfxweşiya xwe didanên xwe çîrrikandibûn û mîna berê lencîbû û girnijîbû ku Alexis qet jê hez nedikir) û dihat bîrê ka çawa Lucretia, ya ku bi fermî jî ji muzîka wî hez nedikir, bênirx dihesiband dema pê re dipeyivî.

Dêbavên Alexis bi nerasterêyî hin tevger û kirinên din jî yên mamê wî destnîşan dikirin ku haya Alexis qet jê tine bû lê wî dibihîst ku ew kirin dihatin lomekirin û nifirandin.

Lê hemû kêmasiyên Baldassare, ta lencîna wî ya bêteşe jî, dibe nemabûn. Dema mam zanîbû ku êdî belkî piştî du salên din bikeve nav lîsteya miriyan, jixwe êdî dê henekên Jean Galéas, dostaniya kontê Parmayê û muzîka wî bi xwe çima bala wî bikişandana û wî dê çima li ser wan xem bixwarana. Di aşop û xeyalên Alexis de mamê wî hê keşxe lê ji berê jî nirxbilindtir û bêkêmasîtir bû. Mam jê re nirxbilind lê di heman demê de yê cîhanek din dixwiya. Ango di bêhêvîtiya kurik de pirtikek xem û tirsê cî girtibû.

Hê ji zû de hesp hatibû xarandin û amadekirin loma êdî dema çûnê bû; Alexis siwarî hentûr û erebeyê bû lê dîsan peya bû û çû şîreta dawîn ji malmamosteyê xwe bipirse. Gava wî dê bipirsiya, bi dijwarî rûyê wî sor bû:

- Rêzdar Legrand, kîjan baştir e, mamê min bizane yan nizane ku ez ji mirina wî haydar im?

- Nizane baştir e, Alexis!

- Pa heke wî basa hindê ji min re kir?

- Ew ê neke.

- Ma basa wê yekê ji min re nake? Alexis bi matmayî got çimkî ew tenak vebijark û alternatîv bû ku wî pêşbîniya wê nekiribû: herdem ku di xeyalên xwe de diçû seredana mamê xwe, wî dibihîst ku mamê wî mîna qeşeyan bi dilnermî basa mirina xwe dike.

- Lê hema heke dîsan jî bas kir?

- Jê re bibêjin ku ew şaş bûye.

- Pa heke bigirîm?

- Spêdeyê hûn jixwe zêde girîne, hûn ê li cem wî negirîn.

- Ez ê negirîm!? Alexis bi bêhêvîtî qîrî, - lê hingê ew ê bifikire ku ev qewimîn min xemgîn nake, dê birame ku ez jê... ji mamê xwe yê ezîz hez nakim!

Û dîsan rondik hatin çavên Alexis. Diya wî êdî hew karî lê bipê loma hat kurê xwe; çûn.

Piştî ku sersaqoyê xwe yê biçûk li bersifkê da dest berdest, ê ku taxima cilên wî yên xizmetkariyê li gor arma û nîşana Silvanyayê kesk û spî bû, Alexis bi diya xwe re bîskekê rawestî û li dengê kemanê, yê ku ji odeya cîran dihat, guhdarî kir. Paşî serkêşiya wan ber bi odeyek pirr mezin a dîwarcam û gilover ku cîgirê kont ango vîskont pirrî caran tê ve bû. Dema bikevî wê odeyê, dê li pêşberî xwe deryayê bibînî, û heke li ser milê xwe bizivirî, dê mêrg, çîmen û daristan li ber te bin; li kuncikên odeyê du pisîk, sorgul, xaşxaş û gelek alavên muzîkê hebûn. Ew bîskekê sekinîn.

Alexis bizirî cem diya xwe, wê fikir kir ku wî dixwest wê bihemêzîne lê kurik bi dengnizmî, dev bi guhê dayikê ve got:

- Mamo çend salî ye?

- Ew ê pûşperê bibe sîûşeş.

Li ber devê Alexis bû ku bipirse: "Ma tu bawer dikî ku ew qet bikare xwe bigihîne sîûşeşsaliyê?" lê newêrî.

Derî vebû, Alexis velerizî, xuzmetkar got:

- Rêzdar cîgirê kont dê aniha bê.

Piştî kurtebîskekê xizmetkar vegerî û du firindeyên tawis û berxikek, ên ku cîgirê kont bi xwe re dibirin herderê, anîn. Paşî dengê pêngavan hat û derî dîsan vebû.

"Tişt nabe", Alexis, ê ku dilê wî herdem bi bihîstina dengan pît lê dida, ji xwe re fikirî, "bawer dikim ew xizmetkarek e... erê, xizmetkar." Lê di heman demê de dengek nerm hat guhê wî.

- Rojbaş, Alexisko, û rojbûna te pîroz be.

Û gava wî mamê xwe dihemêzand, tirs bi ser de çû. Dixwiye ku mamê wî jî hay jê bû loma, bêyî ku bala xwe bide ser kurik, ew bi tenê hişt daku kurik tirsa xwe vebirevîne, li diya wî zivirî û bi kêfxweşî ew, jinbiraya xwe, ya ku wî piştî mirina diya di dinyayê de ji her kesî zêdetir ji wê hez dikir, axaft.

Alexis hedinîbû û li hember mamê xwe, yê ku xortemêrek cazîbedar bû û hê hema qet spîçolkîtî jê nedixwiya, yê ku mêrxasî û gernasiya wî ew qas di ser sînoran re bû ku di demên trajîk ên jiyana xwe de jî xwe bextiyar dida xwiyandin, hest bi dilnermiyek bêtixûb dikir. Alexis dixwest xwe biavêje stoyê mamê xwe lê tirsî ku wî bibetilîne û wî qels bike. Awirên mamê wî yên xemgîn û narîn hema dikirin ku Alexis bigirînin. Alexis dizanî ku çavên mamo herdem xemgîn bûn û di bîskên bextiyariyê de jî

wisan dixwiya ku ew xemrevînê ji bo kul û kovanên xwe yên nenas hêvî dikin.

Lê di wî kêlîkê de Alexis diramî ku xemgîniya apo bi egîdî qewirandî revîbû çavan ên ku di ber gep û alekên wî yên lawazbûyî û qurmiçî re di bûneweriya wî de tenak endamên bêhîle û rastnîşander bûn.

- Dizanim, Alexiskoyê delal, ku tu dixwazî bi hentûrek cothespî biajoyî, Baldassare got, - sibê hespek dê ji te re bê anîn. Salek din ez ê bi dana hespek din wan bikim cot û piştî salek din ji wê ez ê hentûr û erebeyê jî bidim te. Belkî tu dikarî îsal wî hespî biceribînî û lê siwar bibî; piştî ku vebigerim, em ê bi hev re biceribînin. Çimkî sibê ez ê bi rastî jî biçim, Baldassare lê zêde kir, - lê ne bo demek dirêj. Piştî kêmtirî mehekê ez ê vebigerim û em ê bi hev re biçin pêşaniya nîvroyî ya kenawerî û komediyekê ku min soz daye te jî bi xwe re bibimê.

Alexis dizanî ku mamê wî dê çend hefte li cem dostek xwe biborandina, wî herwiha dizanî ku mamo hê jî dikarî biçe tiyatroyê; lê ramana mirinê wisan kurik xofandibû û ew hê jî di nav kêlbetanên xwe re şidandibû ku gotinên mamê wî ew ji bingeh ve dihêbitand û matmayî dihişt.

"Ez ê pê re neçim", ew ramî. "Ax, mamo dê çiqas biêşe dema qerf û henekên lîstikvanan û ken û coşa cemawer û temaşevanan bibihîze!"

- Ew çi awaza kemanê ya bedew bû me bihîst dema em hatin hindir? diya Alexis pirsî.

- Ay! Ma ew li ber we bedew bû? rûyê Baldassare geş bû. - Ew romans bû ku min basa wê ji we re kiribû.

"Ma ew bi xwe pêşkêş dike?" Alexis fikirî. "Çawa serketina muzîka wî dikare di vê rewşê de jî wî kêfxweş bike?"

Tam di wê bîskê de rûyê cîgirê kont vequlipî janek dijwar, gepên wî zerikîn, devê wî beş bû, eniya wî qurmiçî û rondik ji çavan herikîn.

"Wey Xwedêyo!" Alexis di dilê xwe de qîrî, "êdî ew hew dikare xwe kêfxweş bide xwiyandin... Weyla mamo rebeno! Lê çima ew ewqas ditirse û naxwaze ku em bi rewşa wî biêşin? Çima ew bela xwe ji xwe venake?"

Lê amaje û girovên têrjan ên felcbûnê, yên ku carinan wisan dikirin mîna ku Baldassare di nav asinan de bê meriçandin û şopên xwe li bedena wî dihiştin û rûyê wî diguherand xerabewêneyek di nav kul û kovanên bijan de, êdî vê carê nerimîbûn.

Piştî ku Baldassare çavên xwe ji rondikan paqij kirin, bi kêfxweşî dîsan dest bi suhbetê kir.

- Wer dixwiye ku dukê Parmayê êdî ji te re ne xweşdost e, ma ne? diya Alexis bi bêahengî pirsî.

- Dukê Parmayê! Baldassare bi hêrs qîrî. - Dukê Parmayê ne xweşheval! Ev hûn çi dibêjin, xwişka delal? A vê spêdeyê wî ji min re peyamek şand û kela xwe ya Illyriayê ji min re pêşnûma kir ku belkî hewayê çiyayî kêrî tenduristiya min bê.

Ew bi lezokî rabû ser xwe lê jana xwe ya dijwar jî bi xwe re şiyar kir loma bêçare ma ku bîskekê rabiweste; hê janê baş bernedabû, wî bang kir jî:

- Wê nameya li rex doşeka min bînin.

Û bi lez xwend:

> *Hevalê min î ezîz Baldassare,*
> *Çi qas ne xweş e ku ez nikarim bêm we bibînim* û hwd.

Bi vê dostaniya mîr rûyê wî geş bû. Lê serdanser, belkî ji bo ku kêfxweşiya xwe, ya ku wî nirxek berz nedidayê, vebişêre, wî didanên xwe çîrrikandin û bi xweşikî lê bi bêteşe bişirî û anî bîra Alexis ku herdem fikiriye ku heman nîşane ji rûyê nearam ê mirinê deng vedidin.

Heman devxwariya Baldassare ya ji Alexis re nas çavên kurik vekirin, nexwe ew li hizûra mamê xwe fikirîbû û hez kiribû li wan rûyan binere ku li ber mirinê ne, yên bi herherî ji rastiya rojane veqetîne ku herî zêde bişirokek bi gernasî neçarkirî, bişirokek dilnerm î xemgîn, a esmanî û bêzarbûyî belkî bikare biçirise. Niha wî guman nedikir ku Jean Galéas mîna berê karîbû mamo biqehirîne, û dizanî ku di veşariyek di kêfxweşî û di çûna tiyatroyê ya mamê nesax de tine bû, û ku Baldassare ketî ber mirinê jî dîsan her li ser jiyanê diramî.

Bi rêya ber bi malê ve ket ramana Alexis ku ew ê jî carekê bimire, û tevî ku hê gelek salên wî yên mamo zêdetir li ber wî bûn, dê dotmama Baldassare, kontesa Alériouvreyê, û herwiha baxçevanê wî yê pîr jî ji wî bi xwe zêde dirêj nejîn. Roccoyê baxçevan têra xwe zengîn bû ku bikare xwe vebikişîne bînvedana pîriyê lê dîsan jî tê dikoşî daku hê jî zêdetir pare bicivîne û tê dikoşî xelatek şerefî ji bo sorgulên xwe werbigire. Tevî heftêsaliya xwe jî kontesê pirça xwe reng dida û nivîsar, ên ku tê de pesna bûneweriya wê ya ciwanşib, pêşwaziyên wê yên xweşik, servîsên wê yên kubar dihat dan, bi pare di rojname û kovaran de didan weşandin.

Van mînakan qet matmana ji ber tevger û rabûn-rûniştina mamo kêm nedikir; berevajî: hê pêlên hêbetiyê di kurik de dizeximandin ku hêdî hêdî ev matman bû hêbetî û kurik bi wan qonaxan, ên ku jiyanê, a wî bi xwe jî pê re, bi paşpaşkî ber bi mirinê ve dibirin, behecand.

Wî bi xurtî biryar da ku ew ê di jiyana xwe de nede pey leylanoka derewîn û ruxîner nebe û mîna peyamberên berê yên bişeref xwe bi çend hevalên xwe yên lîstikan re vebikişîne çolistanekê.

Lê baş bû ku jiyan ji henekkirina bi dêbavan bihêztir bû û wek bervêdan û îtirazekê sînga xwe, ya ku wî hê hemû şîrê çêjşirîn û zeximînende jê veneçikandibû û kaniya wî hişk nekiribû, pêşkêşî kurik kir. Û kurik dest bi vexwarina bi coş û bi kêfxweşî kir û aşop û xeyalên wî yên dewlemend û jêbawer bi çavşînî guhdarî nalînên wî man û dilsariyên wî pîne kirin.

# II

*Goşt bikovan e, mixabin...*
Stéphane Mallarmé

Roja piştî seredana Alexis, cîgirê kont çû kela cîran ku dixwest çend hefteyekan tê ve biborîne bi wê hêviyê ku amadeyiya hejmarek mezin a mêvanan li wir dê bikariya xemên wî, yên ku pirrî caran piştî êşgirtinên wî ew digirt, vebirevîne.

Piştî kurtedemek li kelê, wî hay jê bû ku hemû zewqên wî bala xwe daye ser jinek ciwan. Baldassare hest pê dikir ku jinik jê hez dike lê wî hinekî bi guman û demîngirtî nêzîkî li vê baweriya xwe dikir: wî dizanî ku jinik bêşert yeke pak e û bi bînfireyî li benda mêrê xwe ye; herwiha wî di hezkirina xwe de jî ti piştrastiyek xurt tine bû û bawer dikir ku handana jinê ber bi rêya xerab ve guneyek pirr mezin e. Lê kengî pêwendiya wî û jinikê rûyê xwe guherand, wî nedikarî bîne bîra xwe. Niha wî wek nîşaneya ahenga bêpêjn, û ya hema bêdem jî dixwiya, zendên wê radimûsan û destê xwe li gerdena wê dialand. Jinik wisan bextiyar dixwiya ku mêrik hê dûrtir çû: pêşî rûyê wê maçand, dû re demek dirêj ew mist da û mizişand, û dîsan çavên wê, gepên wê, lêvên wê, kenda gerdena wê, serê poza wê... ramûsandin. Devê jinika ciwan di dema mistdanan de dibişirî, û awirên wê mîna ava rojê gerimandî diteyisîn. Mistdanên Baldassare bistetir û cesûrtir bûbûn; carekê wî li jinikê nerî; ecêbgirtî ma ji ber spîçolkîtiya wê, bêhêvîtiya wê ya bêdawî, ya ku bi saya eniya wê ya mirrîçok û çavên wê yên girîbar, dilşewitîn û westî, yên ku

awirên wan xemgintir bûn ji rondikên ên îşkencedayiyên li ber çarmixandinê yan jî ji yên evîndarên xwe bi ebedî jidestdayî. Baldassare bîskekê çavên xwe li jinikê gerandin; jinikê jî bi têkoşînek bêwêne çavên xwe yên dilovanîxwaz rakirin rastî wî û devê wê yê bicoş di riqaço û krampên xwe yên bêhaybûnî doza hê maç û ramûsanan dikir.

Bi zewqa di biheştbîna ramûsanan û bîranîna mistdana de coşbûyî wan herduyan xwe di hev rapêçandibû û çavên xwe miçandibûn, çavên stemkar, ên ku neynik û awêneya tengasiya giyanên wan bû; wan nedixwest wê tengasiyê bibînin, û nemaze Baldassare çavên xwe bi tundî miçandin mîna celadê wijdan lê bela ku dizane destê wî dê birecife heke li rûyê yê gorî û qurban binere û bikeve derd û kulan li şûna ku xeyal bike ku yê gorî ew kişkişandiye û neçar kiriye ku celad xwe biparêze.

Bûbû şev, û jinik hê jî di odeya mêrik ve bû û bi çavên bêrondik fedikir pêşiya xwe. Wê bi coşek xemgîn destê wî ramûsand û, bêyî ku tiştekî bibêje, derket.

Êdî xewa mêrik nehat, ji xwe ve diçû û direcifî dema dihat bîrê ka çawa çavên qurbana şirîn û nazenîn bi nik wî ve hildiketin û bêhêvî bûn. Di heman demê de ket xeyalên wî ku niha jinik şiyar bû û hest bi tenêtî û bêkesiyê dikir. Wî cil li xwe kirin, bi bêpêjnî meşî ber deriyê odeya jinikê û li xwe seqbêr bû deng jê neyê daku, heke jinik raketî be, wê şiyar neke lê herwiha newêriya vebigere odeya xwe bi xwe jî ya ku tê ve erd û esman lê teng dibûn û bîna wî diçikand. Ew li wir li ber deriyê odeya jinikê rawestî û fikirî ku dê êdî bîskekê jî nikare xwe rabigire û divê bikeve hindir; lê paşî pirr tirsî ku hema wijdana wî dê çawa qebûl bike ku jinikê ji wê xewa şirîn şiyar bike û wê bikişîne nav kul û kovanan ên ku jinik niha jê azad raketiye. Li ber derî ma, geh li ser çokan, geh rûniştî û carinan jî paldayî. Bi berbanga spêdeyê re, sarmayê girtî û hedinî vegerî odeya xwe, têr nivist û bi dilek xweş şiyar bû.

Wan her tişt kir daku wijdana xwe bihedinînin, ew hewisîn kêmbûna ezaba wijdanî û lawazîna zewqê, û piştî ku cîgirê kont vegerî Silvanyayê, ji herduyan re ji bîskên bicoş î bistem tenê bîranînên şirîn û sarbûyî man.

# III

*Xortaniya wî diqîrî û wî nedibihîst*
Madame de Sévigné

Dema Alexis di rojbûna çardehsaliya xwe de çû seredana mamê xwe, wî, bi qasî xeyalkirî, mîna sala berî wê bi hêz hest bi bandorlêbûn û kartêkeriyê nekir. Siwariya berdewam bi hespên mamê wî daniyê bi pêşdebirin û xurtkirina hêz û şiyanên wî dilnazikiya wî vemirandibû û hesta saxlemiyê, ya ku ji ber kereseyên nehînî û kêfxweşiyên bihêz ên xortaniyê pêgirî wê ye, di wî de ava kiribû. Dema wî hest pê dikir ku bi çargaviya hesp re sînga wî mîna bawan û babirekan diperçivî, dema zend û destên wî mîna agirê argûnên zivistanan digurmijîn, dema eniya wî hên dibû di nav çilûyê di ber re difirî ku meşa wî dixemiland, dema dihat malê û xwe berdida nav ava cemidî yan jî dema ew av dişepand û bi nermî serborî û serpêhatiyên xwe dianîn bîra xwe; hemû vê yekê şahiyên hêzên jiyanê di wî de dibişkivandin. Ev hêz, ên ku carekê ji Baldassare serbilindiyek bicoş bûn, ew bi herherî bi cî hiştibû û raguhezîbûn daku dilên xorttir, ên ku ew ê jî carekê neçar bibin dev jê berbidin, geş bike.

Alexis dê êdî ji ber lawaziya mamê xwe zivêr nebûya, û ji ber dawîlêhatina jiyana wî nemiriya. Tevgerên dilşadiyê yên xwîna wî di demarên wî de û dilxwaziya wî ya li hember jiyanê nedihişt ku ew nalînên ê nesax bibihîze. Alexis gihabû wî jiyî ku bedena mirov lê seray û eywanên xwe di navbera xwe û giyanê wisan asê ava dike ku hema giyan rasterê wendabûyî û nemayî dixwiye ta ku rojekê nesaxî yan xemgînî kunikekê dikirrîne û giyan tê re serê xwe dertîne. Alexis nasyarî nesaxiya mirinê ya mamê xwe bûbû mîna ku mirov çawa hewisî her tiştî dibe ku li

derdorên me didome, û tevî ku mam hê dijiya jî, rewşa wî carekê kurik giriyandibû mîna ku çawa yên dimirin me digirînin loma, bi hesibandina mamê xwe wek kesek mirî, Alexis êdî rewşa wî ji bîr kiribû.

Dema mamê wî wê rojê jê re got: - Alexisê delal, ez ê hentûran jî bi hespê duyem re bidim te, ew tê giha ku mam difikirî: "çimkî wek din ez ê negihim hentûran bidim te", û wî dizanî ku ev raman di serê mam de bêsînor kovandar bû. Lê kurik hest bi vê yekê nekir çimkî di wî de êdî cî ji xemgîniya kûr re tine bû.

Çend rojan derengtir pirtûkekê ew matmayî hişt ku basa keleşekî dikir ku dilnazikiya lêzimek wî yê li ber mirinê dilê wî pê nedişewitand.

Êvarê xewa wî nehat dema diramî ku ew bi xwe jî dişibe wî keleşî. Lê roja piştî wê wî rêwîtiyek biserketî ya siwariyê kir, wisan baş xebitî, hest bi dilnermiyek wisan mezin li hember xizmên xwe kir ku bi bêxemî xewq kir û bi bêserêşî raket xewê.

Birêveçûn ji cîgirê kontê Sîlvaniayê re êdî ewqas dijwar bû ku hema êdî qet ji kela xwe dernediket. Xizm û dostên wî teviya rojê pê re diborand, û dikarîbû bê dîtin ku tevgerên herî şêtane û pûçkirinên bêwêne yên maliyetê wî dikirin, îddîayên dûrî aqil pêşkêş dikirin û xwe di xerabîkariyên sosret didanî bêyî ku xizmên wî lomeyan lê bikin an jî dostên wî henekan pê bikin an jî li dij wî derbikevin. Wer dixwiya ku bi bêpêjnî barê berpirsiya gotin û kirinên wî ji ser milî hatibû rakirin. Nemaze diyar bû ku dihat xwestin ku bi nerimandina bi dilnermî û daçemandina bi mistdanan neyê hiştin ku ew dengê bedena xwe, ya ku ji bingeh ve hildihejî dema jiyanê hêdîka dev jê berdida, bibihîze.

Wî bîskên dirêj û xweşik li ser doşeka xwe bi xwe re diborandin; wî ticaran di jiyana xwe de xwe bi xwe venexwendibû şîvê. Wî hest bi

kêfxweşiyek têrxem dikir dema cil li bedena xwe ya biêş dikirin û pala xwe dida milbenda paceyê û radestî nerîna li deryayê dibû. Wî ev cîhan bi wêneyan, ên ku hê jî di wî de dijiyan lê ji ber navber û beredayîtiyê xwedî bedewiyek bêkifş bûn, rapêçand bûyera mirina xwe ya ku hê ji mêj de di serê xwe de nijinandibû lê ew hunereser hê jî bi xemgîniyek bicoş ava dikir. Di aşop û xeyalên wî de xatirxwestina ji duçes Olivianeyê, dosta wî ya platonîk, a ku hukumrana saloneyê bû tevî ku heke hemû mêrên payebilind ên esilzade, hunermend û ronakbîrên herî navdar ên Ewropayê lê bicivîna jî, teşe digirtin. Wî di serê xwe de suhbeta xwe û wê ya dawîn dixwend:

"... Roj ava bûbû, û deryaya di nav darsêvan re dibiriqî şîn bû. Ewrikên şîn û sor sivik mîna destegulên rewşen ên hişkbûyî nerm û mîna neqşên li ser kêlên goran herdem-şên li qeraxa esman hildifirîn. Koma spîndaran di tarîgewrikê de biskên xwe berdabûn ser komsorgulên dêrê; tîrojên dawîn çeqên wan direngandin, bêyî ku dest biavêjin qurmên wan, û wîşiyên ronahiyê bi caxên wan ên bersîber ve didaliqandin. Ji bakok biheştbîna deryayê, ya pel û belgên terr û şil û ya şîr hildifûrî. Ticaran dîmen û xwiyanga Silvanyayê wiha bi têrzewqî êvara tijîxem nexemilandibû."

- Min ji we hez kiriye lê mixabin kêm daye we, dostê reben, di xeyalên wî de duçesê jê re digot.

- Hûn çi dibêjin, Oliviane? Çawa we kêm daye min? We herdem ji daxwaza min zêdetir daye min û bi rastî gelekî jî zêdetir ji hindê ku heke sehekan di evîna me de par hebûya. Wek hûn kesek serxwezayî bin mîna madonnayê û ruhsivik bin wek şîrdiya min, ez heyranî we bûm û we jî ez dilorandim. Evîna min pevgirêdanek bû ku ti xwestekek bedenî nedikarî tûjbîniya wê ya hişmend nerehet bike. Û ma we wek hemberxelat ne dostaniyek bêwêne, çayek bêpayan biçêj, suhbetên naveroktijî û çendîn

destikên sorgulan dan min? Tenê we dizanî çawa bi destên dayikane û axivger eniya min a tagermî hên bikin, hingiv berbidin nav lêvên min ên peritî, mînakên cewer bidin jiyana min. Dosta ezîz, ka ez destê we rabimûsim...

Tenê Piaya xemsar, dotmîrek hûrik a syrakusî, ya ku Baldassare hê jî bi hemû hest û bînahiyan jê hez dikir lê ya ku bala hemû evîndariya xwe ya bicoş dida Castruccio, carinan ew jiyana stemkar, a ku Baldassare dixwest ji bîr bike, dianî bîrê. Ta rojên dawîn jî wî beşdarî li şahî û roşanan dikir û dema bi vê dotmîrê re di ber pozberê xwe re diborî dixwest ku wî biqehirîne û şehmezar bike lê dema bi keçikê re dimeşî jî, hay jê dibû ku çavên wê yên kûr li evîndariyek din digerîn lê wê, tenê ji ber ku li ber ê nesax diket, dixwest vê yekê vebişêre. Lê êdî Baldassare nedikarî biçe şahiyan jî. Lingên wî ew qas goc bûbûn ku wî nedikarî biçe derve jî. Lê dotmîr gelek caran dihat seredana wî û, tam mîna ku ew jî bi yên din re ketibe nav komployekê, ew bênavbirr bi nermî û nazenînî dipeyivî û ticaran wek berê ev nermiya xwe bi qîrînek xemsar û diyarkirina xeyidîna xwe nedişkand. Û Baldassare pê dihesî ku wî ji vê dilnermiya wê ji seredana hemû kesên din zêdetir dilaramî distand.

Lê rojekê, dema ew ji ser kursiyê rabû daku biçe ser sifreyê, xizmetkarek matmayî dît ku ew pirr baştir dimeşe. Wî bangî nojdar kir. Roja din ew baş dihat û diçû. Piştî hefteyekê êdî destûr jê re hat dan ku biçe derve. Hingê di xizm û dostên wî de hêviyek bêsînor vejî. Nojdar texmîn kir ku nesaxiyek demarî ya dikare sax bibe êşa felcê dabûyê ku niha bi rastî jî ev êş wenda dibû. Wî gumana xwe wek rastî pêşkêşî Baldassare kir û got:

- Hûn hatine sitirandin û saxkirin!

Yê darizandî mirinê bi efûya xwe gelekî kêfxweş bû. Lê piştî demek diyarbûna saxiyê, xema rêveker dest pê kir kêfxweşiyê ji pêşiya xwe

vebide. Ji bahozên dinyayê parastî, di nav dilnermiya li derdorê, aramiya ji neçarî û ponijîna azad de mirinxwaziyê ew girtibû. Hê ti şik di serî de tine bûn lê hest bi tirsek nekifş dikir dema diramî ku divê ji serî de dest bi jiyana bike, neçar bimîne ku xwe li ber darbeyên xerîb bigire û sereguhiya li derdorî xwe ji dest bide. Herwiha wî bi şêlîkî hest pê kir ku nexweş bû zewq û tevgerên xwe yên dema nesaxiyê ji bîr bike piştî ku xwe ango destebirayê sosret, ê ku wî pê re bi saetan hem ji dûr û ji nêz ve suhbet kiribû dema lê dinerî ku belem û keştîkan ava deryayê dişeqand, nasîbû. Tam mîna hest bike ku di wî de evînek nû, evînek hê nenas li hember jînwarê wî biwelide mîna di kesek hê ciwan de yê ku li welatê şaş bûbe û ji nû welatê xwe binase, wî jî bêriya mirinê û penaberiya herherî, ya ku hest kiribû ku ber bi wê de bi rê ketibû jî, dikir.

Wî ramanek pêşkêş kir, û Jean Galéas, ku dizanî ew sax bûye, bi tundî li dij derket û henekên xwe pê kirin. Jinbiraya wî, ya ku her spêde û her êvar dihat seredana wî, ev du roj bûn nehatibû. Ev yek êdî ji hedê wî der bû! Wî hê ji mêj de nîrê jiyanê ji bîr kiribû û êdî nedixwest wî hilbigire ser milên xwe. Jiyanê bi çekên xwe yên xweşik xwe nediavêt hemêza wî. Hêz û şiyanên wî dîsan lê vegerîbûn û bi wan re hemû xwestekên jiyanê jî: ew derdiket, dîsan dest bi jiyanê kir û carek din jî di xwe de mir. Mehek dû re êş û janên wî dîsan lê vegerîn. Hêdî hêdî, mîna cara berê jî, dîsan livîn jê re dijwar û dû re jî negengaz hat daku ew dîsan ber bi mirinê de vebigere. Di vê nûbûna nesaxiyê de hema ew sûde jî tine bû ku ew ji jiyanê vebiqete, ne daku wê wek rastîn bibîne lê daku wek tabloyekê lê binere. Berevajî wê carê, niha ew her xweperesttir û xeyidîtir dibû dema bêriya wan kêfxweşiyan, ên ku êdî nedikarî para xwe zewqê jê bistîne, dikir.

Tenê jinbirayê, ya ku wî bi dilnermî jê hez dikir, hin geşî dida dawiya jiyana wî dema bi Alexis re her roj çendîn caran dihat seredana wî.

Danê êvarekê, dema jinbira diçû nik wî, bi rê ve hespên erebeya wê zîçikîn; ew bi tundî dafirî erdê, û siwarek bi çargavî di ber re borî jî pê lê kir, û serşkestî û bêhişbûyî ew hat gihandin cem Baldassare.

Ajovanê wê yê neselixî ji bûyerê sitirî zû banga qezayê gihand cîgirê kont ê ku çavên wî di cî de spî bûn. Didanên wî çîrrikîn, çavên wî biriqîn û perçivîn, û di qehrek erjeng de ew li ajovan arizî; lê wisan dixwiya mîna ku qehra wî hawara wî ya bijan diniximand lê vê hawarê di nav gurmijên qehra wî de bi dengnizmî deng vedidan. Tam wisan dixwiya mîna ku kesek nesax li rex wî yê hêrsbûyî binale. Piştî kurtedemekê nalînek lawaz qîrînên qehrê fetisandin, û cîgirê kont bi kinkinkî şewişî ser kursiyê.

Paşî wî xwest rûyê xwe bide şûştin daku jinbiraya wî ji ber şopên xemgîniya wî xeman nexwe. Xizmetkar bi xemgînî serê xwe hejand: qurbana qezayê nehatibû ser hişên xwe. Cîgirê kont du şev û du rojên bêhêvî li ber doşeka jinbiraya xwe borandin. Wê dikarî hema çi gava hebe jiyana xwe ji dest bide. Şeva duyem emeliyatkirin hat ceribandin. Spêdeya roja sêyem êdî ta daketibû û ya nesax li Baldassare, yê ku nedikarî rondikên xwe bigire û ji kêfan her digirî, dibişirî. Dema jiyan hêdîka hatibû mêvaniya wî, wî nedixwest bibîne lê niha bi xwe bûbû pêrewê mirinê. Bi gefa li hember kesa ji wî re herî hezkirî, mirinê mêrik erjengandibû; wî jî ji mirinê lava kiribû û ew li daxwaza xwe tewandibû.

Wî xwe aza, bihêz û serbilind hîs dikir dema hest pê dikir ku jiyana wî bi xwe ne bi qasî ya jinbiraya wî ji wî re bihagiran bû û ku çava li ber jiyana wê diket ewqas jî jiyana xwe bênirx didît. Wî niha fedikir rûyê mirinê û li şanoya dorberî mirina xwe nedinerî. Wî dixwest heta dawiyê wisan be û êdî radestî derewê nebe ya ku ji wî re bi lidarxistina berxwedanek bedew û navdar li hember mirinê bêşermî û rûreşiyê hilbide gupik û lûtkeya wan û mîna ku çawa nehînên jiyana wî jê şelandibûn, nehînên jiyana wî jî biherimîne.

# IV

*Sibê, sibê û sibê,*
*Wiha roj bi roj dem dikûse*
*Ta kîteya dawîn a jiyanê*
*Û her rojekê bi xwe re qeşmer*
*Birine gorên tarî. Vebimirîne, vebimirîne şemalê!*
*Jiyan tenê sîberek gerok e, lîstikvanek reben e*
*Ku dema xwe li ser sehneyê ye*
*Lê paşî kesê hay jê namîne: Jiyan çîrokek e*
*Tirredînekî vegotiye, tijî deng û pêjn e*
*Lê bêwate ye.*
Shakespeare, Macbeth

Hest û westîna ji ber nesaxiya jinbirayê nexweşiya Baldassare bi xwe jî lezandibû. Ew aniha ji cem qeşe vegerîbû ku ji bo xerifandina guneyên xwe çûbû cem û bihîstibû ku êdî tenê bi qasî mehekê dema jiyana wî mabû; demjimêr dehî spêdeyê bû, û şirrik baran dibarî. Hin erebe li ber derê kelê sekinîn. Ew duçes Oliviane bû. Baldassare diponijî ku bûyera mirina xwe bike awazek biaheng.

"... Bûyer dê li êvarek sayî biqewimiya. Roj dê biçûya ava, û deryaya di nav darsêvan re dibiriqî dê rengşîn bûya. Ewrikên şîn û sor sivik mîna destegulên rewşen ên hişkbûyî nerm dê li qeraxa esman hilbifirîna..."

Û li dehî spêdeyê, li jêr esmanê beropizdanên xwe nizmkirî û qirêj, di nav şirrikbaranê de duçes Oliviane hat serdena wî; û ji ber ku Baldassare bi nexweşiyê kerixîbû, xwe radestî nirxên berztir kiribû û êdî bala xwe nedida efsûniya tişt û kesên payebilind, şirîniya ava jiyanê û şan û şoretê, wî tika kir ku ji duçesê re bê gotin ku nesaxiya wî ew pirr lawaz

kiriye. Duçesê kir û nekir, cîgirê kont nexwest wê pêşwazî bike. Jixwe erk û vatiniyek wî jî tine bû: jinikê êdî nirxek xwe li nik wî nemabû. Mirinê bi nermî ew bend û girêk, ên ku berî çend hefteyan tirsa koletiya xwe xistibû dilê wî, piçandibûn. Baldassare dixwest li ser jinikê birame lê tiştek nedihat ber çavên giyana wî: çavên xeyal û bêweciyên wî miçîbûn.

Bi qasî hefteyekê ji berî mirina wî jê re basa govend û şahiyên dotmîra Bohemiayê hat kirin û hat ragihandin ku di wan şahiyan de Pia dê bi Castruccioyê roja din ji wir biçe Danîmarkayê re serçemka govendê bi rê ve bibe, û vê yekê Baldassare pirr çavnebar kir û qehirand. Wî bang kir ku Pia bê cem wî. Jinbiraya wî li dij vê yekê derket lê wî fikir kir ku asteng li ber hevdîtina wî û Piayê tên danîn û derdor dixwazin ku bêsebeb wî hêrs bikin loma xeyidî. Daku ew zêde zivêr nebe, bangî Piayê hat kirin.

Dema Pia hat, mêrik tam aram lê keserkûr bû. Wî jinik kişand ber doşeka xwe û serdanser basa şahiya dotmîra Bohemiayê jê re kir:

- Em ne xizmên hev in û hûn ê tazî û şîniyan bo min nedeynin lê dixwazim ji we lava bikim: soz bidin min ku hûn ê neçin wan şahiyan.

Wan fekir hev û di awirên xwe de giyanên xwe, giyanên kovan lê bicoş, ên ku mirinê nikarîbû bigihîne hev, peyitandin.

Baldassare tê giha ku jinik di sozdana xwe de biguman bû, wî devê xwe xwar kir girnijek bijan û got:

- Na! Sozê nedin! Soza mêrê li ber sekeratê li erdê nedin. Heke hûn ne piştrast bin, sozê nedin.

- Nikarim sozê bidim we: ev du meh in ku min ew zelam nedîtiye û belkî êdî qet nebînim; ez ê hemû jiyana xwe poşman bim heke neçim wan şahiyan.

- Hûn rast dibêjin çimkî hûn ji wî hez dikin, çimkî her hin mirov dê bimirin… û hûn ê bi hemû hêzdariya xwe bijîn… Lê tiştekî ji bo dilê min bikin: bi qasî wan bîskan, ên ku we dê li vir şîna min bikira, ji şahiyê vebiqetînin û li derveyî şahiyê bin. Bangî giyana min bikin bila bîskekê bi we re bikeve bîranînan, piçekî li ser min biramin.

- Bawer nakim bikarim wê sozê jî bidim, şahî pirr kurt e. Tevî ku li kêleka wî mêrî bim jî, bi zor bigihim lê binerim. Ez ê ji her rojek din bîskekê bidim we.

- Hûn nikarin, hûn ê min ji bîr bikin; lê heke piştî salek din, mixabin! Heke piştî demek dirêjtir, pirtûkek xemgîn, bûyerek mirinê, êvarek nixte û baranî we li ser min bide fikirandin, ax ê ji min re çi dilovaniyek be! Ez ê êdî ticaran, ticaran we nebînim… ji bilî di giyana xwe de loma divê em di heman demê de hevdu bi bîr bînin. Hûn ê herdem li bîra min bin daku giyana min vekirî be dema hûn bixwazin bikevinê. Lê jina vexwendî mirov pirr dide rawestandin û pandin! Baranên sermawezê dê kulîlkên gora min rizandibin jî, pûşperê dê ew sotandibin jî lê hê jî giyana min dê ji ber bêsebriya xwe bigirî. Ax çiqas hêvî dikim ku hê carekê bîranînekê, salveger û roşanekê yan herikek ramanên we hûn bianîna raserî dilnermiya min; hingê min ê hûn bibihîstina, hûn ê bidîtana, herder dê ji bo pêşwazîkirina we bi efsûnî bibişkiviya û kulîlk bidana. Li yê mirî biramin. Lê ax! Ma dikarim hêvî bikim ku mirin û bîskek we ya jidil tiştek wisan bi dest bixin ku jiyanê, dildariyên wê û rondikên me û kêfa me û lêvên me nikarîne bi cî bînin.

# V

*Niha şkest dilê cewer... Şevbaş,*
*Kurmîrê çeleng! Komên firîşteyan*
*Bila te bistrînin axa aram!*
Shakespeare, Hamlet

Tayên dijwar bela xwe ji cîgirê kont venedikir; doşeka wî hatibû raguhezandin odeyek gilover î mezin ku Alexis di rojbûna sêzdehsaliya xwe de jî ew pirr kêfxweş tê ve dîtibû, û ku tê ve yê nesax dikarî di heman demê li deryayê, pêlşkîna strîngehê û ji hêla din ve jî li mêrg û daristanokan binere. Carinan ew dipeyivî jî lê di gotinên wî de êdî şopek jî ji ramanên berz, ên ku hefteya berî wê ew cewerandibû, tine bû. Wî bi dijwarî kesek nedihat dîtin dinifirand çimkî qaşo wî kesî henekên xwe bi yê nesax dikirin; wî her xwe wek baştirîn muzîkjenê sedsalê û jêhatîtirîn esilzadeyê cîhanê radigihand. Paşî geh ew dihedinî û ji ajovanê xwe tika dikir ku bibe meyxaneyekê yan jî hespan ji bo nêçîrê kurtan bike. Wî kaxezên nameyê xwestin daku hemû sertacên Ewropayê ji bo bûy û dîlana xwe ya bi xwişka dukê Parmayê re vebixwîne; dema ji ber deynê xwe yê nedayî yê qumarê ji tirsan dilerizî, kêrek kaxezkî ji ser maseya xwe ya şevî radigirt destê xwe û, mîna ku demance be di destan de, tev digerî. Wî xizmetkar şandin daku peyamê jê re bînin ka qaşo polîsê wî şeva berî hingê pelixandî miribû yan na, wî stranên xeberreş û çêrî bi kenkî bo jinekê, ya ku qaşo destê wê di destê wî de bû, digotin. Firîşteyên kuştinê, yên ku wek Şiyan û Viyan tên nasîn, ne amade bûn ku cinên wî yên xerab û xwiyabûnên bênirx ên bîranînên wî biqewirînin û bipengizînin. Piştî sê rojan, li derdorî demjimêr pêncî şevê ew, mîna ku ji xewek xerab, a ku mirov jê ne berpirs e lê bi şêlî û nezelalî bi bîr tîne, be, şiyar bû. Ew pirsî ka xizm û lêzim li hizûrê bûn dema wî bênirxtirîn, necistirîn, genîtirîn û fistewîtirîn para di xwe de derbiribû, û ji ber

dîsanhatina teb û cinên xwe, wî tika kir ku xizm û lêzim dîsan bên ji wir derxistin ta ew dîsan bê ser hişên xwe.

Wî çavên xwe li derdorên xwe yên odeyê gerandin û bi rûkenî li pisîka xwe ya reş, a ku li ser guldanka çînî bi gula krîsantem dilîzî, nerî. Wî fermand ku hemû mêvan û yên hatî seredanê derbikevin û demek dirêj bi qeşeyê li ber doşeka wî çavdêr re suhbet kir. Lê dîsan jî xwexefirandin red kir û bangî bijîşk kir ji qeşe re bibêje ku zikê wî êdî nikare xwe li ber nanê xwexefirandinê bigire. Piştî bîskekê wî fermand ku jinbiraya wî û Jean Galéas bên hindir. Wî got:

- Min xwe radestî mirinê kiriye, bextiyar im ku niha bimirim û bikarim bi bal Yezdan ve biçim.

Hewa wisan nerm bû ku hat karîn pencereyên bi çavkorî li deryayê dinerîn bên vekirin û pencereyên hêla din, ên ku mêrg û daristan li ber belav dibûn, ji ber bayê pihêt û tund girtî hatin hiştin.

Baldassare nivîna xwe da raguhezandin ber pencereyên vekirî. Keştiyek, a ku deryavanan ji pêlşkînê bi werîsan dikişand firetiya deryayê, bi rê diket. Kurikek keştiyê yê keşxe yê dorî panzdehsalî di ser hêlek keştiyê re xwe dadiçemand; wer dixwiya ku ew ê li ber her pêlê bikeve avê lê ew bi çelengî li ser lingên xwe yên xurt radiwestî. Wî bi torrê masî vedikişandin, û di nav lêvên wî yên ba sûrkirî de qelûnek dûkêldar şorr dibû. Û bayê bawan û babirek diperçivandin lezî gep û alekên Baldassare hên bike û pirtikek kaxezê di odeyê ve bi xwe re rafirand. Baldassare serê xwe zivirand daku êdî hew wê dîmena bextiyar ji zewqan bibîne ku wî bi şeydayî jê hez dikir lê êdî nedibû tam bikiyê. Wî berê xwe da strîngehê: keştiyek bibawan a sêdîrekî xwe ji bo çûnê amade dikir.

- Ew keştî dê biçe Hindistanê, Jean Galéas got.

Baldassare kesên li pêhnik û guverteyê, yên ku destmalên xwe dihejandin, baş nedisehirandin lê texmîn kir ku bêrîkirina xerîbiyê çavên wan şêlandibûn; wan hê pirr derfet ji bo jînê, hevnasînê û pêhesînê hebû. Singê keştiyê hat hilkişandin, qîrînek hilket, û keştiyê berê xwe da rojavayê ya ku lê ronahiyê belem û ewr têkilî mija wê ya zêrîn dikirin û sozên bêwêne û nediyar dipistandin guhên rêvingan.

Baldassare tika kir ku pencereyên aliyê deryayê bên girtin û yên aliyê mêrg û daristanokan bên vekirin. Wî berê xwe dida zeviyan lê hê jî qîrîna xatirxwaziyê ya ji keştiya sêdîrekî di guhên wî de dişingî û didît ku kurikê keştiyê, qelûn di nav didanan re, torr vedikişandin.

Destê Baldassare agirane dilivî. Serdanser wî çingînek dengnizm bihîst ku hema nedihat guhê mirov û mîna dilqutînê ji kûr dihat. Ew dengê zengilên dêra gundekî pirr dûr bû ku di hewayê sayî û bayê guncayî de bi çendîn qonaxan di ser deşt û çeman re hatibû daku bigihe guhên wî, daku guhên wî yê seqbêr bibihîzin. Ew dengek nihoyî lê di heman demê de dengek pirr kevnare bû; hingê Baldassare bihîst ku dilê wî jî biaheng bi zengilan re lê dida dema zengil hildifirîn û dil jî radiwestî dema wer dixwiya ku zengilan deng dadimêtin xwe û paşî zengilan jî xwe bi wan dengan re berdida perrên esmanan.

Di hemû serdemên jiyana xwe de dema wî dengê zengilên dêrê dibihîst, çingîna wan a li êvarek hewanerm dema ew hê kurikek biçûk bû û bi zeviyan ve vedigerî kelê, dihat bîrê.

Hingê nojdar tika ji yên amade kir ku bên nêztir û got:

- Ev dawî ye!

Baldassare bi çavên miçandî pal da û dilê wî guhdariya zengilan, ên ku guhên wî yên mirinê felckirî êdî nedibihîstin, dikir. Wî diya xwe didît dema wê kurê xwe dimaçand dema kurik vedigerî malê, dema wê kurik êvaran dinivand û piyên wî di destên xwe de digerimandin û li rex wî dima heke xewa wî nehata; *Robinson Crusoe*yê wî, stranên xwişka wî êvaran li nav baxçe, gotinên malmamosteyê wî dema pêşbînî dikir ku kurik dê carekê bibe muzîkjenek gewre û xemgîniya bi zor veşartî û niximandî ya diya xwe.

Niha êdî dem û derfet tine bûn ku bendewariya bicoş a dê û xwişkê, ku wî ewqas bi stemkarî xapandibû, bi cî bîne. Wî dîsan zîrfon û ixlemûrek mezin, a ku li binê wê hatibû nîşanîkirin, û roja betalkirina nîşaniyê, ku hingê tenê diya wî karîbû xemên wî vebirevîne, hatin bîrê. Wî xeyal dikir ku matîjêker û xwedîkera xwe ya pîr dihemêzand û kemana xwe ya pêşîn di dest xwe de digirt. Wî hemû ev yek di ronahiyek nerm û têrxem de, di heman dûrahiyê de didît, mîna ku çawa pencereyên aliyê zeviyan jî bi çavkorî berê xwe didanê.

Wî hemû ev yek bihîstibû tevî ku tenê du-sê saniye ji gotinên nojdar "Ev dawî ye!" borîbûn.

Nojdar dîsan destê xwe rakir: - Xelas!

Alexis, diya wî û Jean Galéas bi kontê Parmayê, yê ku aniha gihabû wir, re çok dan. Xizmetkar li ber deriyê vekirî digirîn.

*Kewçêr 1894*

## Pirç nîv dinya

Charles Baudelaire (1821 - 1867)

Bihêle dirêj, dirêj bên bikim bêna pirça te, rûyê xwe danoqînim nav, wek mirovê tînî serê xwe dike nav kaniyê, û wê bi destê xwe bilivînim, mîna desmalek bênxweş, da bîranînan verevînim hewa.

Xwezî te bizaniya ka çi hemû tiştî dibînim! ka çi hemûyê hest dikim! ka çi hemûyê di nav pirça te de dibîzim! Canê min li nav bêna xweş digere wek çawan canê yên dî di muzîkê de.

Di nav pirça te de tevavek xewnan hene, tijî baberik û karîteyên keştiyan; di nav de deryayên mezin hene ku bayên wan yên pasat min berev seqayên dilhebîn dibin, dibin devera esman lê şîntir û kûrtir, navçeya bêna fêkî, pelan û leşê mirovan ji hewa tê.

Di deryaya pirça te de keştîgehek dixwiye ya mişt e ji stranên xemgîn, ji giregirên hemû neteweyan û ji keştiyên ji hemû dirûvan yên wek avaniyên delal û pirrcore diteyisin li hember esmanê bêsinor, warê germiya herherî.

Di destdana li pirça te hest dikim bi heman rûzerbûnê mîna li odeka keştiyek bedew, li ser dîwanê, li gel borîna demên dirêj, dema hatin û çûna deryayê li keştîgehê bêyî bêt dîtin dihejiya, li nav zembîlên gulan û şepîna ava hînikker.

Li agirgeha geş ya pirça te bên dikim bêna cigareyê ya afyon û şekir têkil; di şeva pirça te de dibînim şîniya esmanê tropîk bêdawî tîrojan dide; li dûlikên bipûrt yên pirça te sermest dibim ji bênên zeytên gûza hindê, miskê û qetranê.

## Odeya cêwî

Charles Baudelaire (1821 - 1867)

Ev ode, ya dişibe xeyalan, ev odeyek bi rastî bênfire ye, û hewayê wê yê neliv rengê xwe dide sorî û şîniyê.

Canê mirov li vir xwe dişo bi betaliyê û bi bêrî û daxwazê gulav dide. Ditarike, disorike, dişînike; xewnek lezetdar e li dema rojxeyirînê.

Dirûvên mobîlya û raxistekên odeyê dirêj bûne, xilmaş in. Wer dixwiye qey raxistek ketine xeyalan; dikare bêt texmînkirin ku jiyana wan jî hindî ya gulûgiyayan û mîneralan xewnawî ye. Çît û qumaş bi zimanek lal dipeyivin wek gulan, wek esmanan, wek rojên ava dibin.

Li dîwar tek reşkirinek jî ya hunerî nîne. Li ber xeyalkirina pak, li ber çavdêriya danehûrandî, hunera bi rastîniyê ve sinordar, ya lasayî siriştê dike heqaret e. Ev hemû têr ron e û xapînokî kubar e bo bikare ahengî be.

Bênek piçekî şil ya bi zor xwiya ya pirrî bijare difirre li vê odeyê ya pêjnên odeya germ ya gulûgiyayan dilê xewto dilorînin.

Muslîn* mîna baranê boş dadirije li ber pencereyan û doşekê, wek sûlavên berfê dadikeve erdê. Li ser doşekê paldayî ye Zirrxwedê, serdara xewnan. Lê çawan ew li vir e? Kê ew aniye? Çi hêza sihrê ew li ser wî textê han yê xeyalan û zewqê bi cî kiriye? Ferq nake. Ew e! wê dinasim.

Ewên han in çav, yên gurriya wan matmanê ji hev şeq dikin; *stêrkên* tûj û erjeng yên ji tirranetiya wan dinasim! Ew dikişînin nik xwe, bindest dikin û dadiqurtînin xwe awirên çavdêrê nesexbêr. Min pirr car çavdêriya wan stêrên reş kiriye yên mirovan dikin mereqdar û heyranî xwe.

Spasdarî kîjan cinê xêrxwaz bim ku wiha dikarim li nav efsûniyê, bêdengiyê, tenahiyê û bênan bim! Wey pakî! Çiku ya em dibêjinê jiyan -

di herî bextiyariya xwe de jî - ne ti hevpar e li gel vê celeb jiyanê ya niha hest pê dikim û ya deqe bi deqe, saniye bi saniye zewqê jê digirim!

Na! êdî ne hene deqe, ne saniye! Dem wenda bûye; Herherî serdest e, herheriya pakiyê!

Lê derbeyeke girane tirsnak gurmî derî, û mîna di xewnên min yên dojehî de min wa hest kir qey derbeyek tevrî bi zikê min ketibe.

Û paşî cebanî hat hindirr. Ew îcrakar e yê hat li ser navê qanûnê min şkence bike; yara erzanok e ya têt gilî û gazinên hejariya xwe bike û fihêtiyên jiyana xwe li jiyana min zêde bike; yan berdestkê sernivîserê rojnameyê ye û dewama destnivîskê dixwaze.

Odeya biheştî, zirrxwedê, serdara xewnan, *Xatûya ba*, wek Renéyê mezin digot, hemû vê efsûnê li gel gurmîna cebanî deng vedaye.

Çend erjeng e! tê bîra min! tê bîra min! Tam wa! ev odeya bêserûber, ev lêgeha bêriya herherî ya min e. Ewên han in raxistekên bêteşe, tozgirtî, pelixî; argûna çipên tifê tewizandî bêyî pel û bizot; pencereyên rezîl yên baranê xîçik li toza wan çêkirine; destnivîskên verastandî yan nîvûnor; salnameyek ya bi pênûsê roj û berwarên reş û tarî lê hatine nîşankirin.

Û ew bêna wê dinyaya dî, ya hemû pêjnên min gêj kirin, li şûna wê tenê tama tal ya cigareyê û ca çi bêna fistewî ya kûfîkiyê maye. Hewayê vê odeyê yê kerrixîner, yê niha bên dikim, sade bêhêvîtî ye.

Li vê dinyayê, ya teng e û wa miştî qirêj e, tenê tiştek nas li min dibişire: şûşeyek biçûk ya helînek ya efyonê; yarek kevn û tirsnak; wek hemû yaran tijî destlêdanxwazî û bêbextiyê ye.

Erê herê! Dem vegeriye, Dem niha tekhêz serdest e; li gel vê pîretewta dilan dikerrixîne vegeriyane keriyên Tirsan, Bêntengiyan, Kabûsan,

Enirrîtiyan, û Nevrozan, karwanê wê yê şeytanî. Bawer bikim ku saniyeyên aniha diborin bi hêz û bi şengî giran û giring bûne; û her saniye - dema ji hejokeyê dijene - dibêje: Ez Jiyan im, Jiyana bêhedan!

Di jiyana mirov de tenê saniyeyek heye ya armanca wê ya pîroz ragihandina mizgîniya xêrê ye, ew *Mizgîniya xêrê* ya di hemûyan de dibe sedema xof û tirsek nikare bêt şirovekirin.

Belê, Dem serdest e; wê diktatoriya xwe ya zordar vegerandiye. Û ew bi gopalê xwe yê dunişterî min dizextîne mîna gayê cotî bim. - Berev rastê, aa-ahewere! Xuh bide, kole! Diyar bike ku sax î: bilive, hey lanetiyo!

---

*Muslîn: Navê çîtek / qumaşek ji pembû ye - çapa kurdî.*

## Bêhêvîtiya pîrejinikê

Charles Baudelaire (1821-1867)

Pîrejinek biçûk ya qirmiçî xwe bêhode bextiyar hest kir dema zarokek şirîn dît ku her kesî dixwest wê nazdar bike û dilê wê xweş bike; afirandiyek delal bû zarok, bi xwe jî hindî pîrejinikê nazik û mîna wê bêdidan û bêpirç.

Û pîrejinikê xwe nêzî zarokê kir daku lê bibişire û kêfa wê bîne.

Lê zaroka bizdayî bi destkirina pîrejinika qenc ya hişkbûyî perpitî û xanî bi qîjîna xwe dagirt.

Hingê pîrejinika çê vegerrî bêkesiya xwe ya herherî, wê li kuncikekî rondik barandin û ji xwe re got: - Ji me rebenên pîr boriye ew dem ku me dikarî kêfxweş bikin - eger ne ti yên dî - hema dilpakan; û em ditirsînin wan biçûkokan jî yên em dixwazin jê hez bikin!

## Her sermest bin

Charles Baudelaire

Divê mirov herdem sermest be. Tenê hind: tenê ew e hemû mesele. Daku hûn nehesin bi barê giran yê Demê, yê diperçiqîne li we milan û we diavêje erdê, divê hûn hemû demê sermest bin.

Lê bi çi? Bi meyê, bi wêjeyê yan bi qenciyê, li gor dilê we. Lê her mest bin.

Û ger carinan, li ber deriyê koşkekê, li ser giyayê kesk yê bercoyekê, li bêkesiya odeya xwe ya tarî, hûn piştî daketina yan nemana sermestiyê şiyar bibin, ji ba, ji pêlekê, ji stêrekê, ji firrindeyekê, ji demjimêrkekê, ji her tiştê dibore, diçerixe, distre, dipeyive bipirsin ka çi dem e. Û ba, pêl, stêr, firrinde, demjimêrk dê bibersivîne: dema mestbûnê ye. Ji meyê, ji wêjeyê yan ji qenciyê, li gor dilê we.

## Mirina şaîr

***Reûf Bêgerd***

Lerza xweşiyekê bi ser leşî de hat û livlivek xist ser lêvan. Ji wan xweşiyên lezgîn û tavil û seyrane bû ku pirr kêm dibin mêvanî leşên westî û kerrixî. Wek tê zanîn, herdem mîna keştiyek betilî ne û kêm caran li bendera kêfxweşiyê bênvedanê dikin. Bo ku baş tam û çêja wê seh bike, bi qurtekê qedeh nîvî kir. Hilmek kûr li cegera wî da. Ku birûyên wî şidiyan û eniya wî qirmiçokên zirav ketinê, bi dudiliyekê destê xwe bir berîka xwe, bi lez parçekaxezek derxist û berîk daxist. Li saloxdanekê pûnijî, zarokek li nav kolanên varê û veder ket xeyalan, bi evrazî û nişîviyan ve hildiket û dadiket. Ne bi dilê wî bû. Bîskekê berê xwe da aliyekî. Ku dîsan li xwe zivirî, qirmiçokên eniya wî nemabûn. Bi lez qelema xwe deranî, xetek bi ser mirinê de anî û kir jiyan. Mîna ku vêca ji karê xwe piştrast bûbe, milê xwe hejand û ji xwe re got: Ferqa wan çi ye? Herdu jî meseleyên dijwar ên dîrokê ne, du serên cuda û lihevneker û nakok tevî ku bêyî hev jî nabin, him? Diviyabû yek hebe û ya din na.

Carek din jî helbesta xwe xwend, çavên wî li ser peyvan hedîn û rawestîn. Wek peyv hingiv bin û hing lê bicivin yan jî çav pelatînkên rengîn bin ku bi hêwirî û aramî bên û biçin. Hesenê dostê wî jî bû pelatînk û têkilî helbesta wî bû. Xwest wî bigire lê ti bi destî ve nehat. Axînek kişand û got: Tu dê kengî bê daku bi arezûyek jidil helbesta xwe ji te re bixwînim? Lê Hesen bo wê şeva wî çirayek vemirî bû.

Parçekaxeza xwe pêçand û xist berîka xwe. Ji xwe re got: Eger zû bêt weşandin, destkefteya wê dê têra vexwarina min û Hesen a çend rojan bike... êê... Ev jî core jiyanek e, kî dibêje ku ne ji gelek jiyanên din xweştir e? Êê Hesen çima nehat? Tu bêjî qey tiştek bi serî hatibe? Ev cîhana aloz û nerind hem li hev tîne û hem jî pelate û belav dike. Ma

çima em aşna û şarezayî wê nebin? Ev jiyana pûç her van bi xwe re tîne, tarîtiyê û ronahiyê, bi pirranî ber bi tarîtiyê ve, berev tarîtiyek bêdawî. Ev jî çarenivîs e, em hemî di keştiyek rêwenda de ne, me berê xwe daye nediyariyek bêdawî. Her girav me radikişîne û her pêl me dûr diavêje ta di encamê de em dikevin gerd û zivirokek ber bi kûratiya tarîtîstanekê bê ku em şopekê li pey xwe bihêlin.

Qurtek din lê da û henaseyek kûr kêşa. Serê xwe rakir û bi berdana dûkêl re çavê xwe da derî (Dereng e û Hesen her nehat... Dostek mezin û şaîrek behremend e... Tu bêjî bi şev jî neyê? Na... li kû be jî dê vegere koxikê şaîrane. Li wir em ê hê jî vexwin. Ew tine be, ez bi tenê destek jêkirî me, ode wêran û biyan e, tenê şevekê jî tê ve debar û tehemil nakim. Odeyek bêserûber bo du şaîrên belengaz... Êê, zêde ye, şaîr di odeyên wiha de helbestên bilîmetane dinivîsin. Cihên wisan ronahiyek, berheyek wisan didin mirov ku koçkên rengîn qet nikarinê. Ma ne Marx dibêje: "Ku cilên hincirrî û perritî li min bûn, min bedewtirîn berhem dinivîsîn lê pirr ditirsim ku eger cilên xweşik li xwe bikim, ez dê tiştên bêkelk û bêwec binivîsim." Ma ne wisan e? Du textik û maseyek, komek pirtûkan û hin perr û kaxezên bi her hêlê ve belav û pelate bûne, wêneyek Goran li dîwar hilawîstî, bi şevan jî xewa rengîn a sermestî û şaîrane. Êdî çi divê?)

Nîv qedehek din jî qurçand. (Xweştirîn dem e ku em bi deng bi hev re helbestan dixwînin. Lê hê jî xweştir ew e ku helbest lal dibe û em bi cotikî digirîn... Hesen îşev li kû yî? Ji her şevê zêdetir niha ez bêrîker im... Helbest û mey û arezû.)

Govend û semaya tilên xwe bi birde-birda xwe re kir yek:

Şevdereng e
serê min canîkek bihêrs e
zîtikan diavêje û dihîre.
Tevî ku deriyên vê dinyayê

dîwarek polayî bin jî
niha li vir
ji bilî min û tenêtiyê
ew canîk nehedandiye.

Qedeha xwe ta çipa dawîn bi ser dilê xwe de kir, destê xwe bi serûçavên xwe de anî. Paşî destê xwe kir berîka xwe de û parçehelbesta xwe deranî. Xemek xweşik ket ser rûyê wî, dişibî mijek binefşî. Ji xwe re got: Helbest jiyanek bi serê xwe ye, wek tê gotin, zimanê xwedayan e. Ev tenêtiya min, esmanê sayî, dara şên, çîrok û şano, hemî bedewî û delaliyên vê jiyanê helbest in. 'Neke' û 'here' yên keçan, axîn û nalînên kuran, xwişîn û lemelema kanîkan, berfa rizde û betenan, hemî helbest in. Jiyana helbest tê de nemîne, dê bibe bûz û qeşayek bêtam û bêbên.

Serê xwe rakir û çavên wî bi wê koma şewl û gulop û ronahiyan ket yên ku li aliyê hemberî wî yê yane û meyxaneyê daliqandî bûn, vêdiketin û vedimirîn, yek li pey ya din rengên wan diguherîn.

(Ez jî her di wê vemirîn û vêketinê de bûm, di jiyanek xweragirî û xweveşartinê de, dûr ji mey, cixare û jin... De vêca çi maye? Jiyan û ezmûnek xweş jî bû, kul û derdên wê bitam bûn. Hingê her tiştî nirxê xwe yê taybet hebû. Paşî bû zindan û bendîxane... bendîxane û meyxane... Bo serwaya helbestê jî dibin alîkar. Di van herdu jiyanan de çi li min guheriye? Hîç. Lê cudayiya wan çi ye? Eger rahatî û şarezayî dorberî xwe bûyî, her tişt asayî dibe; li wir pêwîstiya min tiştek din hebû, li vir bi helbestê heye. Naçar im, mîna Dostoyevskî dibêje: hespê erebekêş im, divê bênavbirr bixebitim an kuçe û kolan dê bibin warê min ê şev û rojan. Ey zeman, ji kû ta kû? Ev bextê reş me diavêje nav lîstok û yarîkan û bi me dilîze. Lê wek Hemingway dibêje: di yekem şaşiyê de me dikuje, nizanî çima, wek encam pêwîst e jî me bikuje, her kes dikare ji vê piştrast be lê bo hinan bendewarî divê ta dor bigihiyê. Hesen, îşev li kû yî? Çima nehatî daku mizgîniya vê helbesta xwe ya nû bigihînim te, yan jî

wan yadgar û bîranînan ji te re vebêjim ên ku tevî kevnariya xwe jî neketine ber penceyên felekê û jengarî nebûne.)

Qedeha dawîn da dagirtin û bi carekê nîv jê nîç kir. Çavên xwe gerandin lê ji bilî xwe û berdestkekî li nêzî xwe kes nedît. Ku saet jê pirsî, haydar bû ku derengî şevê ye. Bi lez nîveka din jî ji qedeha xwe da ser gewriya xwe. Rabû ser xwe û bi yekem gavê re yane û meyxane li ber çavên wî jêr-û-jor dibû. Ji xwe re got: "Îşev bendewariyê pirr bi min daye vexwarin. Ev hemî ereq bû? Çawan xwe bigihînim malê? Her divê bigihimê û helbesta xwe jê re bixwînim. Raketibe jî, ez ê rabikim."

Xwar-û-lar, bi vî alî û wî alî ve dişewişî ta xwe gihand derve. Li ber derî rawestî û bi dengek bilind got: Li min heram be êdî yane û meyxane ta mirinê!

Xwe spart dîwar û pê ve bi rê ket. Gavên wî diheziqîn û hevsengiya wî têk dibir. Sarmayek bikuj ket leşî. Hatûçûna li kolanan vemirîbû. Sarmayê ta ku diçû zêdetir lerz dixist hinavên wî û gavên wî sisttir dikirin. Ket. Bi ketin û rabûnê re ji xwe re got: Jiyan her ketin û rabûn e, yan rabûn û ketin. Ya giring ew e ku bi temamî neşkê. Tenê neşkê bes e. Lê jixwe hin mirin jî gelek ji jiyanê mezintir in. Îşev li kû yî? Çima te ez tenê hiştim? Yan jî ez her tenêmayiyek şkestexwarî me?

Pala xwe da dîwarekî. Mîna ku hêviya dilovaniyê ji sarmayê bike, serê xwe berev esmanan rakir û birde-birdek kir. Paşî hêz da xwe û li kolana serekî ket rê: Ev kuçe û kolan çol û hol in, ev serêşî û serxweşî jî her helbest in. Îşev ez û helbest û ev gerdûn bûne yek.

Serê wî xwar bû, leşê wî xwe ranegirt, virde-wirde şewişî û ket û li nîveka kolanê piyên wî ji gavavêtinê qut bûn. Req rawestî û di heman demê de hest pê kir ku ev kolan gupik û lûtkeyek berz û bilind e ku tenê ew gihayiyê. Lerzekê girt. Ji dûr ve tirimpêlek bi lez hat. Dema nêzîk bû,

çend caran hişyarî dayê. Lê şaîr kevokek çeng û ling şkestî bû, tenê karî berê xwe bidiyê û destê xwe wek ala lê dirêj bike. Deng û hewarek melûl di heman bîskê de bilind bûn, mit bûn û dîsan bilind bûn. Li kinara kolanê girêl bû û gindirî, mîna berrikekê li hev hat badan. Tilên destek wî ji berîkê derketin û ketin liv û tevgerê. Xwînek geş ji serê wî hat. Dixwest tiştekî binivîse lê sarmayê rê nedayê. Tirimpêl her ya berê bû, kolana tarî di çavmiçkekê de vehişt û wenda bû. Di xanîkê wan ve Hesen jî her tilên xwe digestin û bendewarî vegerîna dostê xwe yê şaîr bû daku helbesta xwe ya wê şevê jê re bixwîne.

*Çapa orîgînal: Mergî şaîr, 1985*
*ji soranî: 1/2003*

## Bo xatirê jinê!

'Elaeddîn Seccadî

Hê ew top û tiveng û heytûhot venemirîbûn, roj her roja şûr û tîr û rim û mertalan bû. Ev Tekşê ku wiha dibînî êxtiyar û şil û kor bûye, li dema xwe li hemî devera Gelwaxî wisan navdar bû ku tenê bihata gotin "Tekş hat", ta zarok jî di landik û dergûşan de bêdeng û bêpêjn dibûn.

Xortek nûgihayî bûm, nûbişkivî bûm, min kes di ser xwe re nedidît. Spêdeyekê rabûm, min xwe amade kir, şaşik û kumê xwe kir serê xwe û tîr hilgirt, mertal da pişta xwe û rim girt destê xwe. Min mehînek hebû, hema difirî, lê siwar bûm û berê min li ciyê nêçîrê li ser rêya xwe tûşî vê karesatê bûm:

Li serê çiyayên Kewle digerîm, ji dûr ve li geliyê tenişta Xirose sawêrek bi ber çavê min ket. Min bala xwe dayê; ku nêzî bûm, diyar bû zelamek derdorî 25-salî, hindî bêjî berkeftî û lihevhatî, şûrek di ber re bû û her birr çekên din jî pê re hebûn û li mehînek kihêl siwar bû. Hê jê dûr bûm, min dît ku ji mehîna xwe peya bû, hefsarê wê xist destê xwe û doxîna xwe vekir û rûniştin mîstinê. Ez giham raserî - hingê dinya wek niha bi dekûdolaban û fêlbaziyan nehatibû tewizandin, bira birayê xwe avêtî ber bextê wî nedikuşt; dijminê xwîndarî jî ba, diviya te jê re bigota: niyeta min xerabî ye, amade be.

Min nerî ku mêrik ranabe. Neçar mam bang bikimê: "Kuro! Rabe ser xwe, siwar be, li vê çolê yan ez ê te bikujim yan tu min." Mêrik her ji ciyê xwe got: "Tu û bextê xwe! Sond bixwe ku ta siwar nebim dest nakî min." Min bi devê xwe jê re sond xwar ku ta siwar nebe, ez ti lê nekim.

Vêca rabû doxîna xwe girê da, ket ser rê û hespê xwe bi dû xwe ve kêşa! Ev ji min re pirr seyr bû û min gazî kirê: "Kuro, ev tu çi dikî, de siwar

be!" Got: "Te sond xwariye ku ta ez siwar nebim, dest nakî min. Lê ez jî siwar nabim ji ber ku ma ez nizanim ku tu Tekş î!?"

Pirr li min ecêb bû ku wisan digot! Ez lê xurrîm: "Kuro, siwar be, roj dereng e, îro te her tişt ji dest min kir. Yan tu dê min bikujî yan ez te." Lê ev gav yek û ev gav du, ew siwar nebû. Got: "Xwe nadim kuştin; çi dikî bike." Nêzî du seatan bi pey ketim lê ti pê ve nehat! Neçar mam vegerim ser rêya xwe û wî jî bi wî awayî xwe filitand.

* * *

Roja piştî wê dîsan min lez da xwe, siwar bûm û min rast berê xwe da ciyê roja berî wê. Hê negihabûm serê çiya, min dît ku ji dûr ve siwarek têt. Vêca çi hatinek bû? Bi leza ba dilezî. Ji bejnûbala wî min got ku hebe-nebe yê duhî ye, îro heke biçe ber perrên esmanan jî ji destê min xelas nabe.

Min got hê çavê wî bi min neketiye divê ez xwe bigihînimê daku ne ya duhî bîne serê min. Min li qûntara çiya xwe da ber, kêm mabû bigihimê lê min tew dît dîsan ji hespê xwe dabezî û wek duh dest bi mîstinê kir! Min got: ya rebî, ev çi bela ye û çawan xwe jê xelas bikim?! Jixwe nabe ew peya ez êriş bikimê. Min xwe negirt, neçar mam û çûm ji pişt ve lê xurrîm: "Kuro, bes e, rabe, wek duh neke! Rabe, yan tu dê min bikujî yan ez te!"

Min dît berê xwe da min û qet dey nekir. Ku min baş lê nerî: kuro manê (naxwe) ev ne yê duhî ye!.. Lê qet pêjnek jê nehat, bi rehetî rabû doxîna xwe girê da, pê li rikêbê na, xwe avêt ser zîna li ser pişta hesp û bi rê ket. Min da pey: "Kuro tu kî yî?" Dîsan her guh neda min û çû. Êdî wisan qehirîm ku hema dê ji kerban biteqîma. Lê xurrîm: "Kuro! Yan tişt û mişt û mehîna xwe bi cî bihêle û here yan jî tu dê min bikujî yan ez te!"

Awirek da min û got: "Kuro, here ser rêya xwe, ez ne hevtayê te me. Heke mêranî di te de hebe, min mijûl û matil nakî!" Gotinên wî ji min re seyr bûn çiku wek ji zarokekî re bipeyive wisan got. Min gotê: "Kuro, ev tu çi dibêjî? Yan ez ê xwîna te birijim yan tu ya min. Ma tu li gel kê diaxivî? Bizane ku ez Tekş im, Tekş."

Hema ku min wiha got, min tew dît ku rima wî li ser singê min e. Got: "Va min tu kuştî yan na?.. De here rêka min berde û zêdetir min gîro û mijûl neke." Rima xwe ji ser singê min rakir û dest bi çûnê kir!

Ku min ev yek dît, ez qehirîm ji ber ku ew bi vî awayî rikeberî min rabûbû. Min ji xwe re got: hey tu nemînî, Tekş, heyf li te û xîreta te! Ev tu li kû yî, ma tu razayî? Dîsan min xwe paşve lê neda û ketim pey û min hê jî xwe bi şêraniyê anî der. Min bang kirê: "Kuro, wek mêran were meydanê. Madem wiha bû, yan tu dê min bikujî yan ez te." Guhê min lê bû ku got: "Kuro, tu li xwînê digerî, malkembax! Ez talûke me, çima beriya min bernadî?" Ta min dest bir şûrê xwe, min hind dît ku pelamarî min kir û ez ji ser mehînê xistim erdê û rima xwe da ser singê min û xencereya xwe da bi stoyê re û got: "Min tu kuştî yan na? De here beriya min berde." Rabû siwar bû û dîsan ket ser rêya xwe. Ku min ev dît, êdî ti tişt ji min nehat. Min xwe avêt hefsarê mehîna wî û got: "Ya te li min kir, hê kesî li min nekiriye. Ji min re bêje tu kî? Û tu kû ve jî biçî, ez bi te re me!" Serê xwe hejand û got: "Tu dîn bûyî! Hefsar berde; talûke me." Min got: "Nabe, yan kuştin yan hatina li gel te."

Vêca got: "Bira, ez ê biçim nav deryaya xwînê! Ew cî ne ciyê yên wek te ye." Min gotê: "Xwe mijûl neke, ez ji te venabim, dê bi te re bim." Ku dît ti çare nîn e û ez ji dû wî venabim, got: "Hefsarî berde, siwar be û bikeve dû min." Bi rê ve hêdî-hêdî serpêhatiya xwe vegot:

"Ez Semsamê Sorsorî me. Min mamek heye, Cîhanbexş, li welatê Tergeverê ye. Wî keçek heye bi navê Gulendam. Ev heft sal in ku dilê min

û wê ketiye hev. Kes nema ku min nekir xwazgîn û cih nema neçûmê lê hê jî çareyek jê re nehatiye dîtin. Daxwaza mamê min next û qelenek pirr e lê ji min nayê. Ti rê di dest min de nemaye, vêca ez ê biçim wê birevînim!.. Vê jî ji te re bêjim: mamê min hoz û binemalek boş heye, herwiha heft kur jî. Te ez dîtim; her yek ji wan dê çar ên wek min bixin bin lepê xwe! Jixwe nav û dengê çelengî û fêrisiya mamê min jî li hemî deverê belav e. Wê yekê jî dizanim ku destê min lê ranabe lê neçar im ku her biçim. Ev serpêhatiya min e. Dîsan jî tika ji te dikim tu bi rêya xwe biçî, bila serê te jî di vê rê de neçe."

Ku min ev gotinên wî bihîstin, ji dil û derûn û hêz û taqet ketim û ecêbiyekê serê min girt! Min got: "Bira, ez bi te re me û ta serê min bi vê rê de neçûbe, ez te bernadim." Got: "De madem wisan e, yallah, em biçin lê divê ez çi bêjim tu wisan bikî."

* * *

Dazdeh roj û dazdeh şevan me bi çargavkî şeqand, êvara roja dazdehê em gihan ciyekî. Got em dabezin û em peya bûn. Mehînên me berdan nav wan mêrgan û hat tenişta min û got:

"Ho, ew konên ji dûr diyar mala mamê min in."

Bi rastî ku min dît, ta çav bisihirîne bêhejmar kon bûn. Got: "Ez ê biçim, vê spêdeyê min bi keçikê re jivan e, ew jî dê bêt û em ê bi elinda spêdeyê re bigihin vir. Heke hingê nehatim, bizane ku tiştek hatiye serê min. Êdî qet nesekine, siwarî hespê xwe bibe û yê min jî bibe û here. Ne ku bikeve serê te ku rabî bi van re şer an tiştekî bikî.

Tevî hemî wê zîrekî û çelengiya xwe jî, min dît ku ew gelek ditirsî, wisan diyar dibû ku mam û pismamên wî hê ji wî jî pirr bidestûdartir bûn. Herçi ez bûm, min bi temamî rengê xwe avêtibû. Rabû şûrê xwe kir kevanê, mertal xist navmilên xwe, rim xist destê xwe, xatir ji min xwest û

bi piyan bi rê ket. Min jî hesp anîn, kurtan jê kirin, êm û alif kirin, av dan û berdan wan çîmenan.

Du par ji şevê borîbûn-neborîbûn min hind dît ku ji dûr ve du tarmayî peyda bûn, bi leza ba dihatin. Pirr pê neçû, min dît Semsam e û jinek li gel e. Şev bû, min her hind dît ku jinek lihevhatî û berkeftî bû. Êdî em rûnenişt, ji min re got siwar be, bi xwe jî siwar bû û jin xist paş xwe, berê xwe da min û got:

"Em biçin. Ta niha dijmin tirs nexistiye min lê carinan li ser milê xwe li paş xwe binere. Heke te dît ku leşkerê hemî dinyayê civiye û daye pey me, qet guh nediyê û hespê xwe biajo her wek tiştek tine be û ji min re jî nebêje lê eger te dît heşt siwar tên, ji min re bêje: êdî xelasbûn nîn e!!!"

Vêca me qamçî li hespan veweşandin û em çûn. Cevêca çi çûnek bû! Ba û bahoz jî nedigiha me. Carinan min awirek dida paş xwe û wisan em çûn ta berbang û gizingê lê da û dinya bi tevayî ron bû û hingê min carekê çavek li jinê gerand û min dît ku keçek derdorî 18 salan e, dikarî ne bixwî û ne jî bikî lê tenê li gerdena wê binerî, bejnûbalek dirêj û xweşik hebû, sor û spî, çavên wê mîna mercanan, gep û alekên wê wek sêvên Serdeştê. Pirça serê wê şibî davên reş ên hevrîşmî û armûşî belavî sermilên wê dibû û dadiket navtengê. Vêca çi navteng bû? Te digot qey gerdena ask û xezalan e! Bi rastî jî Gulendam gulendam bû. Gulendam hejî hindê bû ku wî Semsamî ser û canê xwe bo dikir gorî û qurban!

* * *

Roj hilhat û tav û tîrêjên xwe bi ser dinyayê de belav kirin û bi Gulendamê û pirrpirrokên kezî û biskên wê dest bi veşartokanê kir. Bûbû bernîvroya dereng dema ez li ser milê xwe zivirîm û min dît ku heşt siwar - yek li pêş û heft li paş - bi leza birûskan tên. Ku çavê min pê ket, min bangî Semsam kir ku va ye heşt siwar ketine pey me. Di cî de

Semsam mehîna xwe rawestand û ji min re got: "Êdî xelas!.. Tu vegere welatê xwe lê carinan min bîne bîra xwe!" Bi van gotinên wî dilê min bi wî şewitî, rondik û hêsir ji çavên min barîn. Ew ji mehîna xwe dabezî, hefsarê wê da dest Gulendamê û girî li gewriyê gotê: "Here lê siwar bibe û gerdena min aza ke û kû ve biçî, bi xêr biçî madem her mirada me bi hev hasil nebû!" Herduyan rondik werandin. Ji min re jî got: here li wê dera han raweste û temaşeyî vê pevçûn û milanê bike. Bi xwe jî li ser rê, destikê şûr di destî de, hemberî siwaran wek singekî sekinî!..

Gelek pê ve neçû, siwar gihan wir. Min dît ku yek rihdirêj e û heft xortên nûgihayî li pey wî ne, hemî jî nîşaneyên fêrisî û pelewaniyê li rûyê wan diyar e û agir ji wan dibare. Semsam ji min re got ku yê rîspî mamê wî ye û yên din jî dûndeya wî ne. Ew hatin hemberî Semsam rawestîn.

Yê rîspî got: "Semsam, te çima ev agir vêxist! Bo çi li nav hemî êl û eşîra Tergeverê te ez ji hîlak kirim!?" Semsam jî gotê: "Mamo, heft sal e rica û tika nema min nekir lê te dîsan jî Gulendam neda min daku ez bibim yê wê û ew ya min. Te em dan xatirê malê dinyayê. Niha jî tiştek nebûye, bêje "min da te" û ez tiştek din ji te naxwazim.

Mam awir da kurek xwe û gotê: "Ka here serê wî ji min re bîne!" Kur xwe wek kêçê tê werkir, ji mehîna xwe dabezî û şûr di destî hat hemberî Semsam rawestî. Semsam gotê: "Mamo, bo xatirê Xwedê, nebe sedema xwîndariyê di navbera me de, ji ya Şeytan were xwarê." Lê mam dîsan jî bangî kurik kir: "De ka serê wî ji min re bîne!"

Li wê meydanê ew herdu darterr, ku hê nû tamijî baxê jiyanê bûbûn, bi şûr û tîran pev çûn. Dema min dît, min got: wella Semsam rast digot dema ji min re diyar kir ku her kurmamek wî dikare çar ên wek wî bixe bin lepê xwe. Wisan bi lez bû pevçûna wan ku min nedizanî li liv û tevgerên kê ji wan binerim!

Bi wî awayî kurik xwe nêzî nîv seatê hemberî gurz û pelamarên Semsam ragirt. Lê dawiyê ku kurik dihat şûrê xwe li Semsam bixe, vî şûrê xwe veweşand sermilê wî û di perasûyê wî yê çepê re derkir! Kurik ket wir. Min êdî xwe ranegirt, rondik bi çavên min de hatin xwarê. Min hay jê bû ku Gulendam jî qorre-qorr digirî!..

Ku Cîhanbexş ew yek dît, berê xwe da yek din ji kurên xwe û gotê: "Ka here serê wî ji min re bîne!" Yek din êriş kirê. Semsam dîsan gazî kirê: "Mamo, bo xatirê Xwedê, bes e, bila êdî hew xwîn bi neheqî birije." Mam jî gazî kirê: "Qurban, hê hestiyê pişta te neşkestiye, niha ew jî dê bişkê. De tu bisekine, hê ev destpêk e!"

Semsam dijî wî jî şer kir û gelek pê neçû ku ew jî kuşt!.. Mam dîsan bang kir yek din ji kurên xwe: "Ka here serê wî ji min re bîne!" Ew jî hat meydanê û ew jî hat kuştin!

Wisan yek bi yek kurên xwe şandin û bi destê Semsam dan kuştin. Pirr seyr û sosret bû ku ev karesat û bela hemî qewimî lê gotinek tal ji devê yekî dernediket: vî her digot "mamo, bes e", yê dî digot "qurban, hê ev destpêk e"!!!

Vêca ku kes nema, min hind dît ku Cîhanbexş bi xwe rikêb li hespê xwe da û hat raberî Semsam dabezî û got: "Qurban, ta niha şer şerê kaviran bû, niha jî şer şereqoçana beranan e; tu bibîne mamê te dê çi li te bike!" Dîsan Semsam hewar kirê: "Mamo, bila bes be…" Mamo jî gotê: "Qurban, besa çi niha? Were meydanê, were!.."

Mam û biraza li wê deşteçolê, li raserî wan heft termên kuştî û xêrnedîtî, şûr û tîr li hev veweşandin!

Qurban, bawer bike heke bibêjim melekên esman bi çavên tijîrondik hatibûn temaşeyî wê karesatê, qet ne derew e, bawer bike! Ev kurê xort û ev kalepîr dihatin û diçûn û herdu jî ji şêrên birsî û tî dirindetir bûn.

Roj êdî li ber avabûnê bû, tavsork li rojavayê wenda dibû... Carekê Cîhanbexş nirrî: "Semsam, qurban, de êdî bes e! Şûrê xwe dane." Semsam jî got: "De mamo, tu jî bes bike, ez jî dibêjim bes e!" De vêca binere Feleka xayîn çi dike! Di dema wan şûrên xwe didanîn de, wan berê xwe neda serikê şûrên xwe û xwe jî neparast. Şûrê Semsam kete stoyê Cîhanbexş û serê wî jê firand! Yê Cîhanbexş jî stoyê serê Semsam ji leşê wî dûr avêt! Guhê min lê bû ku got: "Mamo, te qenc kir?" Yê mamo jî li aliyê din gotê: "Qurban, wiha baş e!"

* * *

Ku ti tişt nema, ancax komkujî û qelaçoya wan bi dawî hat. Neh term di nav xwîna xwe de digevizîn. Min dît ku Gulendamê desmala xwe deraniye û çavên xwe ziwa kirin, yek bi yek çavên wan girtin bê ku qet kinkinekê bike. Vêca çi ket serê min? Min ji xwe re got ku madem ev bela qewimî, bivê-nevê ev keç ji min re ma. Min berê xwe dayê û gotê: "Gulendam, te bi xwe dît ku çi qewimî û rû da. Niha digel min were em biçin. Diyar bû ku Xwedê ez bo te û tu bo min dayî!"

Ku min wiha got, min hew dît got: "Hay ji xwe hebe." Û min hind dît ku ez avêtime erdê û keçik li ser singê min çok daye û got: "Ha, çi dixwazî?" Min gotê bes e. Rabû û got:

"Bira! Ez ji van şêran im ên li vir ketin. Te bi xwe dît ka çawan bûn. Te dît bav û heft bira û dezgirê min Semsam li vir ketin. Ya ji te ve te ji xwe re hingivîn li nav çiya û keçek li nav kelex û miraran dîtiye. Ez ji te re bêjim: ti kesî ta niha pişta me - ne mêrên me û ne jî ya jinên me - nedaniye erdê. Ta niha ez bo Semsam bûm lê bavê min bo pare ev anî serê me! Ji niha pê ve ez bo axê me!"

Şûrê bavê xwe - yê Semsam pê hatibû kuştin - rakir, ta min gotê keçê dê çi bikî, li ser leşê Semsam da stoyê xwe û daweşî ser termê wî û bo hetahetayî bedena herduyan hev hemêz kir!

Êdî tenê ew di dest min de mabû ku li mehîna xwe siwar bûm û bê dest bikim tiştekî vegerîm ciyê xwe.

Niha jî ku ew bûyer têt bîra min, kela dilê min difûre û şirrik rondik ji çavên min dibarin.

Qurban, ma heke mamê Semsam pêşî ew next û qelen û şîrbayê zêde ji wî camêrî nexwesta, dê çima ev bela bihata serî!?

* * *

*- îlona 1946 -*

*ji soranî: 12/2002*

*Çapa orîjînal: "Le pênawî afreta!"*

## Li ser jiyanê

Xelîl Cibran

Jiyan di deryaya bêkesiyê de giravek e ku zinar hêvî, dar xewn, gul bêkesî û çem tînî ne.

Kesûkarên min, jiyana we giravek e ku ji hemî girav û deverên din veqetayî ye. Ferq nake çend keştî ji beravên we diçin deverên din an çend tên beravên we, hûn her bitenê dimînin ji ber jan û bêriya bêkesiyê. Hûn xerîb in ji kesûkarên xwe û dûr in ji dilsoziya wan.

Bira, min dîtiye tu li ser koma zêrên xwe rûniştî yî û ji dewlemendiya xwe kêfxweş î - bi gencîne û xezîneyên xwe serbilind î û bawer dikî ku lepa zêr xirxalek nepenî ye ya hêvî û ramanên te û xelkê digihîne hev.

Min tu bi çavên xwe dîtî ku tu pêşengiya leşker û artêşa xwe dikî û armanca te hilweşandina kel û asêgehên dijminên te ye. Lê ku min dîsan carek dî lê nerî, min tenê dilek bêxwedî li paş sendoqên zêr cemidî, di rekehek zêrîn a firindeyek tî de dît û di vê rekehê de tenê amanek avê yê vale min dît.

Bira, min dîtiye tu li ser tac û textê şan û şerefê rûniştî yî û gel li derdorî te ye û pesna mezinahiya te, gernasiya te û hişmendiya te dide û li te dinere û mîna ku pêxember bî coşiya giyanê wan hildikeve ber perrên esmanan.

Û dema te li bindarên xwe dinerî, min dît ku ji rûyê te bextiyarî, hêz û coşa serkeftinê dixwiya goya ku tu giyanê wan î.

Lê bibîne, ku min carek din tu dîtî, min dît ku tu bêxwedî li rex textê xwe yî, mîna sergumkiriyekî yê destê xwe bilind dike û ji sawêr û tarmayiyên

nepenî lava û liyanan dike û bexşandin û dostaniyê hêvî dike - tika dike banek hebe bila bêserûber jî be lê tenê germî û dostanî hebe.

Bira, min dîtiye ku te ji jinek bedew û delal hez kiriye û dilê xwe raspartiye delaliya wê. Dema min dît ku ew bi dilnermî û evînek dayikane li te dinere, min ji xwe re got: Her bijî Evîn ya dawî li bêkesiya vî camêrî aniye û dilê wî gihandiye dilê yên din.

Lê ku min dîsan lê nerî, min di dilê evîndar de dilek dî yê bêkes dît ku bi giriyê xwe bêencam tê dikoşe ji keçikê re nehîniyên dilê xwe derbibe; û di giyana te ya bi evînê xemldayî de min hê giyanek din a bêkes dît ku mîna ewrên livok bû û bîlasebeb hêvî dikir bikare xwe bike xunav û rondik di çavên dildara te de.

Bira, jiyana te jîngehek bi tenê ye, veqetayî ji yên xelkê. Ew xaniyek e ku çavê ti cîranan nakeve hindirî. Heke ew di nav tarîtiyê de ba, lampeya cîranê te dê nikariya wê ron bike. Heke qûtê pêdivî tine ba, te dê neşiyaba wî ji embara cîranan dagirî. Heke ew li beyaristanekê ba, te nedikarî wî raguhezînî gulistanekê ya bi destên xelkê hatiye çandin û têwerdan. Heke ew li gupika çiyayekî ba, te dê nikariya wê bînî geliyekî piyên xelkê dewisandî.

Bira, tenêtî beşek ji jiyana te ye, û heke ev tenêtî û veqetayîtî tine bûye, tu dê ne *tu* û ez dê ne *ez* bam. Eger ew neban, dema min dengê te dibihîst, min ê belkî bigota ev dengê min e; yan dema min rûyê te bidîta, min ê bawer bikira ku ez di neynik û awêneyê re xwe dibînim.

---

Ji pirtûka Xelîl Cibran *Dengê Mamoste (Voice of the Master)* hatiye wergirtin û wergerandin.

## Rojnivîska Mirovê Nepêwîst

Îvan Turgenev (1818-1883)

GUNDÊ OVEÇYÎ VODÎ
ROJA 20. ADARÊ 18..

Bijîşk aniha ji cem min derket. Dawiya dawîn tiştek ji min re zelal bû! Piştî ku têr xwe ragirt û gîro kir, dîsan jî nikarî rastiyê nebêje. Belê, ez ê di nêz de bimirim, pirr di nêz de. Çem û robar ji qeşa û qeriseyan azad û rizgar dibin û diyar e ku ez ê jî bi berfên dawîn re biherikim û biçim. Kû de? Xwedê dizane! Herwiha deryayê jî. Lê ma çi ye! Heke divê mirov her bimire, hema bila li biharê bimire. Lê ma ne tiştek entîke û tinazî û kenawer e ku mirov belkî du hefteyan berî mirina xwe dest bi nivîsîna rojnivîskê bike? Lê bi rastî ma çima entîke û tinazî be? Ma çima çardeh roj ji çardeh salan an çardeh sedsalan kêmtir giring bin? Tê gotin ku li ber herherî û ebediyê her tişt ne ti tişt e lê jixwe hingê ebedî bi xwe jî ne ti tişt e. Min hay jê heye ku radestî zimandirêjiyê dibim - ma ez ditirsim? Baştir e ku tiştekî bibêjim. Li derve şil û ba ye, û li min hatiye qedexekirin ku derbikevim. Gelo ez çi bibêjim? Mirovên xweragir û maqûl basa nesaxiyên xwe nakin; herçi lihevanîna çîrokan e jî, ne karê min e, ne wisan; min şiyan û taqeta bîr û ramanên berz û bala jî nîn in; salixdana derdora min jî bala min nakişîne û min nacoşîne. Lê ne xweş e ku betal bim, dilê min naçe xwendinê jî. Ma gelo dê çawan be heke ez çîroka jiyana xwe ji xwe re bibêjim! Gelekî baş e! Ji berî mirinê ew gelekî li cî ye û bawer nakim ku kesekî bixeyidîne û sil bike jî. Loma ez ê dest pê bikim.

Derdorî sî sal berî niha ez li malbatek têra xwe zengîn û dewlemend a xwedîerd hatim dinyayê. Bavê min dildarî qumarlîstinê bû. Diya min jinek xwedî rewş û rewişt bû, jinek bi rastî qenc bû. Min jinek din nas nekiriye ya ku bi qasî wê qencîkirinê jê re kêfxweşî û dilşadî anîbe. Ew di

bin barê qencbûna xwe de dinalî û, ji xwe dest pê bike, her kes bi wî barê xwe diêşand. Di jiyana xwe ya pêncî salan de ew bîskekê jî nedisekinî, bêhna xwe venedikir, hertim mijûl û destbişol bû mîna mêrî û gêrikan - lê berevajî wan, wê tiştek bisûde û mifadar bi dest nedixist. Kirmê di wê de bi şev û roj ew rehet nedihişt. Tenê carekê min ew rehet û aram dît, ew jî roja piştî mirina wê bû, di tabûtê de. Lê dema min lê nerî, min hest pê kir ku ji rûyê wê matmanek dixwiya; lêvên nîvvekirî, gep û alekên dewisî û çavên nerm î bêliv wiha digotin: "Ax, çendî xweş e ku mirov bêliv paldayî be!" Belê, baş e, erê baş e ku mirov dawiya dawîn ji hesta hebûna nearam xelas bibe! Lê jixwe niha pirs ne li ser wê yekê ye.

Zarokiya min reş û tarî bû. Diya min û bavê min herduyan ji min hez dikir lê wê yekê jî rewşa min sivik nedikir. Bavo di mala xwe de ne xwedî ti hêz bû û wek mirov jî bêwate bû çimkî wî bi aşkerayî xwe radestî qumara şerm û ya mirov diruxîne dikir. Wî îtîraf bi wê xerabiya xwe dikir lê nedikarî dev ji wê mijûliya xwe xweşdivî berbide loma wî bi sernermî û serşorrî dixwest li malê bêdeng be daku hêjayî jina xwe ya nimûne be. Dayika delal jî barê bextreşiya xwe hildigirt û gelekî bêhnfireh bû û ev bêhnfirehiya wê jî bi pozbilindiyê dagirtî bû. Wê ti carî mêrê xwe lome nedikir, bê gotinekê jî bibêje wê pareyên xwe yên heyî jî didan wî û deynên wî eda dikirin; bavo jî hem li nik dayikê û hem jî li pişt guhê wê pirr pesnê wê dida lê sebirê wî li malê nedihat, û hema nêzî min jî nedibû, mîna bawer bike ku dê min jî wek xwe biherimîne. Lê ji dirûvên rûyê wî yên xwarbûyî qencîxwaziyek wisan radifûrî, kenê wî yê germ î nearam wisan diguherî bişirînek bibandor, ji çavên qehweyî yên bi qirmiçokên delal dorgirtî evîn û hezkirinek wisan ditîrêjî ku neçar dimam gep û alekên xwe pal bidim gep û alekên wî yên bi rondik û hêsir û firmêskan şil- û germbûyî. Min ew rondik bi desmala xwe paqij kirin lê dîsan ew diherikîn, mîna av ji şûşeyek zêde dagirtî. Min dest bi girînê dikir û wî ez aşt dikirim, pişta min diperixand, bi lêvên xwe yên recifok rûyê min dimaçand. Zêdeyî bîst salan di ser mirina wî re derbas bûne lê hê niha jî

dema bavê min ê reben tê bîra min, kinekinên girîn di gewriya min re dixetimin û dilê min hindî bi tirş û tehlî lê dide û şewatek tijîjan wî diperritîne, mîna ku dibê qey ew dê hê gelekî sax bimîne û bikare bişewite!

Herçi diya min bû, wê herdem bi heman awayî li min dinerî, bi xweşmirovî lê ne bi nermî. Di pirtûkên zarokan de gelek dayikên mîna wê hene, biexlaq û dadperwer. Wê ji min hez dikir lê min ji wê hez nedikir. Belê, tam wisan! Dayika min a qenc ji min re xerîb bû û min bi coşî ji bavê xwe yê gunehkar hez dikir.

Lê êdî bo îro bes e. Min dest pê kiriye û êdî ez ji dawiyê natirsim, çawan jî be. Nesaxiya min dê wê bi cî bîne.

ROJA 21. ADARÊ

Îro hewa gelekî xweş e. Germ û sayî ye; tîrêjên rojê li berfa helbar yarî û tinaziyan dilîzin; her tişt dibiriqe, dibe hilm û bixar û dilopan dike; mîna dînan çîveçîva çûçikan e li ber tan û çeperên rengtarî yî hesû; hewayê şil bi şirînî û tirsnakî dilê min nearam dike. Bihar tê, bihar e! Li ber pencereyê rûniştî me û di ser robar re li zeviyê dinerim. Ax sirûşt, ey xweza! Çendî ji te hez dikim lê di kûriya xwe de min diyar kiriye ku ez nikarim hema bijîm jî. Binere, ew nêrçivîkê han çawa çengvekirî xwe hildiavêje; ew dihîqhîqe û her dengek jê derdikeve, her pûrtikek di laşê wî re hêz û şiyan, saxlemî û cançakî ye...

Ev dê bibe çi? Dê nebe ti tiştek. Ew saxlem e û mafê wî heye ji xwe re bistre û bipirrpirre; herçi ez im, ez nesax im û divê ez bimirim û hew. Bêsûde ye ku em zêde wê mijarê bidomînin. Û rondik û hêsirên ji sirûşt û xwezayê re diwerînim jî dûrî aqil in. Ka em li çîrokê bi xwe vebigerin.

Wek ku min got, zaroktiya min nexweşî û bêkêfî bû. Min ne xwişk û ne bira hebûn. Ez li malê hatim mezinkirin. Belê, ma diya min dê xwe bi çi mijûl bikira heke ez bihatima şandin fêrgehek lêrazanî yan jî xwendegehek dewletê? Jixwe zarok bo hindê ne ku sebirê dêbavan bi wan bê. Bi pirranî em li gund dijiyan, carinan em diçûn Moskovayê. Erê min mamosteya xwe ya navmalî hebû. Ji mamosteyên navmalî bi taybetî Rickmannek elman tê bîra min: vemirî, kizgiryok, pirrî kovandar, afirandiyek felekê-jê-standî ku bi êşek bêderman a xerîbiyê û bêrîkirina welatê xwe yê dûr ketibû. Carinan li ber sope û argûnê, li ciyê teng û fetisek, ku mirov ji ber bêhna tirş a bîreya kevn jê sereder nedibû, çavdêr û matîjêkerê min Mam Vasîlî, bi bernavê xwe Makeqaz, rî netiraşî, qazaxek perritî li ber, rûdinişt. Wî bi kaxezan îskambîl dilîst li gel Potapkuskînê cara pêşîn kurkek sîsspî yê ji postê mihan li xwe kirî û li piyan jî gîzmeyên req î dondayî. Ji pişt dîwar Rickmann distrî:

Herz, mein Herz, warum so traurig?
Was bekummert dich so sehr?
S'ist ja schön im fremden Lande
Herz, mein Herz, was willst du mehr?[1]

Piştî mirina bavê min em bi berdewamî li Moskovayê akincî û bi cî bûn. Hingê ez dazdehsalî bûm. Bavê min bi êşa şelal û felcê şevekê mir. Ew şev ticarî ji bîra min naçe. Ez ketibûm xewek giran wek hemî zarokan lê ta di xewê de jî dengek dihat min. Tavil pê hesîm ku kesekî di çingilê min re girtiye û min radike. Min çavên xwe vekirin, Vasîlî li ber sîngê min rawestibû.

---

[1] *1. Stran bi elmanî ye. Kurdiya wê:*

Dilo, dilê mino, çima bikovan î?
Çi ye wisan te xemgîn dike?
Jixwe ev welatê xerîb bedew e.
Dilo, dilê mino, hê tu çi dixwazî?

- Çi ye?

- Rabe ser xwe, de rabe. Aleksey Mîxaîlîç li ber mirinê ye…

Min mîna şêtan xwe ji nav nivînan hilavêt û bizirîm wir, odeya nivistinê. Bavê min ser ber bi paşve girêl paldayî bû, rûyê wî sor bûbû û bi jan dinalî. Girseya mirovan li ber derî civîbû û tirsayî dixwiya. Dengek ketî li bersifkê pirsî:

- Kesek çûye pey doktor?

Hesp ji govê hat deranîn, çîrrînek ji derî hat, çiraya gov û axurê di odeyê ve li erdê dişewitî; diya min bi temamî şkestibû û digirî lê bê ku maqûliya xwe ji dest bide. Min xwe avêt bersîngê bavo, ew hemêzand û got:

- Bavo delal, bavo delal…

Ew bêliv paldayî bû û bi awayek sosret çavên xwe diteyisandin. Min berê xwe da rûyê wî - tirsek bêçare ez girtim; ji tirsan min, mîna firindeyên bi zorê hatine girtin, dest bi çîpeçîpekê kir. Hê duhêvarê bû ku bavo ez hemêzandibûm bi coşî lê herwiha bi dilek bêkêf, her mîna bizane ku mirina wî nêz bûye.

Bijîşkek xewto, şerpeze û ji bêhna meyê fistewî hat hindir. Dema camêrî bi kêr û çeqokên xwe yên emeliyatê mijûl bû, bavo mir, û roja din, ez, bi kul û xeman aqilsivik bûyî, findek di dest min de li ber maseyê rawestî bûm û bê tiştekî bifikirim min guhdarî nehwirandina strana dengnizm a berdestkê qeşe dikir a ku her carinan bi dengê lawaz ê qeşe dihat sekinandin; carinan rondik bi gep û alekên min de diherikîn ser pistok û bersîngokên min; kêm mabû ku ez ê bifetisîma, min bê navbirr li rûyê bêliv ê bavo dinerî, mîna ku ji wî bendewarî tiştekî bim; dayika min li ser çokan lava û dia dikirin û xwe ta erdê diçemand û tewand; carinan serê xwe hêdîka radikir û dema şanexaç dikirin, tilên xwe şidandî datanîn ser

eniyê, milan û zik. Tenê fikirek jî di serê min de tine bû, madê min mîna risas giran bû lê min hest pê dikir ku tiştek erjeng û pirr xerab li min diqewime... Hê hingê Mirinê li rûyê min nerî û ez nîşan kirim.

ROJA 22. ADARÊ

Îro dîsan sar û ewrîn e. Ev hewa ji min re çêtir e. Ew baştir li karê min tê. Do bêsebeb komek hest û bîranînên bêwec hatin bîra min. Rijandina hestan jî mîna qurmikê giyayê lakrîç e: pêşî ku ew tê cûn, qet ne xerab e lê paşî tam û çêjek bêyom nexweş dikeve devê mirov. Ez ê dest pê bikim jiyana xwe bi şêwazek sade û aram bibêjim.

Ango me bar kir Moskovayê.

Lê aniha ket serê min ku ma çima çîrokjiyana xwe vebibêjim.

Na, qet nabe... Jiyana min bi ti awayî ji jiyana bêhejmar kesên din ne cuda ye. Mmala dêbavan, zanko, xizmetkarî di karmendiyên asayî de, veqetîna ji karmendiyê, çend kesûkar û dost û nas, hejariyek maqûl, kêfên bê mezinatî, mijûliyên bê heytûbeyt, armanc û hêviyên nebilindfirrm ka fermûn bibêjin ma jiyana kê ne wiha ye. Jixwe ez naxwazim çîroka jiyana xwe vebibêjim çimkî ez pirrtir bo xweşiya xwe dinivîsim; û madem serpêhatiyên min ne ti şadiyê û ne jî xemgîniyê didin min, di wan de ti tiştek nirxdar û hejî agadariyê nîn e. Baştir e ji xwe re rewişt û siriştê xwe ravebikim.

Ez mirovek çawan im? Hûn ê bibêjin: kesek tiştek wisan napirse; rast e. Lê nê (nexwe) ez ê bimirim, bi rastî ez ê bimirim, û diyar e li pêşberî mirinê dê li min bê borîn heke bixwazim bizanim ka ez çi tov teyr im.

Piştî ku min ev pirsa giring ji bingeh ve vekolî û li ser têr ponijîm û bê ti pêdivîtî û pêwîstiyekê ku silbûn û xeyidîna xwe wek wan kesan diyar bikim ên bi tundî bawer piştrast û dilniya ne ji çelengî û fêrisiya xwe, divê ez tiştekî bidim zanîn: ez mirovek bi temamî nepêwîst û nepêdivî me di vê dinyayê de yan jî baştir e bibêjim ku teyrek tam nepêwîst im. Û sibê ez ê bipeyitînimm û îsbat bikim ka çima çimkî îro ji ber persîv û sermayê ez mîna mihan difirrfirrim û sereguhdara min a bermalî, Terentyevna, bela xwe ji min venake:

- Xwe pal de, ezbenî, û têr çayê vexwe...

Dizanim ew çima min aciz dike: dilê wê bi xwe diçe çayê. Çima na? De bila! Ma çima nehêlim rebenê çi jê tê ji min bistîne li van bîskên dawiyê? Hindî ku dem maye.

ROJA 23. ADARÊ

Dîsan zivistan e. Berf gir dibare.

Nepêwîst, nepêdivî... Ax ew çi peyvek xweş e. Çend kûrtir li xwe vedikolim, hind baştir wateya vê peyvê fam dikim. Nepêwîst - belê, nepêwîst. Mirov nikare wê peyvê bo kesên din bi kar bîne. Mirov dikarin xerab bin, qenc bin, jîr bin, mejîreş bin, dilhebîn an dilreş bin lê ticarî nikarin nepêwîst bin... Bi gotinek din, tê bikoşin ji min fam bikin, dinya dikare bê wan mirovan jî hebe lê bêkêrî ne taybetmendiya wan a serekî ye, ne nîşaneya wan a herî berçav e û dema em basa wan dikin, serê pêşîn peyva "nepêwîst" nayê ser devê me. Lê ez... bo min tiştek din nikare bê gotin: ez nepêwîst im - û hew. Mirovek zêde me - û bes. Diyar e sirişt û xweristê hesaba hindê nekiribû ku ez dê peyda bibim lew ez mîna mêvanek venexwendî û dawetnekirî pêşwaz kirim. Ez dê bi rehetî basa xwe bikim bê ti core tehliyê... Ji xwe hertişt qewimiye û derbas bûye! Di

hemî jiyana xwe de min dîtiye ku ciyê ez dixwazim girtî ye. Belkî ji ber ku ciyê ez lê digerim ne ew bûye yê ez lê digerîm.

Ez bişik, şermîn û enirî bûme mîna hemî nesax û nexweşan. Herwiha, dibe ji ber xweperestiya min a zêde be yan jî ji ber avaniya giyana min a biserneketî bi giştî bem di navbera hest û ramanên min de - û di navbera derbirina wan hest û ramanan de - astengek bêhûde, bêçare û dûraqilane hebûye. Û çi gava min xwestiye wê astengê ji rêya xwe vebidim, wê girêkê vebikim, dest û lepên min, dêm û rûyê min û hemî hebûna min ketine kelecaniyê û ez ne tenê nesiriştî û nexweristî xwiyabûme ku lê di rastiyê de jî nesiriştî û nexweristî bûme. Min bi xwe hest bi vê kelecaniyê kiriye û dîsan min xwe vekişandiye nav xwe. Û hingê di min de lehiyên nearamî û bêhedaniyê dest pê kirine. Min her tişta xwe ferisandiye û ji xwe re şirove kiriye, xwe û kesên din dane ber hev û miqayese kirine, min anîne bîra xwe aiwr, ken û girnij û peyv û gotinên wan mirovan ên ez li pêşberî wan tê koşîme bi ser xwe ve bêm, min hertişt wek kembax be hesibandiye, bi armanca xwe ya "mîna her kesek din be" kenîme - û di cî de, di nav ken re, ketime nav gola xeman, noqî kul û derdan bûme û dîsan min ji serî ve dest pê kiriye. Bi kurtî: jiyana min mîna çember û xirrxalekî bûye. Şev û roj min bi van pûnijên bijan lê bêber ve borandine. Kê bibêjin, ji qenciya xwe, ka ji min re bibêjin, ma mirovek wiha bo kê yan bo çi mifadar û bisûde ye? Mirovek wiha kêrî çi tê? Çima ev tê serê min, bo çi ez serê xwe dixwim û xwe dikirrînim, kî dizane? Kî heye ji min re bibêje?

## Çend gul ji Gulistanê

Se'diyê Şîrazî

(derketina pirtûkê: sala 656 koçî / 1258 zayînî)

*"Ne pêdivî ye ticaran guh bibihîze*
*dengê tembûrê, sentûrê û bilûrê.*
*Ne lazim e çav baxçeyan bibînin*
*û poz binase bîna sorgul û nêrgizan.*
*Heke balguhê pûrtik tine be,*
*mirov dikare li ser kevir jî serê xwe deyne,*
*û heke evîndar jî ne li ber be,*
*dikare destê xwe di hemêza xwe de bigire*
*lê ev zikê bêxêr, zikê hîlebaz*
*nikare xwe bigire heke neyê dagirtin."*
ji pirtûka 'Gulistan'

**I**

**6**. Tê gotin keyek faris hebû ku wisan bindarên xwe dişelandin û zordarî li mirovan dikir ku gel ji ber kirinên wî ji welatê xwe direvî û ji tengezariya ji ber hukumeta wî ya hov derdiket. Dema hejmara bindaran kêm bû, dahatinên dewletê jî kêm bûn û gefên dijminan jî li ser serê wî xurt bûn.

Yê li tengasiyan alîkaran bixwaze,
divê li rojên aramiyê merd be.
Heke tu ji xizmetkarê xwe re ne baş bî, ew ê biçe.
Xweşdost be, biyanî jî dê bibin xizmetkarên te.

Carekê, ku li eywana wî ji Şahnameyê çîroka dawîhatina li serdariya Duhak û tacgiriya Ferîdûn hat xwendin, wezîrekî ji padişah pirsî: "Çawan Ferîdûn, ê ne xwedî gencîneyan, ne maliyetê û ne jî xizmetkaran bû, karî bibe key?" Key bersiv da: "Wek bi xwe jî dizanî, gel bi coş xwe da alî wî û ew bi ser ket." "Wey padişahê min", wezîr got, "madem key pêdivîtî bi gel heye, tu çima gel belav dikî? Ma bi rastî jî tu keyîtiyê naxwazî?
Baştir e leşker bi xwîna dil bê têrkirin
çimkî siltan bi leşkerê xwe serdariyê dike.

Key pirsî: "De çawan mirov dikare gel û leşker bike piştgirê xwe?" Wezîr bersiv da: "Divê key merd be daku ew bibin alîgirên wî, û dilovan be daku ew hest pê bikin ku li keynişîna wî biewle ne lê mixabin te ti ji van herdu taybetmendiyan nîn in."

Ne zordar dikare bibe siltan,
ne jî gur bibe şivan.
Key, ê bibe xerabîkar,
dara di bin lingê xwe ve dibire.

Ev şîreta baş ne bi dilê key bû loma ew enirî û wezîr avêt zindanê. Demek dirêj bi ser ve neborî, pismamên siltan serî hildan û mîrnişîna bavê wan berê bi rê ve birî xwest. Gel, ê perîşan bûbû û ji ber zordariyê bêzar mabû, xwe da gel wan û alîkariya wan kir û wiha wan karî key ji ser text biavêjin.

Heke serok zordariyê li binokên xwe bike,
di gavên dijwar de dostên wî jî dê bibin dijminên bihêz.
Ji gel re yar be, tu dê ji neyaran parastî bî
çimkî gel leşkerê padişahên dadperwer e.
**7**. Di keştiya keyekî de kurek kole yê faris hebû ku ne ti caran derya û ne jî dijwariyên rêvingiya deryayî dîtibûn. Ew digirî û gazin dikirin û bedena wî ji serî ta binî dilerizî. Tevî ew hat aştkirin jî, ew nehedinî û aram nebû

û wisan dikir ku bi tevgerên xwe rêvingiya padişah biherimîne lê ti kesekî nedizanî çi bike. Hingê fîlozofê di keştiyê de ji key re got: "Heke payeberziya we rê bide, ez ê lawik bêdeng bikim." Key bersiv da: "Ew yek dê pirr baş û xweşdostane be." Fîlozof ferman da ku kurik bê avêtin deryayê. Lawik du-sê caran xwe binav kir û bi herdu destan xwe bi dûmena keştiyê ve şidand. Ku rê jê re hat dan hilbikeve keştiyê, êdî rûnişt kuncikekî û bêdeng bû. Padişah mat ma û pirsî: "Ev çi aqildarî bû?" Fîlozof bersivand: "Pêşî wî nedizanî ka xeniqîn çi ye û ewledariya keştiyê fam nedikir. Tam wisan, di bihagiraniya saxlemiyê tenê ew digihin ên nesax bûne."

Tu yê ziktêr, dilê te naçe nanê cehî.
Evîndara min li gor te kirêt e.
Li ber dilê horiyên biheştê agirê pak jî dozeh e
lê ji nişteciyên dojehê bipirse, dê bibêjin ew biheşt e.

Cudatiyek mezin di navbera wan de heye
yê evîndar li ber dilî ye û yê çav li derî ye.

**8**. Ji Hormiz* hat pirsîn: "Çi kêmasî li wezîrên bavê te hebû ku te ferman da ew bên zindankirin?" Wî bersivand: "Min ti kêamsî li wan nedîtin lê min didît ku ew di dilê xwe de bêsinor ji min ditirsin û bi min ne bawer in. Tirsîm ku ew dê min biruxînin ji ber ku ditirsin wek din ew dê bi xwe bên ruxandin; û min jî wek gotina aqildaran kir:

Ey aqildaro, ji wî bitirse yê ji te ditirse
tevî tu bikarî di cengê de zora sed wek wî bibî jî.
Mar piyê şivan digezîne ji ber ku
ditirse ku şivan dê serê wî biperçiqîne.
Ma nizanî ku heke pisîk nikare bireve,
ew amade ye çavên piling derbîne?"

**9**. Keyek ereb ji pîriyê nesax bûbû û tam û çêja jiyanê ji dest dabû. Hingê siwarek hat hindir û peyama serkeftinê anî: "Me asêgehek ji we padişah re desteser kiriye: dijmin hatine girtin, û hemû navçe û leşkerê wê li bin fermanên we ne!" Key bi giranî axînek kişand û got: "Ev ne ji min re lê ji dijminên min re mizgînî ye" - armanc bi dijminan mîrasxwerên wî bû.

Ax, jiyana min bi wê hêviyê ve borî
ku rojekê hêviyên min bi cî bên.
Niha hêviyên min bi cî hatine lê feyde çi ye
çimkî hêvî nîn e ku jiyana derbasbûyî vebigere.

Destê felekê ji bo nîşana birêketinê li daholê dixist:

ax çavên min, xatir bixwazin ji serê min,
ax lepên min, zendên min û milên min,
xatir bixwazin ji hev.
Dijminê hêviyan ez girtime…
Hê carek din jî, ax hevalno, werin bal min!
Jiyana min bi nezaniyê borî:
li xwe ne hişyar bûm, lê hûn li xwe hişyar bin!

**10**. Ez li mizgefta navendî ya Şamê li ber gorra Yehya pêxember, silav lê bin, ketibûm nivêjan dema keyek ereb ê ji xerabiyên xwe naskirî hat pîrozgehê. Wî dua û lava kirin û alîkarî ji Yezdan xwest.

Feqîr û zengîn mehkûmên vê herriyê ne
û yên dewlemendtir in, zêdetir pêwîstî bi alîkariyê heye.

Dû re ew li min ziviri: "Derwêş bi coşiya dua û lavayên xwe û dilpakiya tevgerên xwe tên nasîn; ma tu nikarî bo min dua bikî çimkî ji dijminên xwe yên xerab ditirsim?" Min bersiva wî da: "Li bindarên xwe yên lawaz were rehmê, êdî ne lazim e tu ji dijminên xwe yên xurt bitirsî."

Ne durist e destên bêhêz ên hejaran
bi mist û zendên bihêz bên şkandin.
Ma ne ew, ê li ber ên belengaz nakeve,
ditirse ku heke bikeve, kes dê destê xwe neavêjiyê.
Yê tovê nerind biçîne lê bendewarî berhemek baş be,
bêaqil û xeyalpûç e.
Pembû ji guhên xwe derbîne û dadperweriyê li gel bike
çimkî heke tu nekî, dê carekê Roja Dadê bê.
Mirov endam û organên heman bedenê ne
çimkî ew ji eynî madeyê hatine afirandin.
Heke felek li organekê ji wan bê yemanê,
yên din jî nabînin aramî û hedanê.
Heke belayên bi serê mirovan tên ne xema te bin,
tu ne hêjayî navê mirovan î.

**11**. Derwêşek, ku duayên wî pirrî caran qebûl dibûn, hat Bexdayê, û basa wî ji fermangirê zordest Hecac ibn Yûsif re hat kirin. Wî bangî derwêş kir û got: "Ji min re tiştek baş dua bike!" Derwêş lava kir: "Xwedêyo, ruha vî bistîne!" "Wey Xwedê", Hecac ibn Yûsif qîrî, "ma duayên baş wiha ne?" Derwêş bersiv da: "Belê, hem bo te û hem jî bo hemû misilmanan."

Ax hêzdaro, yê tu zorê li bindarên xwe dikî,
ma ta kengî ev bazar biwec e?
Ma serokatiya dinyayê dê çi sûdeyê bigihîne te;
xwezî tu bimirî û zordariyê li mirovan nekî.

**12**. Keyek dilxerab ji zelamek bawermend pirsî: "Mirov dikare çawan herî baş îbadet bo Xwedê bike?" Zelam bersiv da: "Herî baş tu dikarî wisan îbadet bo Wî bikî ku nîvî rojê rabikevî û binivî daku hema bîskekê gel bikare rehet bijî."

Min dît xerabîkerek nîvî roja xwe dinivî
û min got: "Çêtir e ku ev bela binive".
Yê razayî û nivistî zêdetir qenciyê dike ji dema şiyar,
baştir e bimire, ne jiyana xwe ya xerab bidomîne.

---------------------

**IV**

**5**. Galenos dît ku aqilsivikekî di patika zanayekî re girtibû û gotinên pîs lê dibarandin. Galenos got: "Ew ê zana jî bêaqil e, wek din ew ê neketaya wê rewşê."

Di navbera du hişmendan de nîqaş û şerrenîx dernakeve
û yê fehma be jî bi yê mejîreş re gengeşiyê nake.
Heke yê bêaqil di bêerziya xwe de zimanek hişk bi kar bîne jî,
yê aqildar be dê wî bi dilnermiyê bihedinîne.
Du mirovên jîr bin, deziyek jî dê di navbera wan de saxlem be,
di navbera yek sernerm û yek serhişk de jî dê wisan be.
Lê ku herdu alî mejîhişk bin,
zincîra asinî jî dê di navbera wan de bişkê.
Zelamek nebaş radayî kesek heqaret kir,
yê heqaret lê hatî kir bi baldirêjî got: "Ey mêrê çak,
tu çi bibêjî jî, ez hê xerabtir im
çimkî ez bi xwe kêmasiyên xwe ji te baştir dizanim."

**V**

**19**. Keyek ereb çîroka Leyl û Mecnûn bihîst: ka çawan Mecnûn têk çûbû û tevî hemû jêhatîbûn û peyvbedewiya xwe bi çolê ketibû û hefsarên hiş û aqil ji dest xwe berdabûn. Key ferman da ku Mecnûn bînin pêşberî wî û lome li Mecnûn kirin: "Ma bi te çi kêmasî di ceweriya mirovan de heye? Çima te xwe elimandiye edetên heywanan û hizûra mirovan terk kiriye?"

Mecnûn bersiv da:

*"Gelek heval û hogiran ji ber evîna min ez lome kirime*
*lê heke wan Leyl bidîtaya, ew ê di rewşa min bigihana."*

Xwezî wan, ên min tawanbar dikin,
rûyê te bidîta, ey yara dilperitîn,
daku wan bi dîtina te
destê xwe li şûna pirteqalan bibirriya *
daku rastî diyar bibe: "*ev e tişta hûn ji ber wê min lome dikin.*" *

Key xwest Leylê bibîne daku bizane ka çi bedewî ye ku bûye sedema vê tevliheviya giyanî. Wî mirûdên xwe şandin nav hoz û eşîrên ereban daku li Leylê bigerin û wê bînin baxçeyê eywana key. Wan Leyl anî. Key li Leylê nerî û dît ku ew keçek zimanreş û kêmbiha ye û ew qet ne bi dilê key bû çimkî keça herî kêm jî ya harema wî di bedewî û dilhebîniya xwe de di ser Leylê re bû. Mecnûn tê giha ka çi di dilê key de bû loma lezand û got: "Divê di çavên Mecnûn re li derdirûvên Leylê bê nerîn daku bedewiya wê ji temaşevan re xwiya bibe."

*Heke kevokên daristana pîroz ew nalînên evîndarî,*
*yên min bihîstin, bibihîstana, ew ê jî bi min re bigirîna.*
*Ey hevalno, ji yê sax re bibêjin, ew nikare bizane*
*ka çi di dilê kovandarê evînê de ye.*

Naxwazim basa jana xwe ji saxan re bikim
lê tenê ji gorî û qurbanên heman êşê re.
Jixwe ye basa stêng û zirkêtkan ji wan re bikî
yê stêng û zirkêtkan pê venedabe.
Ta tu jî nekevî derdê min,
jana min ji te re tenê wek çîrokek kevn e.
Nabe derdê min û derdê kesek din bên berhevdan:

ya wî xwê li kefa destî ye, ya min xwê li ser birînê ye.

**21**. Xortek, ji dil û canê xwe pak û bijûn,

bi evîndara xwe ya bedew re di belemeyekê de bû.

Min xwendiye ku ew ji belemeyê ketin avê.

Dema belemevan destê xwe da yê xort

daku wî xelas bike û nehêle bimire,

yê xort li ber pêl û fûran bangî wî kir:

"Min bihêle û evîndara min xelas bike!"

Dema wî wiha got, dinya li ber şêlî bû

û hat bihîst ku wî wiha got:

"Guh nede gotinên wî bêkêrî

yê di gava pêdivî de li hevalê xwe xwedî dernakeve."

A wiha ne yên bi rastî evîndar;

guh bide vê çîroka rast daku jê fêr bibî

çimkî çawan bexdadî erebiya xwe dizanin,

wisan Se'dî jî rê û rêçik evînê dinase.

Heke te evîndarek hebe, dilê xwe bide wê

û guh nede gotinên xelkê!

Heke Mecnûnê Leylê jî vebijiya,

wî jî dê ji vê pirtûkê çîrokên evînî bixwendana.

## VI

**2**. Kalepîrekî bas kir ku bi keçek ciwan re zewiciye. Mêrik mala xwe bi gulan xemilandibû û bi keçikê re rûdinişt û dilê xwe û çavên xwe gorî û qurbanî wê kiribûn. Bi şev û roj xew bi çavên wî nediket hindî ji wê re diaxivî û henek digotin daku keçik wî binase û jê netirse. şevekê wî gotibû: "şensê te baş e û felek li te bişiriye û bişkuriye ku kalepîrek bûye nesîbê te ku têgihiştî, dinyadîtî û aram e û tamî sarmayê û germiyê kiriye û hem qencî û hem jî xerabî dîtiye. Loma ew dizane ka bihevrejîn çawan e û dizane daxwazên evînê bi cî bîne. Ew dilovan û birehm e, camêr û zimanxweş e.

Tenê ku bikarim, ez ê bikevim dilê te,
û heke min bixeyidînî jî, ez ê dilê te nehêlim.
Heke wek papaxan bixwazî tenê şirîniyan bixwî,
ez ê giyana xwe ya hingivînî jî bikim xwarin ji bo te.

Tu neketî destê xortek sosret, bêhiş û sozsivik ku herdem dil li kesek din e, her şevek xwe li derekê diborîne û her gavekê ji kesekê hez dike.

Ne bendewarî sadiqiya bilbil be
çimkî ew hertim difirre ser gulek nû

berevajî kalepîr ê bi hişmendî û û aqildarî, ne bi qoçên dij-aqil ên xortaniyê, tev digere.

Dostek ji xwe baştir bibîne û ji dest nede
çimkî bi yek mîna xwe re jiyana te dê vala derbas bibe."

Yê kalepîr got: "Min gelek gotinên wiha jê re gotibûn û bawer dikir ku min dilê bijandiye xwe û ew kiriye nêçîra xwe lê wê axînek têrjan kişand û got: "Hemû gotinên te di mêzîn û teraziyê de ji vê gotina diya min siviktir in: 'Ji keçan re tîr jî ji kalepîran baştir in'."

*Dema keçikê tiştek nermîçok*
*yê mîna lêva jêrîn a rojîgir şorrbûyî û daketî*
*dît, wê got: "ez rebenê mirime û efsûne*
*tenê kêrî yên raketî û nivistî tên!"*

Mala jin ne razîkirî ji ber mêrê xwe radibe
tijî gengeşe û şerrenîxa hertimî ye.
Heke kalepîr bi xwe tenê bi gopal bikare rabibe,
dê çawan gopalê wî bi xwe rabibe?

Bi kurtî, lihevhatin di navbera wan de çênebû û ew ji hev cuda bûn. Keçik bi xortek bînteng, enirî, berîkvala û edetxerab re zewicî û ji destê wî gelekî zor û tehda, nexweşî û bela dîtin. Lê dîsan jî wê spasiya Yezdan dikir: "*Pesna û sena bû Yezdan* ku ji wê ezaba dojehî xelas bûm û ketim vê bextiyariya biheştîn!"

Tevî hemû bîntengî û zordariya te jî,
ez nîrê te hildigirim çimkî tu bedew î.
Xweştir e bi te re di Dojehê de bikijkijim,
ne bi kesek din re bikevim Biheştê.

Bîna sîran ji devê yek bedew
xweştir e ji sorgula di destê yek kirêt de.

**3**. Li **Diyarbekir**ê ez mêvanê kalepîrekî bûm. Ew zengîn û bavê kurek keşxe* bû. Wî şevekê çîroka xwe ji min re got: "Min di hemû jiyana xwe de min ji bilî vî ti kurên din tine bûne. Li van deveran geliyek heye. Li wî gelî darek pîroz heye ku xelkê vir diçe ber wê darê dua û lavayan ji Yezdan dike. Min bêhejmar şev û roj li binê wê darê bang hawarî Xwedê kir ku kurekî dibe min."

Hingê min bihîst ku kurê wî dibêje: "Xwezî min bizaniya ka ew dar li kû ye. Ez ê biçûma wir û min ê dua bikirana daku Xwedê riha vî pîretewtî * bistanda."

Bavo bi kêfxweşî digot: "Kurê min jîr e."

Kurik ji tehn: "Xwedê-nehiştî mejîreş e!"

Sal û dem borîn
û tu neçûyî ser gorra bavê xwe.
Te çi qencî li bavê xwe kiriye
daku heman qenciyê ji kurê bipê?

———————

JÊRENOT

*1.8. Hormiz: li vir armanc ji padişahek sasaniyan e.*

*5.19. Angorî Qur'anê (12:31) mêvanên Zuleyxayê wisan bi dîtina bedewiya Yûsif mat man ku, li şûna pirteqalan spî bikin, bi bêdestî destên xwe birrîn.*
*5.19. Qur'an 12:32*

*6.3. keşxe: qeşeng, kur an zelamê xweşik û bedew*

*6.3. Armanca kurik bi "vî pîretewtî" bavê wî bi xwe ye.*

Parçeyek ji

# Kuncik

Fyodor Dostoyevskî

**IV**

"Hah-haa! Dawiyê tu dê zewqê ta di didanêşiyê de jî bibînî!" hûn ê bi kenkî bibêjin.

Îcar çi? Carekê hemû mehê didanên min diêşîn loma ez dizanim ku zewq di didanêşiyê de jî heye. Hingê bêguman bêdeng ezyet nayê kişandin lê mirov dinale lê ev nalîn ne yên dilpakiyê ne, ew ên ziyanxwaziyê ne û jixwe hemû nehînî û razdarî di ziyanxwaziyê de ye. Tam ew nalîn neynika zewqa mirovê ezyetkêş û kovandar e; heke wî hest bi zewqê nekiriya, ew dê nenaliya. Ev mînakek baş e, rêzdarno, û dixwazim wê ji nêzvetir zelal bikim. Pêşîn, bêwatetiya hemû xweagahiya jana we kêm dike, hemû qanûngoriya xwezayê, ku hûn qet guh nadinê lê dîsan jî ji ber bi kul û derd in tevî ku xwerist bi xwe ji ber nanale, jê diyar dibe. Xwiya dibe ku we ti dijmin nîn in lê dîsan jî hûn janê dikişînin; ku hûn û her celeb bijîşk û nojdar koleyên didanan in; ku heke kesek bixwaze, jana we dê xelas bibe lê heke nexwaze, didanêşiya we dikare sê mehan jî bidome, û dawiyê jî, ku heke hûn dîsan jî serê xwe li ber netewînin û dijî wê yekê rabibin, hûn dikarin ji bo xemrevandina xwe tenê qamçiyan li xwe bidin û mist û kulman li dîwaran bidin ta xwîn jê bê lê ne tiştek din. Belê, tam ji van birînên sera û binasên hoyek nenas, ji vê qerfê zewqek serekaniya xwe digire ku carinan digihe gupik û lûtkeya çêj û taman. Tika ji we dikim, rêzdarno, carinan guh bidin mirovê şaristanî yê sedsala me dema didanêşî lê ye. Hingê guh bidinê dema êşê du-sê rojan vekişandiye ku êdî mîna roja pêşîn nanale ango nalîna wî ne ji ber hindê ye ku didanên wî diêşin û ne wek cotkar û gundiyan dinale lê wek mirovek pêşketî, mirovê

şaristaniya ewropî ketî canî, wek wî mirovî yê "ji erdê û ji nav rêzên kûr ên gel hilketî", wek niha tê gotin. Gazin û nalînên wî dibin acizker, dibin zalim î erjeng û bi şev û roj didomin. Û jixwe ew bi xwe jî dizane ku bi gilî gazinan, bi nalîn û kalînan ti sûde û mifayekê ji xwe re naîne. Ew dizane ku bêwec û bêencam xwe û yên din diwestîne û aciz dike; ew dizane ku cemawerê ew li pêş bi hemû şiyana xwe tê dikoşe û hemû malbata wî hê niha zivêrbûyî û bêzarane lê guhdarî dikin, ku ew qet jî ji wî bawer nakin û difikirin ku xwezî ew li derek din, bi awayek sadetir, kêmtir ji qesta û plankirî binaliya, û ku tenê ew ji dilxwaziya xwe acizker û zorker e. Belê, di hemû vê hestkirina bi şermê de zewqa berz heye. "Ez ê we ezyet bidim", ew dirame, "ez ê dilê we biperitînim û nehêlim ku yek jî bi aramî ji xwe re binive û rabikeve. Ango ranezên, her bîsk û saniyeyê jê haydar bin û hest pê bikin ku didanên min diêşin. Ez êdî hew ew gernas û egîd im ku min berê dixwest xwe pê bidim pêş; niha tenê heyokek reben û perîşan im. Lê ma çi ye! Pirr dilşad im ku hûn niha di min re dibînin. Ma li we xweş nayê guhdariya gilî û gazinên min bikin? A ew heqê we ye, ez ê aniha rewşa we hê jî kembaxtir bikim..." Ma hûn hê jî fam nakin, xwendevanên min ên hêja? Na, dixwiye ku divê hê seqbêrtir bê zelalkirin, divê mirov di xwevekolandinê de hê jî dûvedirêjtir biçe daku bikare di hemû aliyên wê lezetê bigihe. Hûn dikenin? De ka çi xweşî ye! Li gor we, rêzdarno, henekên min nelirê, asê û nezelal in û xwebawerî di wan de nîn e. Lê sedem ew e ku qet nirxek min li nik min tine ye. Ma kesek nav û hindirê xwe vebikole dê bikare qedir û qîmeta xwe li hember xwe hebe?

# KEŞÎŞÊ REŞ

Anton Çexov

**I**

Zanyar Andrey Vasîlyîç Kovrîn hest pê kir ku westiyaye, demarên wî jî ne sax bûn. Wî dest pê nekir û matî ji xwe nekir lê di nav suhbetekê re, gava bi şûşeya meyê re bû, ji hevalê xwe yê nojdar re basa vê yekê kir, û vî hevalî jî ew şîret kir ku bila bihar û havînekê li derveyî bajar derbas bike. Di heman deman de wisan qewimî ku nameyek dirêj ji Tanya Pesotskayayê hat û tê de ew vexwendî Borîsovkayê hat kirin. Û Kovrîn fikirî ku bi rastî jî divê ji vê geremoliyê derbikeve û hewayek hên bikişîne.

Pêşî - hingê meha banemerê bû - wî rêwîtiyek bir gundê xwe Kovrînkayê û li wir sê hefte di tenêtiyê de borandin; paşî ku rê û rêçik xweştir bûn, ew bi erebeya hesp çû nik çavdêr û perwerdekerê xwe yê berê Pesotskî, ku baxçevanek li Rusyayê bi berfireyî tê nasîn e. Ji Kovrînkayê ta Borîsovkayê, ciyê malbata Pesotskiyan, ne ji heftê verstan (pîvek rusî ya dirêjiyê ye, 1 km û 70m ye -çapa kurdî) dirêjtir bû, û rêwîtî li ser rêyên nerm ên biharê, di erebeya aram de ya bi pergalên lêhatî raxistî zewqek rastîn bû.

Xaniyê Pesotskiyan bi stûn û serê şêrên li ber deriyan pirr mezin bû lê hinek ji lebxe û moleya dîwaran jê werîbû; xizmetkarê cilfrak li ber serderiyê xanî bû. Baxçeyê kevn, yê tarî û tund dixwiya û yê bi stîla îngilîzî nexşekirî, bi qasî kîlometreyekê pan bû û ji ber xanî digiha berava bekreyî ya qinc ya çem; li wir darên çamê şên dibûn ku rîşên wan ji bin axê derdiketin û dişibîn lepên axme û şerpeze yên lawiran; li jêr av xembar diteyisî, dengê nalîna darkokeyan dihat, û li wir rewş herdem wisan bû ku te dikarî rûbinî û ger bixwazî sirod û helbestan bihûnî. Li aliyê din, li nêzî xanî bi xwe, li nav baxçe û nav cinînê, ku bi şitilên xwe

ve bi qasî sî hektaran fire bû, li hewayê ne xweş jî hertim xweşik û dilhebîn bû. Sorgul û sosinên ew qas sosret, gulên kamelya, hind laleyên pirr-reng ji yên sîsspî ta yên ripîreş, bi kurtî, ew dewlemendiya gulên li baxçeyê Pesotskiyan, Kovrîn ti caran li ti derek din nedîtibû. Biharê hê ji nû serê xwe rakiribû û mişetî û pirriya gulan hê veşartî bû lê tenê ew gul, ên ku li aliyên bersifk û dîwaran bişkivîbûn û li hin deran di nav rûniştekan re serê hildabûn, jî bi tena serê xwe bes bûn û têra hindê dikirin ku yê gerrek biharê di nav wan re bike, hest pê bike ku di nav reng û xemla ewreng û muhteşem a mîrnişîna gulan de ye, bi taybetî jî li dema berbangên spêdeyan gava ku xunav li ser her pel û belga wan diteyisî.

Pişka neqşandî ya baxçe, ku Pesotskî bi xwe ew beş wek bêwecî dinavand, carinan di Kovrîn de hestên çîrokane yên serdema zaroktiyê şiyar dikirin. Ax çi heyberên sosret, kirêtiya kubar, derewderxistina xwezayê li wir hebû! Li wir rêçikên darfêkiyan, darhirmî, ya mîna spîndarek pîramîdî dirêj, gûzên mîna gogan, darsêvek şibî sîwaneyan û ta jimareya 1862 - ango sala Pesotskî dest bi baxçevaniyê kir - ya ji darhilûkan çêkirî hebûn. Li wir darikên biçûk î zirav, ên ku kok û qurmên wan rast û xurt bûn, diketin ber çavên mirov lê ta mirov nêztirî wan nebûya û seqbêrtir çavdêriya wan nekira, dê tê dernexista ku ew hilûtirşik û kişmiş bûn. Lê tişta herî zêde li nav baxçe mirov kêfxweş dikir, tevger û livbariya herdemî bû. Ji sîqleya spêdeyê ta derengiya êvarê karker bi destgere (ereboka destan), tevrik û mesînên avê di destan de mîna mêriyan û gêrikan dixebitîn.

Kovrîn êvarê, piştî rêwîtiya neh saetan, giha cem Pesotskiyan. Li wir wî Tanya û bavê wê Yigor Semyonîç ên herdu pirr dilbitirs dîtin. Esmanê sayî û stêrîn û hewapîvek nîşanên pêşbînîkirina spêdeyek qeşemî bûn lê baxçevan Îvan Karlîç li bajar bû û kesek tine bû ku ew baweriya xwe pê bînin. Li ser sifreya şîvê tenak mijara suhbetê qeşema spêdeyê bû, û

biryar hat girtin ku Tanya dê ranekeve daku piştî saet duwanzdehê şevê gerrekê li nav baxçe bike daku misoger bike ku her tişt baş e, û Yigor Semyonîç jî li dorên saet sêyî şevê yan zûtir rabibe û heman tiştî piştrast bike.

Hemû wê êvarê Kovrîn bi Tanyayê re rûnişt û piştî nîvşevê li gel wê çû nav baxçe. Hewa sar bû. Hê li hewş û asîtanê bîna dûkêlê şewatê difirrî. Li nav cinîna mezin, a ku dihat gotin ku ya bazarganiyê ye û ji Yigor Semyonîç re salane bi qasî hezar dahatin dianîn, dûxanek reş, tîr û dijwar xwe berdabû ser zeviyan û ew hezar ruble ji penceyên qeşemê diparastin. Dar li rêz û sazûmanek çargoşeyî û lepzîneyî, li ser xîçên rast û birêkûpêk, mîna leşker li bere û eniyê hatibûn çandin û vê pergala pirr zêde û pedantîk û herwiha wê yekê ku hemû dar bi qasî hev mezin bûn û kok û gupikên wan tam mîna hev bûn, dîmena baxçe li wir pirr yeknesak (monoton) û ta diltengker dixwiya. Kovrîn û Tanya di ber diraxe û komgehên dûkêlbar, ku ji rîxê, kayê û her celeb bermayiyan hatibûn berhevkirin, re diborîn û carinan pêrgî hin karkeran dihatin ku di nav morana dûkêl re dişibîn sîber û sîtavkan. Tenê dargilyaz û darhilûk û herwiha çend celebên sêvan bişkivîbûn lê hemû baxçe di nav dûkêl re mabû û ta ew negihan rasta komşitilan, Kovrîn nedikarî bi hemû gewriya xwe nefesê bikişîne û berbide.

- Hê dema zarok bûm, li vir dibênijîm, wî milên xwe hejnadin û got, - lê niha jî hê nizanim ka çawa dûkêl dê rê li ber qeşemê bigire.

- Eger ewr tine bin, dûkêl şûna wan digire..., Tanyayê bersivand.

- Çima ewr pêdivî ne?

- Li hewayê ewrîn û mijîn qeşem nîn e.

- A welle rast dibêjî!

Ew kenî û destê xwe avêt ê keçikê. Rûyê Tanyayê yê pan, pirr jidil û sarmagir bi birûyên reş î tenik re, bi pistokên rakirî yên saqo re ku nedihiştin ew serê xwe bi serbestî bilivîne, bi hemû hebûna xwe, bi bejnbiçûkiya xwe, lawazî û narîniya xwe, bi dawa xwe ya ji ber baranê hildayî pirr bala Kovrîn dikişand.

- Xwedêyo, ew mezin bûye jî, Kovrîn got. - Dema ez cara berî vê, berî pênc salan, ji vir çûm, hûn hê zarok bûn. Hûn ew qas zirav, lingdirêj, pirçhilû bûn û we etek û tenoreyên kurt li xwe dikirin, û min henek bi we dikirin ku hûn quling in... Lê ax ka sal û dem çi dikin!

- Erê, pênc sal! Tanyayê axîn kişand. - Pirr av piştî hingê herikiye. De bibêjin, Andryuşa, - wê bi dilgeşî li Kovrîn dinerî û domand, - bi rastgoyî bibêjin, ma hûn ji me biyanî bûne? Lê çima ez viya ji we dipirsim? Hûn mêr in, jiyana xwe ya balkêş û rengîn diborînin, hûn kesatiyek mezin in... Biyanîbûn tiştek pirr xwezayî ye! Lê çawa be jî bila bibe lê hêvî dikim ku hûn me jî ji xwe bihesibînin. Mafê me ji bo hindê heye.

- Jixwe ez we jî ji xwe dihesibînim, Tanya.

- Bi sond?

- Bi sond.

- Belkî hûn diheyirin ka çima ew qas wêneyên we li cem me hene. Hûn dizanin ku bavê min we pirr nirxbilind dibîne. Carinan ji min re wer dixwiye ku ew ji min zêdetir ji we hez dike. Ew bi we serbilind e. Hûn kesek têgihîştî, mirovek ne ji rêzê ne, we pîşeyek wurşedar û serketî hebûye, û bavo li ser wê baweriyê ye ku hûn ew qas kesek bibandor in ji ber ku wî hûn xweyî kirine. Ez naxwazim rêya wî bigirim ku wisan nerame. Bihêlin bila wisan bifikire.

Êdî spêde zelal dibû; wî bi hindê aga ji spêdebûnê bû ku gupikên daran û gulolikên dûkêl baştir ji hev cuda dihatin sihirandin û dîtin. Bilbil distrîn û û awazên sûskan ji nav zeviyan digihan nik wan.

- Lê niha dema raketinê ye, Tanyayê got. - Sar e jî, wê destê xwe xist bin kefşê Kovrîn. - Spas, Andryuşa, ku hûn hatin. Nas û lêzimên me li vir kêm in û yên heyî jî balnekêş in. Me tenê baxçe heye, baxçe û baxçe û baxçe - ti tiştek din ne. Qurmek darê, nîvqurmek, ew kenî, - gulegiyayên sêv, hirmî û hilûkan; kezaxtin, adekirin, helboqkirin... Hemû, tev jiyana me di ber vî baxçeyî de çûye, ez ji bilî sêv û hirmiyan ticaran di jiyana xwe de tiştek din nabînim. Bêguman ev kar jî baş û biwec e lê carinan dil dixwaze tiştine din jî. Bîra min tê, gava hûn ji bo dema azane û tatîlê yan wek din dihatin, serdanser di hemû malê de kêfxweşî û ronahiyek geş dibû, tam mîna ku qumaşê mobilya û awîzeyan ji ser hatibe vekirin û xemla wan xwiya bike. Ez hingê biçûk bûm lê dîsan jî tê bîra min.

Ew dirêj û bi diltenikî peyivî. Di cî de ket serê Kovrîn ku ew dikare bi herikîna vê havînê re dilê wî bikeve vê afirandiya narîn, lawaz û zimanxweş, heyranî wê bibe û jê hez bike - di rewşa wan de dê ev yek hem gengaz û hem jî xwezayî bûya! Vê ramanê ew hem diponijand û hem jî ew dikenand; wî xwe tewand ber rûyê xembar û xweşkok ê keçikê û strî:

Onegîn, veşartinê naxwazim. Ji Tatyanayê bi şeydayî hez dikim...

Dema ew vegerîn hindir, Yigor Semyonîç şiyar bûbû jî. Xewa Kovrîn nedihat, ew bi mêrik re kûrî suhbetan bû û li gel wî vegerî nav baxçe. Yigor Semyonîç kesek bejnmezin, milpan, zikqelew bû û herwiha nedikarî baş nefesê bikişîne lê dîsan jî herdem ew qas bi lez dimeşî ku mirov pê re nedigiha. Rûyê wî bêsînor xemxwar bû, wî bênavbirr xwe dilezand derekê mîna ku dibê qey ew deqeyekê jî dereng bibe, her tişt dê di ber avê de biçe.

- Tu dibînî, têlîkê min, çima wiha ye… wî dest pê kir û rawestî daku hinekî bîna xwe vebike. - Li rûyê erdê, ku tu bi xwe jî dibînî, qeşem heye lê gava hewapîvekê rabikî rastî hemêza xwe, tu ê bibînî ku li wir hewa germ e… Çima wiha ye?

- Bi sond ez nizanim, Kovrîn bi kenkî got.

- Hm… Mirov nikare her tiştî bizane, bêguman na… Mejî çi qas fire be jî, ciyê her tiştî nake… Jixwe tu herî zêde bi felsefeyê re mijûl î yan na?

- Belê. Ez derûnnasiyê (psîkolojiyê) dixwînim lê hewesa min li ser felsefeyê xurt e.

- Û dilê te jê reş nabe?

- Berevajî, ew hemû jiyana min e.

- De Xwedê hez bike… Yigor Semyonîç got û bi kûrponijî riyên xwe yên spîbûyî perixandin. - Xwedê hez bike… Ez bi te kêfxweş im, gelekî kêfxweş im, têlîkê min…

Di cî de ew bêdeng bû û guhên xwe dan ser hawirdor, rûyê wî guherî tirsnakiyê, ew bezî aliyê din û zû di nav ewrên moranî yên dûkêl de wenda bû.

- Kê hesp bi darsêvê ve girê daye? dengê wî yê bêhêvî, qîrîna wî ya dilperritîn hat. - Kî cinawirî ev hesp bi sêvê ve girê daye? Ax Xwedê, Xwedêyo! Her tişt hatiye pûçkirin, têkdan, teribandin, hincirandin, hilweşandin û ruxandin! Baxçe hatiye talankirin! Baxçe hatiye wêrankirin!

Dema ew vegerî nik Kovrîn, nîşana betilîn, westîn û xeyidînê li ser rûyê wî bû.

- Ma dikarî çi li wan bikî, li vî xelkê xezeblêbarî? wî bi dengek zîz û melûl got û destên xwe li ba kirin. - Stepka bi şev rîx dikêşî û hesp bi darsêvê ve girê da. Hevsar wisan bi darê ve şidand, wî xwedêhiştî, ku qalikê darê ji sê ciyan xewixiye û jê vebûye. Çi ehmeq û serserî! Ez jê re diaxivim lê ew mîna qurmekî radiweste û çavên xwe dineqîne. Daliqandin jî ji bo kesên mîna wî cezayek gelekî sivik e!

Piştî ku hinekî hedinî û arimî, wî Kovrîn hemêzand û çû serê wî.

- De Xwedê hez bike, Xwedê hez bike..., ew minminî. - Pirr kêfxweş im ku tu hatî. Bêwêne kêfxweş... Spas.

Paşî ew bi lezgînî û bi rûyê mîna herdem xemxwar çû li dor baxçe bizivire û hemû sera, berbanên ji bo şitilan, penagehên zibilê lêreşandinê û du baxçeyên mêşên hingivîn, ku wî bi sosretiya sedsalê dinavandin, nîşanî şagirt û mezinkiriyê xwe yê berê da.

Dema ew hê li gerra xwe bûn, roj hilhat û baxçe bi zelalî ron kir. Germ bû. Ku Kovrîn hay jê bû rojek bedew, kêfxweş û dirêj dest pê dike, hat bîra wî ku niha hê destpêka gulanê ye û hemû havîn, wiha bedew, şad û dirêj li benda wî ye û hestek tijî hêvî û ronahî, mîna hestên hingê gava ew di zaroktiya xwe de li van deran dibizirî, ket dilê wî. Û niha wî bi xwe mêrik hemêzand û bi nermî maçand. Herdu bi dilxweşî ketin hindir û dest bi vexwarina çayê ji fincanên kevndemî yên porselenî bi qeymax û gustîlkkadeyên rûnî re kirin. Û van tiştikên biçûk jî zaroktî û xortaniya Kovrîn dianîn bîrê. Hemdemiya bedew û bîranên raboriyê têkil dibûn; wan rewşek tengezar lê dilhebîn dixist dilê wî.

Ew li benda şiyarbûna Tanyayê ma, bi wê re qawe vexwar, bîskekê li ser gerrî, paşî çû odeya xwe û rûnişt ber maseya kar. Wî bi seqbêrî dixwend, not û têbînî digirtin, kêm caran serê xwe radikir daku li paceyên vekirî û gulên di guldankan de, yên terr û ji ber xunavê hê şil, binere, dîsan serê

xwe şorr bike ser pirtûkê, û wî hest pê kir ku her demarê di wî de pêl radikirin û ji ber zewqê direqisî.

## II

Wî li derveyî bajar jî jiyanek wisan nearam û serxwer domand. Wî pirr dixwend û dinivîsî, xwe fêrî zimanê îtalî dikir û dema li gerrînê jî bûya, difikirî ku xwezî zû vebigere ber karê xwe. Ew qas kêm radiket ku her kes dihêbitand: heke bi bêdilî xwe rojê nîv saetê jî binivista, êdî hemû şevê xew bi çavan nediket lê dîsan jî piştî şeva bêxew wî xwe kêfxweş û zînde dihesand mîna ku qet tiştek neqewimîbe.

Ew pirr dipeyivî, mey vedixwar û cixarên bihagiran dikişandin. Pirrî caran, hema bêje her roj, keçxanimên dercîranan dihatin mala Pesotskiyan û bi Tanyayê re li piyanoyê dixistin û distrîn; carinan zelamek xort jî dihat û pirr baş keman dijenand. Kovrîn bi çavbirçîtî li muzîkê û stranan guhdarî dikir û ji vê guhdariyê wisan diwestî ku çavên wî diketin ser hev û serê wî bi aliyekî de şorr dibû.

Carekê piştî çayvexwarina êvarî ew li balkon û şaneşînê rûniştibû û dixwend. Tanya - soprano - û keçxanimek cîran - kontra-alt - û yê xort jî bi kemana xwe wê demê li saloneya mêvanan rahênana serenada navdar a Brag dikirin. Kovrîn guhdarî gotinan dikir - ew rusî bûn - lê nedikarî xwe bigihîne naveroka wan û tê bigihe. Dema dawiya dawîn dev ji pirtûkê berda û kûrî guhdarkirinê bû, ew tê gihişt: keçek dîn û şêt bi şevê hin dengên razdar û sirr ji nav baxçe dibihîstin, dengên ew qas bedew û seyr bûn ku wê ew wek ahengek pîroz hesibandin ku ji aliyê me yên mirbar de nayê têgihîn loma dîsan difirrin esmanan. Çavên Kovrîn hêdî-hêdî ketin ser hev. Ew rabû ser xwe, westiyayî, pêşî li saloneya mêvanan û paşî li

odeyên din jî meşî. Dema rahênana û xwehînkariya stranê bi dawî hat, wî destê xwe avêt bin kefşê Tanyayê û ew bir balkonê.

- Îro ji spêdeyê ve efsaneyekê ez ramandime, wî got. - Nayê bîra min ka min ew ji derekê xwendiye yan jî bihîstiye lê ev efsane gelekî watedar e, ji hemû yên din awarte ye. Dikarim ji wê yekê dest pê bikim ku zelalî ne para wê ye. Hezar salan berî niha keşîşek kincên reş lê li çolistanek Suriyeyê yan Erebistanê digerî... Çend mîlan ji ciyê ew digerî wê de masîgiran dît ku keşîşek din ê bi kincên reş hêdîka li ser rûyê deryaçeyekê dimeşî. Ew keşîşê din leylanok bû. Hemû zagonên dîtinnasî û optîkayê li aliyekî bihêlin çimkî wer dixwiye ku ew bala vê efsaneyê jî nakişînin, û guhdariya vê bikin. Ji leylanê leylanek din çêbû, yek din û yek din ta ku şekilê ê keşîş bêdawî ji qatek hewa digiha ya din. Carinan ew li Efrîqayê, carinan li Îspanyayê, carinan li Hindistanê û carinan jî li Rojhilata Dûr dihat dîtin... Dawiya dawîn ew ji atmosfera vê dinyayê der û dûr ket û niha li gor serê xwe di gerdûnê de diçe û tê bê ku bi ti awayî bikeve nav mercên wisan ku bikare biruxe. Dibe ku ew niha li Merîxê yan jî li stêrek ji komstêrên Xaça Başûr bikare bê dîtin. Lê kakila vê efsaneyê, heval, ew e ku tam piştî hezar salan ku keşîş li çolistanê digerî, leylan dê dîsan bikeve nav biraha cîhana me û xwe nîşanî mirovan bide, û tê gotin ku ev hezar sal li ber xelasbûnê ne. Li gor vê efsaneyê divê em çavlirêyên keşîş bin ku heke ne îro, sibê ew ê xwiya bibe.

- Leylanek çi seyr e, Tanyayê, ku efsane ne bi dilî bû, got.

- Lê sosrettirîn tişt ew e, Kovrîn xwe kenand, - ku qet nayê bîra min ka ev efsane ji kû ketiye serê min. Ma min ew li derekê xwendiye? Yan jî bihîstiye? Yan jî belkî min keşîş di xewna xwe de dîtibe? Sond dixwim ku nayê bîra min. Lê ev efsane min difikirîne. Îro hemû roja min bi wê ve boriye.

Piştî ku wî Tanya berda nik mêvanan, ew bi xwe di nav ponij û ramanên xwe de di nav guldankan re ji xanî derket. Ji gulan, ên ku hê nû hatibûn avdan, bînek axa şil û bicoş difûrî. Li hindir dîsan dest bi strînê hatibû kirin, û dengê kemanê ji dûr ve dişibî yê mirovan. Wî fikirên xwe zivêr kirin daku bîne bîra xwe ka ew efsane ji kû bihîstibû yan jî ew xwendibû û pê re berê xwe da dal û rêlê û bêyî agayiya xwe hat ber çem.

Bi dirêjiya rêçikê ve, ya ku bi kenarika asê û kêrreyî ve ber jêr de xwarovîç dibû û di ber giyasilkên ripîrût re derbas dibû, ew daket beravê û bû belaya serê hin firindeyên darkoke û du werdek tirsandin. Tîrêjên dawîn ên roja li ber avabûnê li hin deran di ber gupikên darên çamî yên reşbar re dibiriqîn lê êvarê xwe bi temamî berdabû ser rûyê çem. Kovrîn bi pira pelingî ve xwe gihand aliyê din ê beravê. Li pêş wî zeviyek berfire ya bi şilêlek (genimê çewder/tarîgan) nû yê hê gulînedayî niximandî hebû. Ne jîngehek û ne jî benderuhek li ti deran dihat dîtin, û wer dixwiya ku rêçik, heke mirov li pey biçûya, dê bigihaya wî ciyê razdar û nepenî ku berî bîskekê roj lê ava bûbû û hengura êvarê bi ewrengî û mirêsî lê diçirisî.

- Ax ev der çi qas vekirî, azad û bêdeng e! Kovrîn, dema bi rêçikê ve dimeşî, difikirî.

- Û wer dixwiye mîna ku hemû cîhan li min dinere, bêdeng bûbe û li bendê be ku ez tê bigihim...

Di heman demê şilêl pêl dan, û bayê sivik ê êvaran xwe bi nermî li serê wî yê kol da. Piştî kêlîkekê bagerokek din, a pirr bihêztir hat, şilêl xijxijî, û ji paş ve hurmîna xirş a darkajan bihîzî. Kovrîn hêbetmayî rawestî. Li qeraxa esman peykelek dirêj î reş wek barov û bagerê ji erdê hilket jor. Serxetên wî şêlî û nezelal bûn lê hê di bîska pêşîn de dikarîbû bê sihirandin ku ew li ciyê xwe ranediwestî û bi lezgîniyek erjeng dilivî û ne bi ti derek din lê virde, rasterast bi cem Kovrîn de dihat, û her ku nêztir

dibû, wisan biçûktir û zelaltir dibû. Kovrîn xwe avêt cokê daku rê bidiyê lê hê negihabû wisan jî bike…

Keşîşê kincreş, pirçspî, birûreş û dest li ber sîngî jê çindikdayî… Lingên wî yên pêxwas ji erdê nedigirtin. Ku çend gavekan ji Kovrîn borî, ew li ser milê xwe zivirî ku li Kovrîn binere, serê xwe çemand û hem bi nermî û hem jî bi xasûkî û qurnazî bişirî. Lê ax rûyê wî çi qas zerik û spîçolkî, pirr spîçolkî bû! Dû re keşîş dîsan mezin bû, di ser çem re firî, bi bêdengî bi berava bekreyî ve û li hember darçaman xwe divirand û, ku xwe daweşand nav daran, ji ber çavan wenda bû.

- De, we dît ka çi qewimî… Kovrîn minminî. - Ango efsane rast e.

Bê ku ew bide xwe ku vê diyardeya sosret ji xwe re şîrove bike, bi wê yekê kêfxweş û razî bû ku lê hat ew ne tenê keşîş ew qas ji nêz ve û bi zelalî lê herwiha serçavên wî jî bibîne, Kovrîn bi diltirsiyek dilhebîn ve vegerî malê.

Xelk bi aramî li nav bax û baxçe digerîn, li jor muzîk dijenî, - ango tenê wî keşîş dîtibû. Wî pirr ji dil hez dikir ku hemû çîrokê ji Tanyayê û Yigor Semyonîç re bibêje lê ew tê giha ku wan dê gotinên wî wek pest bihesibandina û bitirsana jî; baştir bû ku bêdeng bimîne. Ew bi dengbilindî kenî, strî, govenda *masurka (govendek sêgavkî ya kokpolonî - çapa kurdî*) reqisî, kêfa wî li cî bû; li gor hemûyan, hem mêvanan û hem jî Tanyayê, rûyê wî îro taybet bû, geş bû, diçirî û ew bi xwe jî balkêş bû.

**III**

Piştî şîvê, dema mêvan çûn, ew jî çû odeya xwe û xwe pal da ser qenepeyê: dilê wî dixwest dîsan li ser wî keşîşî bifikire. Lê piştî delîvekê Tanya hat.

- Va ye, Andryuşa, nivîsarên bavo bixwînin, wê got û qeftek kaxezan û parçeyên rojnameyan raberî wî kirin. - Nivîsarên baş in. Ew pirr xweş dinivîse.

- Herê çi xweşiya wan heye! Yigor Semyonîçê li pey Tanyayê hatî got û bi zorkî xwe kenand; wî şerm dikir. - Ji wê bawer neke, ji camêriya xwe, wan nexwîne! Lê heke dixwazî ku xewa te bê, dibe ku baş be wan bixwînî: ew ji bo xewê dermanê herî baş in.

- Bi min ew nivîsarên bêpayan in, Tanyayê ji dil got. - Bixwînin, Andryuşa, û bavo kişkiş bikin ku zêdetir binivîse. Jixwe wî dikarîbû pirtûkek temam a baxçevaniyê binivîsiya.

Yigor Semyonîç bi coşî kenî, sorikî û bi şermokî minminî. Lê dawiyê radest bû:

- Madem wiha ye, pêşî van kurtenivîsên Gosche yên bi rusî bixwîne, ew minminî û çavek li kaxezan gerand. - Wek din tu dê nikaribî nasyarî mijarê bibî. Ji berî ku dest bi xwendina îtîrazên min bikî, divê tu bizanî ka ew li hember çi ne. Wek din... wek din her tişt bêwate û bênaverok e. Û jixwe dema raketinê ye jî.

Tanya derket. Yigor Semyonîç rûnişt ser qenepeyê li rex Kovrîn û axînek kûr kişand.

- Belê, têlîkê min... wî piştî kêlîkek bêdengiyê dest pê kir. - Ez li vir nivîsaran li hev tînim, beşdarî pêşangehan dibim û medalyeyan bi dest dixim... Pesotskî, tê gotin, sêvên bi qasî seran hene, û Pesotskî, xelk dibêje, bi baxçeyê xwe maldarî û dewlemendiyek peyda kiriye. Bi kurtî bê gotin, "Kotşubey xanedan û xwedîşoret e". Lê dikare bê pirsîn: gelo ev hemû ji bo çi ye? Baxçe bi rastî jî bêyom ye, ji hemûyan re mînak e... Ew ne tenê baxçe ye lê dezgeyek temam a xwedî wateyek dewletî ye çimkî ew,

em bibêjin, ew di rabûna pîşekarî û aboriya nûjen a Rusyayê de gavek e. Lê ji bo çi ye? Mebesta wê çi ye?

- Xebat bersiva hemû vê yekê dide?

- Tiştek din di dilê min de ye. Ez dipirsim: dema ez bimirim, dê çi bê serê baxçe? Baxçe, wek niha ku tu dibînî, mehekê jî bêyî min namîne. Razdarî û nehîniya serketinê ne di wiya de ku baxçe mezin e û kedkar pirr in lê di wê yekê de ye ku ez ji karê xwe hez dikim - tê digihî? - belkî ji xwe jî zêdetir ji vî karî hez dikim. Li min binere: her tiştî bi xwe dikim. Ji sîqlespêdeyê ta derengî şevê bi xwe dixebitim. Kezaxtinê ez bi xwe dikim, bi xwe dibirim, bi xwe şitilan diçikilînim û dişitilînim, bi xwe - her tiştî bi xwe dikim. Dema alîkariya min tê kirin, çavnebar û hesûd dibim û diqehirim. Hemû razdarî di hezkirinê de ye, bi gotinek din, di bin çavdêriya xwediyê kar de ye, di destên wî de ye û di wê rewşê de ye ku heke bi mêvanî biçî derekê, hema ji bo nîv saetê jî be, dilê te rehet nabe, hişê te ne li serê te ye: herdem ditirsî, xwezî bes belayek li baxçe neqewimîbe. Pa heke ez bimirim, kî dê çavdêriya baxçe bike? Kî dê hemû karan bike? Baxçevan? Kedkar? Ew? Bihêle, ji te re bibêjim, heval: dijwartirîn dijminê me ne kîvroşk, mêsûmor yan sarma lê mirovên biyanî ne.

- Ma Tanya? Kovrîn bi ken pirsî. - Jixwe nikare bê gotin ku ew ji kîvroşkan bizerartir be. Ew ji baxçe fam dike û hez dike.

- Belê, ew jê fam dike û hez dike. Heke baxçe piştî mirina min bikeve destê wê û ew bibe xwediya vî baxçeyî, belê, bêguman tiştek baştir nikare bê hêvîkirin. Lê pa, Xwedê me bisitirîne, heke ew zewicî? Yigor Semyonîç pistî û bi çavtirskî li Kovrîn nerî. - De paşî hingê! Dê bizewice, zarokên wê hebin û dem nîn e li ser baxçe bihizire. Herî zêde ji hindê ditirsim ku ew bibe ya tûle û tolazekî yê ku çavnebar û hesûd be û baxçe bi kirê bide

bazarganên jin û pîretewt û hingê dê hê sala pêşîn her tişt di ber avê de biçe! Li vê mijara baxçevaniyê pîrek û pîretewt xezeba Xwedê ne!

Yigor Semyonîç axînek kişand û bîskekê bêdeng bû.

- Dibe ku ezperestî be, lê bi dilpakî dibêjim: naxwazim ku Tanya bizewice. Ditirsim! Gerok û felîteyek bi kemana xwe re carinan tê van deran û vingevingekê jê tîne; dizanim ku Tanya dê nebe ya wî, baş dizanim lê dîsan jî naxwazim ku ew bê ber çavên min! Pirrî caran, têlîkê min, ez kesek seyr im. Îtîraf dikim.

Yigor Semyonîç rabû ser xwe û bi nearamî li nava odeyê hat û çû; jê dixwiya ku dixwest tiştekî pirr girîng bibêje tevî ku hê hingê bisteyî (cesaret) nedikir jî.

- Ez bi şewatî ji te hez dikim û dixwazim bi dilpakî bi te re bipeyivim, - wî dawiya dawîn wêrekî da xwe û destên xwe kirin berîka xwe. - Hin pirsgirêkên nazik û hesas ez ê bixim ber çavan û tişta difikirim, ez ê vekirî bibêjim çimkî min serê fikir û ramanên veşartî nevê. Ez ê rasteqîn bipeyivim: tu tenak kes î ku natirsim keça xwe bidimê. Tu kesek aqilmend î, xwedîdil î, tu nahêlî ku xweştivîtirîn karê min di ber avê de biçe. Û tişta herî girîng, mîna ku tu kurê min bî, ji te hez dikim… û bi te serbilind im. Heke evînek di navbera te û Tanyayê de geş bibe, ma dê çi bibe? Ez ê pirr kêfxweş û ta bextiyar jî bibûma. Vê yekê rasterast, bêyî şermkirin, wek kesek rastgo ji te re dibêjim.

Kovrîn xwe kenand. Yigor Semyonîç derî vekir ku derbikeve lê li derazînkê sekinî.

- Heke te û Tanyayê kurek hebûya, min ê ew bikira baxçevan, wî bi kûrponijî got. - Lê jixwe ev hemû xeyalkirinek vala ye… Şev baş.

Piştî ku Kovrîn bi tenê ma, ciyê xwe xweş kir û dest bi xwendina nivîsaran kir. Sernavê yekê "Ji çandeya qonaxa navîn", a din "Çend gotin li ser nivîsa birêz Z ya di warê çinîna baxçeyên nû", û ya sêyem "Hê piçek li ser kezaxtina bişkojan" - yên din jî bi heman şêweyî bûn. Lê çi bû ev stîla nearam û bêaheng, ev coşa hêrsbûyî, hema bêje janoyî û merezdar! Wek mînak di vê nivîsa han de ku ji sernavê herî biaheng û aştîxwaz dixwiye; tê de basa antonovkaya rusî tê kirin. (*Antonovka celebek sêvên keskezer e, fêkî û tovê wê gir e, li meha sarmawezê digihe -çapa kurdî*) Yigor Semyonîç ew bi gotina "audiatur altera pars" (*latînî: Divê helwesta herdu aliyan bê bihîstin - çapa kurdî*) dest pê kiriye û bi "sapienti sat" (*latînî: peyvek bo yên* ***hişmend bes*** *e - çapa kurdî*) bi dawî aniye û di navbera van herdu biwêjan de mîna aşût an sûlavekê peyvên tijîjar ên ku arasteyî "birêzên me yên patentekirî pisporên baxçevaniyê, zirtokêk xwenda yên ku ji bilindiya koçk û serayan çavdêriya xwezayê dikin" û ji bo birêz Gosche "yê ku serketina wî bi xêra bêhurmet û cahilan e" û di ber her tiştî re dirêjkirina bêsedem a gazinên ji ber wê yekê ku kedkar, ên ku fêkî didizîn û bi wî awayî dar xerab dikirin, nedibû ku bi qamçiyan bên cezakirin.

"Baxçevanî bedew, biwec û saxlem e lê li wir jî azwerî û pevçûn serdest in", Kovrîn fikirî. "Wer diyar e ku li her der û her meydanê hestyarî û rêhişkî taybetmendiyên peyrew û mirûdên rêbazan in."

Tanya, ya ku ew qas bûbû evîndarê nivîsên Yigor Semyonîç, hat bîra Kovrîn. Keçek bejnbiçûk, zirav, ew qas lawaz ku hestiyên pişta wê dihatin dîtin; çav bi herdu aliyan de vekirî, reş û aqilmend, herdem hişyar mîna ku her gav li tiştekî digerin; rêveçûna mîna ya bavê wê, gavkurt û bipele (biecele). Pirr diaxive, bi dilxweşî dikeve rikeberiyê û hingê bêwatetirîn hevoka xwe jî bi tevgerên nazik ên dest û rûyan dilivîne. Îhtîmal e ku pirr hêrs û aciz bûye.

Kovrîn xwendina xwe domand lê, ku di tiştekî jî negiha, dev ji hewldanê berda. Heman azweriyê, ya ku ew li ber bandora wê *masurka* reqisîbû û guhdariya muzîkê kiribû, niha gelek fikir û ponij dixistin serê wî. Ew rabû ser xwe, di odeyê ve hat û çû û li ser keşîşê reş ramî. Texmînek wisan ket serî ku heke wî bi tenê ew keşîşê sosret û deresiruştî û surnatural dîtibe, ango ew nesax û dîn e û wî dilwas û waswase hene. Vê rawêj û texmînê ew tirsand lê tirs zû jê verevî.

"Heke ez sax bim û ti ziyanekê negihînim kesekî, ti tirsek ji bedgumaniyên min nîn e", ew ji xwe re fikirî, û dilê wî rehet bû.

Ew rûnişt ser qenepeyê û bi destên xwe serê xwe şidand û pê ew kêfxweşiya bêpayan, a ku hemû heyîna wî dagirtibû, digirt, paşî ew dîsan hinekî hat û çû û li ber karê xwe rûnişt. Lê wan fikiran, ên ku wî ji pirtûkan dixwendin, ew razî nedikir. Wî bêriya tiştek mezin, bêtixûb, tiştek ecêb dikir. Di berbanga spêdeyê de wî cilên xwe ji xwe kirin û bi bêdilî xwe avêt nav nivînan: diviyabû hinekî binive jî!

Dema Kovrîn pêngavên Yigor Semyonîçê diçû nav baxçe bihîstin, wî bangî xizmetkar kir û jê mey xwest. Bi zewq çend qedehên *lafitte*yê vexwarin û paşî betenî hilkişand ser serê xwe; mîna ku hişmendiya wî bihele nav mijê, ew di xew çû.

## IV

Yigor Semyonîç û Tanya pirrî caran gengeşe dikir û gotinên nexweş digotin hev.

Carekê spêdeyekê şerenîx û pevçûnek devkî di navbera wan de rû da. Tanya qorrî girî û revî odeya xwe. Ew ne hat firavînê bixwe û ne jî çayê vebixwe. Yigor Semyonîç pêşî bi pozbilindî û kubarî dihat û diçû mîna ku

bixwaze bide zanîn ku berjewendiyên dadperweriyê û sazûmana rastîn di ser her tiştî re ne lê wî nikarî demek dirêj vê tevgera xwe rabigire û aciz bû. Bi xemgînî ew li nav baxçe li gor serê xwe dimeşî û hertim axîn dikişandin: "ax, Xwedêyo, ax, Xwedêyo!" û li ser firavînê pariyek jî nexwar. Dawya dawîn, mîna tawanbaran, wek kesek wijdan lê bela, derî quta û bi şermokî got:

- Tanya, Tanya?

Dengek lawaz, dengek girînê westandî lê herwiha bibiryar ji pişt derî bersiv da:

- Bela xwe ji min vekin, tika ji we dikim!

Pevçûnên malbatiyan mora xwe li hemû malê, ta li wan, ên ku li nav baxçe dixebitîn jî, kir. Kovrîn xwe noqandibû kûriya karê xwe yê balkêş lê dawiyê êdî bîna wî jî teng bû. Ji bo ku bi awayekî rewşa bi giştî kamax hinekî qenc bike, wî biryar da ku bi xwe tiştekî bike û berêvarê deriyê Tanyayê quta. Derî lê hat vekirin.

- Ay-ay, ma tu qet şerm nakî! wî bi henekî dest pê kir û bi hêbetî li rûyê Tanyayê yê girîbar, sorikî û xembar nerî. - Ma ev hemû bi rastî jî wiha ji dil e? Ay-ay!

- Erê, lê xwezî we bizaniya ka ew çawa min nerehet dike! Tanyayê got, û rondik û hêsiran, ên germ, ên gulilî dest pê kirin ji çavên wê dabiwerin. - Wî wiha kiriye ku ez birizim, wê destên xwe badan û got. - Min tiştek jî jê re negotiye... tiştek tenê jî... Tenê pirsîm, ma çi wec e ku ew qas zêde kedkarên berdewam bigire madem... madem kedkar hertim dikarin bi dest bikevin.... Ev hefteyek e ku hemû wan kedkaran karek û kirinek tine bûye... Min... min tenê ev yek jê re got lê wî dest bi qîrînê kir û barek gotinên tal û rencîner, ji dil rencîner avêtin ser min. Ji bo çi?

- Bes e, de bes e, Kovrîn got û pirça keçikê ediland. - Ê hûn pevçûn, tu giriyî û bes e. Nabe ku ew qas pitpitê bikî, bi taybetî... bi taybetî ku ew bêsînor ji te hez dike.

- Wî... wî hemû jiyana min herimandiye, Tanyayê bi kinkinî domand. - Ji bilî tajang, heqaret û bedbêjeyan gotinekê ji wî nabihîzim... Ew di vê malê de min wek nepêdivî û bêwec dihesibîne. De baş e, ew rast dibêje. Ez ê hê sibê biçim û bikevim ciyê birûskevan û telgrafker... Û xelas...

- Na-na-na... De negirî, Tanya. Negirî, delala min... Hûn herdu bînteng in, zû hêrs dibin û herdu jî tawanbar in. Were, ez ê te aşt bikim. Kovrîn bi nermî û bibawer dipeyivî lê Tanyayê dev ji girîna xwe, libarkirin milên xwe û badana destên xwe berneda mîna ku bi rastî jî qeza û belayek mezin bi serê wê hatibe. Ax çi asan bû ku ew afirandî bê ji bo tevayiya rojekê yan jî hemû jiyana xwe xemgîn be! Dema Kovrîn Tanya aşt dikir, wî hizir dikir ku ji bilî vê keçikê û bavê wê ji hemû dinyayê bi agir jî dê kesek din tine bûya ku bi qasî van herduyan ji wî hez bikirana; heke ev herdu nebûna, wî, yê ku diya xwe û bavê xwe hê di zaroktiya xwe ya zû de ji dest dabûn, dê belkî ticaran nizanîbûya û hest pê nekiribûya ka dilnazikiya pak û ew evîna bêguman û pak, a ku tenê di navbera kesên pirr lêzim û xizmên xwînî de heye, çawa ye. Û wî hest pê kir ku demarên wî yên peritî û merezokî xwe dirêjî demarên wê keçika digirî, ya dilerizî dikirin, mîna ku çawa asin xwe dikişîne mexnetîz. Wî dê ticaran nikariya ji jinek saxlem, liserxwe û rûgeş hez bike lê wê keçika han a spîçolkî, narîn, bextreş dilê wî diheband.

Wî bi dilxwazî pirça keçikê û milên wê mizdandin, destên wê bi nermî givaştin û rondik ji çavên wê paqijandin. Dawiya dawîn Tanyayê dev ji girînê berda. Lê hê demek dirêj piştî hingê jî wê bavê xwe lome dikir, gazin ji jiyana xwe ya giran a li mala xwe dikir û ji Kovrîn lava dikir ku di rewşa wê bigihe; lê hêdî-hêdî wê dest bi bişirînê kir û axînek kişand ku

Yezdan dilekî ew qas qayim dayiyê; dawiyê bi dengek bilind pirqe-pirq kenî, gote xwe rebenok û bezî derve.

Dema Kovrîn piştî bîskekê derket nav baxçe, wî dît ka çawa Yigor Semyonîç û Tanya mil bi mil û bi aştî û ahengî li bersifka baxçe dimeşîn mîna ku qet tiştek neqewimîbe; û herduyan nanê şilêlî yê xwêpêwerkirî dixwarin çimkî herdu jî birçî bûn.

## V

Kêfxweş ji wê yekê ku di vatiniya xwe ya avakirina aştiyê de wisan baş bi ser ketibû, Kovrîn çû nav baxçe. Dema wî xwe dabû ser rûniştekekê û ketibû kûriya ponij û ramanên xwe, xilingîna hin erebeyên hespan ên nêz dibûn û dengê hin jinan bihîst - mêvan dihatin. Dema sîtavên êvarê li derve dirêj bûn, êdî ji hindirê malê dengê stranan û awazên kemanê dihatin guhê Kovrîn, û keşîşê reş anî bîrê. Gelo ew negengaziya optîkî û dîmenî niha li kîjan welatî yan kîjan gerestêrê dipirpirrî?

Hê wî hemû efsane neanîbû bîra xwe û sawêr û xeyaletê wê yê reş, ê ku li nav zeviya şilêlî dîtibû, di serê xwe de ne baş nenimandibû, ku afirandiyek porspîbûyî û navsere yê bi kincên ji şimik ta kumik reş bi bêdengî, bêyî ti xişexişekê jî ji pişt çama raberî wî derket; yek serkol û pêxwas, yê mîna parsekan bû û ji rûyê wî yê spîçolkî, yê hema dişibî rûyê miriyan birûyên wî yên reş zelal dixwiyan. Ew parsek an jî hecî bi dostanetî serê xwe tewand û bi bêdengî hat nik rûniştekê û rûnişt; ji nû hingê Kovrîn pê hesî ku ew keşîşê reş e. Bi qasî bîskekê wan li hev nerî. - Kovrîn matmayî û bi hêbetî, keşîş bi dilnermî û herwiha, mîna cara berê jî, hinekî bi fêlbazî, bi rûyek wisan ku "netirse, te aqilê xwe wenda nekiriye" li hev dinerîn.

- Lê tu leylan î, Kovrîn dest bi axivînê kir. - Çima tu li vir î û li cî rûdinî? Ev yek bi efsaneyê re nakok e?

- Ferq nake, keşîş piştî bîskek gîrobûnê bersivand û li ser zivirî daku rasterast li Kovrîn binere. - Efsane, leylan û ez - hemû berhema aşop û xeyalên te yên boşbûyî ne. Ez spêle û xeyalet im.

- Ango tu nîn î?

- Çawa dixwazî, wisan bifikire, keşîş got û bi dengkêmî bişirî. - Ez di aşop û xeyalên te de me lê aşopên te jî beşek ji xweza û siruştê ne loma ez di xwezayê de jî heme.

- Rûyê te pirr kal, aqilmend û herî zêde jî têgihîştî ye, tam mîna ku tu bi rastî jî ji hezar salan zêdetir jiyabî, Kovrîn got. - Min nedizanî aşopên min dikarin heyberên wiha kêmpeyda û nadir biafirînin. Lê çima wisan bi kêfxweşî li min dinerî? Ma ez te dihebînim?

- Belê. Tu yek ji wan ên kêm î ku hêjayî hindê ne ku jê re tê gotin ku bijartiyên Yezdan in. Tu xizmetkarê rastiya ebedî û herdemî yî. Ramanên te, armancên te, zanista te ya darîçav û xwiya û hemû jiyana te morek esmanî, morek yezdanî heye çimkî her tişta di te de gorî û qurbanî awezmendî û bedewiyê ango tiştên herdemî û bêdemî hatiye kirin.

- Te got: tu xizmeta rastiya ebedî dikî... Lê ma mirov dikare xwe bigihîne rastiya ebedî û - madem jiyana herherî tine be - çi pêdivîtî bi rastiya herheyî heye?

- Jiyana herheyî heye, keşîş got.

- Ango tu ji nemiriya mirovan bawer dikî?

- Belê bêguman. Pêşerojek xweş û ewreng li benda we mirovan e. Û çi qas zêdetir kesên mîna te li ser rûyê zevînê hebin, ew qas zûtir ew pêşeroj dê

bê. Bêyî we, yên ku hûn di xizmeta pêşhêzên berztir de ne û bi azadî û zanebûnî dijîn, mirovatî dê hema bênirx bûya; bi pêşketina bi rêbaza xwe ya xwezayî ew ê hê demek pirr dirêj li benda bidawîhatina dîroka xwe ya dinyawî bûya. Lê kesên mîna te bi hezar salan zûtir serkêşî û pêşewatiya wê ber bi cîhana rastiya ebedî dikin - û ev yek biserketin û bidestxistina we ya berz û bilind e. Bereketa Yezdan, ku di kesên din de raketî û di xewê de ye, di we de geş bûye.

- De îcar mebest û armanca jiyana ebedî çi ye? Kovrîn pirsî.

- Mîna her tişta din jî: zewq. Zewqa rastîn ji zanînê, û jiyana ebedî bêhejmar û bêdawî kaniyên zanînê dide. Tam ji ber hindê ye ku hatiye gotin: di mala Bavê min (*mebest jê Yezdan e -çapa kurdî*) de pirr jîngeh hene.

- Xwezî te bes bizaniya ka çi qas dilhebîn e ku guhdariya te dikim! Kovrîn got û ji xweşnûdiyê destên xwe gemirandin.

- Ez kêfxweş im.

- Lê dizanim: dema tu biçî, pirsa hebûna te bela xwe ji min venake. Tu spêle û xeyalet î, waswas î ku dikevî dilê min. Ango ez ji hêla giyanî de nexweş im, nenormal im?

- Hema bila wisan jî be. Çima nearam bî? Tu nesax î ji ber ku te di ser şiyan û taqeta xwe re kar kiriye û tu westiyî û betiliyî lê ew tenê tê wê wateyê ku te tendiristiya xwe gorî armanc û hedefekê kiriye û nêzîk e ku dem bê ku tu dê jiyana xwe jî gorî û qurban bikî. Û ma tiştek jê baştir heye? Jixwe ew pirrî caran armanca hemû kesên jêhatî û dilcewer e.

- Lê heke bizanim ku ez ji giyaniyê de nexweş im, ma dikarim ji xwe bawer bikim?

- Pa ma tu dizanî ka wan kesên bilîmet û dahî, yên ku hemû dinya jê bawer dike, jî spêle xeyalet nedîtine? Ma te nebihîstiye ku xwenda niha dibêjin ku bilîmetî û dînî xizmên hev in. Heval, tenê kesên jirêzê û celebî normal û sax in. Helwestên li hember serdema me ya hêrsbûyî, mandîbûna zêde, xerabebûna çande û kulturê û hwd. dikarin tenê wan kesan biqehirînin ên ku jê re mebesta jiyanê jiyana vê serdemê ye ango ji wan kesan re ku mirovên rêzî û celebî dinimînin.

- Romiyan gotiye: mens sana in corpore sano. (*bi latînî ye; wateya wê: giyanek sax dikare di bedenek sax de jî bijî - çapa kurdî*)

- Her tişta romiyan an yunaniyan gotiye ne îleh rast e. Hestyariya boşbûyî, bengînî, jihalçûn - bi kurtî, hemû tiştên peyamber, helbestvan an canfîdayên ji bo rêbaz û baweriya xwe tê dikoşin ji kesên din vediqetîne, ji bo hêl û hêzên mirov ên lawirî û heywanane, ango ji bo tendiristiya wî ya bedenî, xerîb in. Dubare dikim: heke tu dixwazî saxlem û sade bî, bikeve nav celeb û garana mirovan.

- Sosret e, tiştên ez pirrî caran ji xwe re dibêjim, tu niha dubare dikî, Kovrîn got. - Tam mîna ku te guhdarî û çavdêriya razdartirîn ramanên min kiribe. Lê em hew li ser min bipeyivin. Mebesta te bi jiyana ebedî çi ye?

Keşîş bersiv neda. Kovrîn çavên xwe li wî gerandin lê êdî rûyê wî nedît: Wesf û çawaniyên keşîş mezin bûbûn û dixwiya mîna ku ew helîbin nav mij û moranê. Paşî ser û dest bi tevayî wenda bûn; laşê keşîş di nav rûniştekê û tarîgewrika êvarê de wenda bû û ew filitî tinetiyê.

- Dilwasî nema! Kovrîn got û xwe kenand. - Mixabin!

Ew bi kêfxweşî û bextiyarî çû hindir. Wan çend gotinên keşîş ne tenê xweheziya wî lê hemû giyanê wî, hemû hebûna wî dimeliqand û xweş dikir. Bibî bijartiyê Yezdan, di xizmeta rastiya ebedî de bî, di nav wan de

bî yên ku bi hezarsalan berî dema xwezayî mirovatiyê bikin hêjayî cîhanek yezdanî, bi gotinek din, mirovan ji berxwedanê, ji guneyan û ji azaran xelas bikî, her tişta xwe - xortaniya xwe, hêza xwe, saxlemiya xwe - gorî rêbaz û baweriyê bikî, ji bo xweşbextiyek gelemper û hevpar canfida bî - ax çi parek berz e, çi karek bextewar e! Paşeroja Kovrîn, paşeroja pak, xama û têrxebat hat bîrê, hat bîrê ka çima ew qas xwendibû û çima wî bi xwe jî yên din perwerde kiribûn, û giha wê encamê ku di gotinên keşîş pirole û derewderxistina rastiyê tine bû.

Tanya li nav baxçe hat pêrgî wî. Ew gihabû hin cilên din li xwe bike jî.

- Hûn li vir in? wê got. - Em wisan li we gerîne, ew qas gerîne... Ma çi li we qewimiye? - Ew mat ma dema çavên xwe li rûyê Kovrîn ê geş û bikêf û çavên wî, yên ku tijî rondik bûn, gerandin. - Hûn pirr xerîb dixwiyin, Andryuşa.

- Ez kêfxweş im, Tanya, wî got û destê xwe danî ser milê keçikê. - Ji kêfxweşiyê jî zêdetir, bextiyar im! Tanya, Tanyaya delal, hûn pêydakiriyek pirr dilhebîn in. Tanyaya delal, ez dilxweş im, pirr dilxweş!

Wî bi şewatî herdu destên keçikê ramûsandin û gudand:

- Aniha ez hin bîskên zelal, ên ecêb, ên din ser ên dinyawî re jiyame. Lê nikarim wan ji we re bibêjim çimkî hûn ê bibêjin ku ez dîn im an jî hûn ê ji min bawer nekin. De ka em ji we biaxivin. Tanyaya delal û dilvîn! Ez ji we hez dikim û hînî hezkirinê bûme. Nêzîkiya we û hevdîtina me ya dehancarî di rojê de têra xwe dilê min guherandiye. Nizanim ka heke ji vir çûm, ez ê çawa bêyî we bijîm.

- Erê herê! Tanyayê xwe kenand. - Piştî du rojan êdî hûn dê me ji bîr bikin. Em mirovên biçûk in, hûn kesek mezin û şandar in.

- Na, ka em jidil bipeyivin! Kovrîn got. - Ez ê we bi xwe re bibim, Tanya. Hûn çi dibêjin? Hûn çi dibêjin? Hûn dixwazin a min bin?

- Erê herê! Tanyayê got û dîsan da xwe ku bikene lê ken jê nehat û çilkên sor hilketin ser rûyê wê.

Nefeskişandina wê gurr bû û ew bi gavên lezgîn meşî lê ne ber bi xanî lê kûrtir bi nav daristanê ve.

- Ez li ser hindê nefikirîme... nefikirîme! wê got û destên xwe badidan mîna ku di bêhêvîtiyê de be.

Lê Kovrîn da pey wê, rûyê wî hê jî geş bû û dipeyivî:

- Ez bêriya wê evînê dikim ku min bi her awayî dixe bin bandor û hikariya xwe, û evînek wisan tenê hûn, Tanya, dikarin bidin min. Ez bextewar im! Bextewar!

Tanya tevizîbû û gêj bûbû, ew ditewî mîna ku di bîskekê de bi deh salan pîr bûbe lê Kovrîn ew wek bedew didît û dilşadiya xwe bi dengbilindî radigihand:

- Ax ew çi qas xweşik e!

**VI**

Ku Yigor Semyonîç ji Kovrîn bihîst ku di navbera wî Tanyayê de ne tenê serpêhatî û hezkirinek hebû lê ew dê herwiha dawet û dîlanekê jî li dar bixin, gelekî paş û pêş hat û çû û da xwe ku nearamiya xwe vebişêre. Destên wî direcifîn, gerdena wî perçivî û xurî, wî ferman da ku hespê wî bi hentûra (erebeya) pêşbaziyê re bê zînkirin û çû derekê. Tanyayê, ya ku dît ka çawa bavê wê bi qamçiyan li pişta hesp dida û ka serê xwe çi qas

kûr, ta guhên xwe jî, daheşandibû şepqeyê xwe, rewşa wî ya kamax fam kir, xwe daxist odeya xwe û hemû rojê girî.

Di sera û giyaxaneyan ve xox û hilû gihabûn jî; dapêçandin û şandina wî fêkiyê xweşviyayî û nazik bo Moskovayê seqbêrî, xemxwerî û karek pirr û dijwar dixwest. Ji ber ku havîn gelekî germ û ziha bû, diviyabû ku her dar bê avdan; pirr dem û kedkar pêdivî bûn, xiştepişta kirmikan bû, kedkaran û ta Yigor Semyonîç û Tanyayê jî ew bi destan dimeriçandin; dilê Kovrîn jî pê radibû û nefretê ew digirt. Di ber her tiştên din re diviyabû ku sparîşên fêkî û şitilên payizê bên pêşwazîkirin û namegeriyek berfire û pirralî bê kirin. Û di vê dema herî pele û ecele de, ku dixwiya kesekî bîskek jî dema betal nîn e, diviyabû dest bi karê zeviyan bihata kirin ku vê yekê jî ji nîvê zêdetir kedkarên baxçe dixwestin; Yigor Semyonîçê reşbûyî, jangirtî û hêrsbûyî ji derekî dilezî ya din û diqîrî ku aniha ew ê biteqe yan jî fîşekekê berbide eniya xwe.

Di ser hemûyê re jî dingeringa rihel û cihêzan ku ew jî li nik Pesotskiyan ne bênirx bûn; çikçika meqes û makîneyên cildirûnê, dûkêlfîrûna ji ûtiyan û lêzokî û kêfkariyên jina cildirû ya hêrsbûyî û bi asanî xeyîdok, serê her kesê di xanî ve dizivirand û gêj dikir. Û mîna ku ji bo acizkirinê bin, her roj mêvan dihatin, diviyabû ew bên xwarandin, kêfandin û ta tika jê bê kirin ku bi şev jî li wir bimînin. Lê hemû ev karê zor bi bêhayjêbûnî, mîna ku di nav tarîmijê de be, dimeşî. Tanyayê wisan hest bi rewşa xwe kir mîna ku evînê û xweşbextiyê bi serdanserî xwe di wê werkiribe tevî ku ew hê ji çardehsaliya xwe ve ji ber sedemekê piştrast bûbû ku Kovrîn ji bilî wê kesek din ji xwe re nagire. Ew diheyirî, zimanlal bû, ji xwe bawer nedikir... Carinan di cî de lehiyek kêfxweşiyê diket dilê wê ku dixwest bifire ser ewran û li wir lavayî Yezdan bike, carinan dihat bîrê ku divê li meha gelawêjê ji mala xwe cuda bibe û bavê xwe bihêle û - Xwedê dizane ka çima - carinan diket dilê wê ku ew bêwec, ne-ti-tişt û bênirx e ji bo kesek ew qas bibandor ê mîna Kovrîn, - û hingê ew dilezî

odeya xwe, derî li ser xwe diqilifand û bi saetan li ser hev digirî. Dema mêvan hebûn, serdanser ji wê re wer dixwiya ku Kovrîn pirr bedew û keşxe ye û ku dilê hemû jinan dikeve wî û jin li hember wê çavnebar û hesûd in, û hingê dilê wê bi kêfxweşî û serbilindiyê tijî dibû, mîna ku hemû dinya ya wê be; lê heke tenê Kovrîn bi kêfxweşî li keçxanimekê bibişiriya jî, Tanya bi behecokî direcifî, dilezî odeya xwe û - dîsan rondikan dibarandin. Van hestan ew bi temamî xistibû bin bandora xwe, wê bi şêweyek makîneyane alîkariya bavê xwe dikir, bala xwe ne dida xoxan, ne kirmikan, ne kedkaran û ne jî wê yekê ku dem çi qas bi lezgînî diborî.

Rewşa Yigor Semyonîç jî hema dişibî ya wê. Ew ji berbanga spêdeyê ta derengiya şevê dixebitî, bênavbirr ji ciyekî dilezî yek din, diqehirî û sebra xwe ji dest dida - û ev yek hemû di cure nîvxewek efsûnkirî de diqewimî. Niha di heman demê de du kesanî hebûn: yek Yigor Semyonîçê rastîn bû ku dema li ravekirinên baxçevan Îvan Karlîç ên li ser guherbariya kar guhdarî dikir, pirça xwe bi bêhêvîtî dixwirand; yê din ê nerastîn, ê bi awayekî nîvsermest bû ku serdanser suhbeta binaverok radiwestand, destê xwe li milê baxçevan dida û dest bi pesnan dikir:

- Çi dibêjî, bêje, lê xwîna mîrasî pirr watedar e. Diya wê kesek ecêb bû, jinek hetabêbes dilcewer, ta bêjî hişmend bû. Kêfxweşiyek mezin bû ku li rûyê wê yê dilçak, zelal û pak, ê ku mîna yê firîşte û melekan bû, bê nerîn. Wê dizanî bi bedewî nîgaran bikişîne, helbest dinivîsîn, pênc zimanên biyanî dizanîn, stran digotin... Rebenê, bi jana zirav mir, Xwedê li giyanê wê were rehmê.

Vî Yigor Semyonîçê nerastîn axîn dikişandin û piştî ku bîskekê bêdeng dima, didomand:

- Dema kurik biçûk bû û li ber dest û xweyîkirina min bû, rûyê wî mîna yê diya wî firîşteyane, ron û tijî pakî bû. Awirên wî, liv û lebatên wî û

şêweyê axivîna wî hindî yên diya wî şirîn û kubar bûn. Pa jîrî û hişmendiya wî? Wî hertim em bi jîriya xwe diheyirandin. Ma çi bibêjim, ma ew ê wek din çawa bibûya zanistvan! Çawa! Û bisekine, tu dê bibînî ka piştî deh salên din ew ê çi be! Ew ê wisan bilind bibe ku tu dê negihî destê wî jî!

Lê di heman demê de Yigor Semyonîçê rastîn serdanser li xwe divarqilî û rûyê xwe mîna yên stemkaran dimirûçand, dest diavêt serê xwe û dest bi qîrînê dikir:

- Wan şeytanan! Baxçe herimand, pûç kir, wêran kir! Baxçe nema! Fermana hilweşîna hemû baxçe ye!

Li aliyê din, Kovrîn karê xwe mîna berê bi zîrekî didomand û hema haya wî jî ji geremol û qerebalixa li dorê tine bû. Evîn mîna petrola biavêjî ser agir bû. Her car, piştî ku wî Tanya didît, bizewq û dilşadî vedigerî odeya xwe û bi heman coşê, ya ku wî Tanya ramûsandibû û jê re li ser evîna xwe peyivîbû, wî dest diavêt pirtûkekê yan jî li destnivîsa xwe kûr dibû. Wê yekê, ya ku keşîşê reş li ser bijartiyên Yezdan, rastiya ebedî, pêşeroja ewreng û muhteşem a mirovatiyê û her wiha gotibû, wateyek taybet, wateyek nerêzî dida xebata wî û dilê wî bi serbilindî, zanaviya ji erka xwe ya berz dadigirt. Wî her hefte carekê yan du caran keşîşê reş di nav baxçe de yan jî li hindir didît û pê re dişêwirî lê êdî van hevdîtinan ew neditirsand, berevajî, ew kêfxweş dikir çimkî ew bi kûrî piştrast û bibîrdoz bûbû ku xeyaletên wiha tenê dihatin seredana kesên bijartî, yên bibandor, yên ku xwe û jiyana xwe gorî xizmet û xebatên pîroz kirine.

Carekê dema firavînê keşîş lê xwiya bû û rûnişt ber pencereya xwaringehê. Kovrîn dilxweş bû û bi hosteyane suhbetek bi Yigor Semyonîç û Tanyayê re dest pê kir ku dizanî mijara gotûbêjê bala keşîş jî dikişîne. Yigor Semyonîç û Tanyayê jî guhdarî kir û bi kêfxweşî bişirîn bêyî tê derbixin ku Kovrîn ne ji wan lê ji dilwasiya xwe re dipeyive.

Di navbera wan rojan de dema rojiyan a ji ber hilketina Meryem Xamayê (*mebest jê diya Hz. Îsa ye - çapa kurdî*) ya ber bi esmanan de hat û piştî hingê êdî dema dawet û dîlanê bû ku li ser daxwaza serhişk a Yigor Semyonîç bi "heytehol û teqereq" ango bi şahiyek bêwêne du rojan li ser hev hat kirin. Bi bihayê sê hezar rubleyan hat xwarin û vexwarin lê ji ber muzîka nexweş a kirêkirî, şingeringa şûşeyan, dingedinga beza piyên xizmetkaran, geremol û qerebalixê kesekî ne dizanî nirxekî bide vexwirekên bihagiran û ne jî xwirekên biçêj û bitam ku ji Moskovayê hatibûn anîn.

## VII

Şevek ji şevên dirêj ên zivistanê Kovrîn xwe di nav nivînên xwe de diqelizand û romanek fransî dixwend. Tanyaya reben, a ku ne-elimîbû jiyana bajar û geremoliya wê ku ji ber hindê êvaran serê wê diêşî, hê ji mêj de di xew çûbû û niha carinan di xew de hin hevokên parçeyî bi lêv dikirin.

Saet bû sê. Kovrîn şemal temirand û xwe pal da; bîskek dirêj wî çav neqandî xwe di nav nivînan de gevizand lê xewê nedikarîbû bi çavên wî bikeve ji ber hindê - bi gotina wî - ku di odeyê ve germ bû û Tanyayê xewn didîtin. Li dorên çar û nîvê wî dîsan şemal hilkir û di heman demê de dît ku keşîşê reş li ser palkursiya li nêzî doşeka wî rûniştî ye.

- Silav, keşîş got û piştî ku delîvekê bêdeng bû pirsî: - Tu niha çi diramî?

- şan û şoretê, Kovrîn bersivand. - Di wê romanê, ya ku min gava din dixwend, de zelamek, xortek xwenda tê teswîrdan; ew bêaqiliyan dike û di nav derd û azarên xwe de zerzepalî dibe û reng lê namîne; bi baweriya min ev kul û derdên wî bêhişî ne.

- Ji ber ku tu hişmend î. Tu guh nadiyê mîna pêlîstokekê ya ku bala te nakişîne.

- Belê, rast dibêjî.

- Navdarî û meşhûrî te naxapînin. Çi xweşî yan hode û sûd an ders û wane tê de heye ku navê te li ser peykelê gorrê bê kolandin madem her dem nivîsê bi zêrkirina wê ve jê bibe? Xweşbextî ye hûn ew qas gelek in ku bîrdanka mirov a qels nikare navên hemûyan di xwe de tomar bike.

- Baş tê digihim, Kovrîn îtîraf kir. - Û ma çi sedem heye ku bên tomarkirin? Lê em ji tiştek din bipeyivin. We mînak ji bextiyariyê. Bext çi ye?

Dema saetê xwe li pêncê da, Kovrîn li ser lêva doşekê, ling li ser merşikê, rûniştî bû û ji keşîş re dipeyivî:

- Berê zelamek bextewar ji xweşbextiya xwe bizdî û behecî - bextiyariya wî ew qas pirr bû - û ji bo ku xwedayan dilnerm bike, gultîlka xwe gorî wan kir. Te bihîstiye? Mîna Polykrates, bextiyariya min jî hêdî hêdî min xemgîn dike. Ji min re xerîb û seyr e ku ji spêdeyê ta derengî şevê tenê hest bi kêfxweşiyê dikim, ew min dadigire û hemû hestên min ên din difetisîne. Êdî nizanim ka xemgînî, kovanî an acizbûn çi ye. Wek dibînî, niha jî nanivim, xewa min nayê lê dîsan jî aciz nabim. Ji dil bibêjim: EZ MATMAYÎ ME.

- De çima? keşîş heyirî. - Ma dilşadî hestek derexwezayî ye? Ma gelo ew nikare rewşa normal û asayî ya mirovan be? Mirov çi qas li astek bilindtir a jîrî û exlaqî be, ew qas zêdetir jiyan jê re zewqek mezintir tîne. Sokrates, Diogenes û Marcus Aurelius jî hest ne bi xemgîniyê lê bi dilşadiyê dikirin. Hewariyek jî dibêje: Bênavbirr kêfxweşiyê bikin. Tu jî kêfxweşiyê bike û bextiyar be.

- Pa heke xweda biqehirin? Kovrîn bi henek got û kenî. - Heke ew hemû xweşiyên jiyanê ji min bişelînin û bihêlin ku ez sarma û birçê bibînim, qet bawer nakim ku hingê bi dilê min be.

Tanya di wê navberê re şiyar bûbû û hem heyirî û hem jî ji tirsê bizdayî li mêrê xwe temaşe dikir. Mêrê wê li palkursiya virtîvala zivirîbû, dikenî û destên xwe li ba dikirin; çavên wî dibiriqîn û di kenê wî de tiştek xerîb hebû.

- Andryuşa, tu bi kê re diaxivî? Tanya pirsî û xwe avêt destê mêrê xwe yê ku heman dest raberî keşîş kir. - bi kê re, Andryuşa?

- Ez? Bi kê re? Kovrîn heyirî. - A bi vî re... Va ye rûniştî ye... - Wî tiliya xwe bi aliyê keşîşê reş ve kir.

- Kes li vir nîn e... kes nîn e! Andryuşa, tu nexweş î.

Tanyayê mêrê xwe hemêzand, xwe li hember wî givaşt û bi destê xwe çavên wî miçandin mîna ku bixwaze wî ji xeyaletan biparêze.

- Tu nexweş î! wê qorr berda girî û ji serî ta binî dilerizî. - Li min bibore, delalê min, lê ji mêj de ye min hay jê bûye ku tu ne temam î... Tu ji hêla giyanî de nexweş î, Andryuşa.

Recif û lerzika Tanyayê dest pê kir Kovrîn jî girt. Wî carek din jî li palkursiyê nerî ku êdî vala bû, bi lawaziyek zûhatî hem piyan û hem jî destan hesî, tirsî û dest pê kir cil li xwe kirin.

- Tişt nabe, Tanya, tişt nabe, ew lerzokane minminî. - Bi rastî jî ez hinekî ne li ser xwe me... dem e ku aşartîş û îtîraf bikim...

- Min hê ji mêj de hay jê bûye... û bavo jî hay jê bûye, Tanyayê got û di ber re tê dikoşî ku xwe bihedinîne. - Tu bi xwe re suhbetê dikî, bi awayek seyr dibişirî... ranakevî. Oy Xwedêyo, Xwedêyo, me biparêze! wê di xofî û

erjengiya xwe de got. - Lê netirse, Andryuşa, netirse, ji bo Xwedê, netirse...

Tanyayê jî dest pê kir cilên xwe li xwe kirin. Yekem car niha, dema li jina xwe dinerî, Kovrîn di hemû xeteriya rewşa xwe giha, fam kir ka keşîşê reş û suhbetên bi wî re dihatin çi wateyê. Niha jê re zelal bû ku dîn û şêt bûye.

Herduyan, bêyî ku bizanin çima, cilên xwe li xwe kirin û çûn saloneyê: jin li pêşiyê, mêr jî li pey wê. Yigor Semyonîçê hawran û palerîn li ser milan û şemal di destî de li wir bû, li giriyê Tanyayê şiyar bûbû; hingê ew mêvanê zavayê xwe bû.

- Netirse, Andryuşa, netirse... Tanyayê digot û di ber re, mîna ku tayê girtibe, direcifî. - Bavo, ev ê derbas bibe... her tişt dê baş bibe...

Kovrîn wisan nearam bû ku nedikarî bipeyive. Wî xwest bi dengek henekî ji xezûrê xwe re bibêje:

- Min pîroz bikin, wer dixwiye ku min hiş û aqilê xwe ji dest daye, - lê tenê lêvên wî livîn û bi dilêşî bişirî.

Li dorên saet nehê sersaqoyek û kurkek lê hatin kirin, xawliyek lê hat rapêçandin û bi hentûran hat birin nexweşxaneyê. Êdî Kovrîn dest pê kir ku li xwe hişyar be û matî ji xwe bike.

**VIII**

Dîsan bû havîn û nojdar (bijîşk) ferman da ku Kovrîn jiyana xwe ya havînê li derveyî bajar biborîne. Ew sax bûbû, êdî keşîşê reş nedidît û niha dora başkirina kewna bedenî bû. Dema ew li gund li mala xezûrê

xwe dima, pirr şîr vedixwar, rojê tenê du saetan dixebitî, ne mey vedixwar û ne jî cigare dikişandin.

Êvara erefeya Roja Elyas li mala xezûr cejnek dua- û lavakirinê hat lidarxistin. Dema berdest amana bixurê da dest qeşe, bîna goristanê ji salona fire ya kevn hilfûrî û bîna Kovrîn teng bû. Ew derket nav baxçe. Bê ku haya wî li ser gulên bedew û xweşik be, ew li dû serê xwe gerî, rûnişt ser rûniştekê, paşî li nav parkê gerî; ku hat rizdeka çem, daket jêr û demek dirêj li avê nerî û ponijî. Darçamên rûtarî, yên ku par Kovrîn wek kesek ciwan, kêfxweş û çeleng dîtibû, niha nedihumîn jî lê bêliv û bêziman rawestî bûn mîna ku qet Kovrîn nenasin. Û bi rastî jî dijwar bû ku Kovrîn bê nasîn: Serê wî bi dersokê hatibû pêçandin, porê dirêj î bedew êdî lê nebû, livîna wî sist bû, rûyê wî gilovirîbû û spîçolkî bûbû.

Bi darpirê ve wî xwe gihand aliyê din ê beravê. Li wî cî, yê ku par lê şilêl hebû, niha xirpûk û xamkêsanê serik jê hatî dirûn dima. Roj ava bûbû, û li qeraxa esman, li şûna rojê, sorîgewrika êvarê diçirisî û pêşbîniya hewayek batund ji bo sibê dikir. Bêdengî bû. Kovrîn bi qasî bîst deqeyan ango ta sorîgewrik vemir, fekir wî cî, yê ku par yekem car keşîşê reş lê jê re xwiya bûbû...

Dema ew bi sistî û ji hêla hindirîn de ne xweşnûd vegerî malê, perestîş û îbadet bi dawî hatibû. Yigor Semyonîç û Tanya li kepirê û terasê rûniştî bûn û çay vedixwar. Wan li ser tiştekî suhbet dikir lê ku wan Kovrîn dît, dev ji wê suhbetê berda, û Kovrîn di rûyên wan derxist ku suhbet li ser wî bû.

- Bawer dikim dema te ye ku şîrê xwe vebixwî, Tanyayê ji mêrê xwe re got.

- Na, ne dem e, mêrê wê got û li derazînka jêrîn a pêlingê rûnişt. - Tu bi xwe vebixwe. Ez naxwazim.

Tanyayê bi xembarî berê xwe da bavê xwe û bi dengek lêborînxwazî ji mêrê xwe re got:

- Te bi xwe jî hay jê heye ku şîr ji bo te bikelk û baş e.

- Belê, pirr bisûd e! Kovrîn xwe kenand. - Ez we pîroz dikim: ji roja înê şûnde wezna min dîsan bi ritleyekê zêde bûye. - Wî bi herdu destan serê xwe givaşt û bi jan gudand: - Çima, çima we matî ji min kiriye û sereguhiya min kiriye? Dermanê bromî, betalî, hemamokên germ, çavdêrî, sereguhî, tirsek ji ber her pariyê ez diavêjim devê xwe, her gavek diavêjim - ev hemû dê dawiya dawîn min bibe nav îdîotîzm û şêtgeriyê. Min hiş û aqilê xwe wenda kir, bi êşa dilwasiya gewretiyê (megalomanî) ketim lê dîsan jî ez kêfxweş, çeleng û ta bextiyar jî bûm, balkêş û taybet jî bûm. Niha ez hişmendtir û qelewtir bûme lê ez bûme mîna her kesek din: ez navincî û rêzî me, ev jiyan li min nayê... Ax, we çi qas stemkarî li min kiriye! Min dilwasî hebûn lê wan kî nerehet dikir? Dipirsim: wan kî nerehet dikir?

- Xwedê bizane tu çi dibêjî! Yigor Semyonîç axîn kişand. - şerm dikim li te guhdarî jî bikim.

- De guhdarî nekin, ma min ji we xwestiye!

Haziriya mirovan, bi taybetî jî ya Yigor Semyonîç hingê Kovrîn hêrs dikir; wî bi hişkî, sersarî û ta bi xwemezinî bersiva xezûrê xwe dida û ji bilî bi awayek henekpêkirin an dijminatî qet lê nedinerî; Yigor Semyonîç diheyirî û wek gunekar dikuxkuxî tevî ku hest pê nedikir jî ku tawanbarê tiştekî ye. Tanya, bê ku tê bigihe ka sedem çi bû ku têkiliyên dilvînî yên bavo û Andryuşa wisan bi tundî û tûjî xetimîbûn, nêzî bavê xwe bû û bi xemgînî li çavên wî nerî; wê dixwest her tiştî tê bigihe lê dîsan jî nedikarî, lê ji wê re tenê ew yek zelal û averû bû ku têkiliyên herduyan roj bi roj xerabtir dibûn, ku bavo di van demên dawîn de pirr pîr bûbû û ku

Andryuşa her hêrsbartir, hişkaxivtir, belakirrtir û bêsebrtir dibû. Tanyayê êdî ne dikarî bikene û ne jî bistre, li ser firavînê tiştek nedixwar, çendîn şevan ranediket ji ber ku li benda belayek erjeng bû, û ji ber vê rewşê ew qas jan dikişand ku rojekê ji dema firavînê ta êvarê bêhiş ket. Li dema perestîşaa berî bîskekê wê hay jê hebû ku bavê wê digirî, û niha, dema ew her sê li terasê rûniştî bûn, ew tê dikoşî ku wê yekê neîne bîra xwe.

- Ax çi qas bextiyar bûn Buda û Mihemed an Shakespeare ji ber ku xizmên wan ên xweşdivî bi sereguhîkirina wan jihalçûn û îlhama wan jê nedistandin! Kovrîn got. - Heke Mihemed dermanê brom bixwara daku demarên xwe bihedinîne, rojê tenê du-sê saetan xebitîbûya û şîr vexwaribûya, nifşên dû wî dê ew kesaniyê ew qas bibandor û balkêş ji seyê wî zêdetir nenasiya. Nojdar û bijîşk, xizm û lêzim wek encam wê yekê dikin ku dawiya dawîn mirovatî êdî bimiçiqe, êdî navincîtî û rêzîtî dê wek bilîmetiyê bên hesibandin û çande û kultur dê biruxe. Xwezî we bizaniya, Kovrîn bi mixabî got, - ka ez çi qas spasdarê we me!

Wî hest bi silikîn û xeyidînek bihêz kir û, ji bo ku zêde nepeyive, rabû ser xwe û çû hindir. Bêdengî bû, di pencereyên vekirî re bîna tûtinê û calapayan xwe dida hindir. Lekeyên tavheyvê diketin ser tekber û rûyê salona berfire yî tarî û piyanoya bidûvik. Havîna par a bextiyar, dema hingê jî bîna calapayê hildifûrî û heyvê şewqa xwe di pencereyan re dida hindir, hat bîra Kovrîn. Ji bo ku xwe bigihîne asta rewşa havîna borî, ew zû çû odeya xwe, cixarek stûr vêxist û bangî xizmetkar kir ku meyê jê re bîne. Lê cixarê tamek tal û dilraker da devê wî û tama meyê jî ne dişibî çêja meya par. Dema mirov jê biyanî bibe, wiha dibe! Ji cixarê û du qurçên meyê serê Kovrîn zivirî û dilê wî jî wisan qutî ku ew neçar ma xwe bispêre dermanê brom.

Ji berî çûna razanê Tanyayê jê re got:

- Bavo te pirr diecibîne. Lê tu ji ber sedemek nediyar dijminatiya wî dikî û ev yek bi kûrî wî xemgîn dike. Ka lê binere: hema ew di çavan re pîr dibe. Ji te lava dikim, Andryuşa, ji bo navê Xwedê ji te lava dikim, ji bo hedana min a giyanî, ji wî re dostane be.

- Ne dikarim û ne jî dixwazim!

- Lê çima? Tanya pirsî û dest pê kir ku ji serî ta binî recifî. - Bêje, çima na?

- Ji ber ku ew dilçepel e, ji ber hindê ye, Kovrîn bi xemsarî bersivand û milên xwe hejandin. - Lê em êdî hew ji wî bipeyivin: nexwe ew bavê te ye.

- Nikarim, nikarim tê bigihim! Tanyayê got û destên xwe li cênîkên xwe şidandin û rasterast li niqteyekê nerî. - Tiştek bêwêne, tiştek erjeng dê bê serê me. Tu guheriyî, tu êdî ne xwe bi xwe yî... Tu, mirovek awezmend, nerêzî, ji ber tiştên biçûk diqehirî, serê xwe dikî nav tiştikên bêwec de... Tiştên wisan bêwate te disilikînin û dixeyidînin ku carinan mirov pirr dihêbitînin û mirov nikare ji çavên xwe bawer bike: ma ew tu yî yan kesek din e? Na, na, nexeyide, sil nebe, wê, ku ji gotinên xwe tirsî, domand û destên mêrê xwe ramûsandin. - Tu hişmend î, baş î, dilcewer î. Tu dê bi dadperwerî li hember bavo tev bigerî. Ew jî pirr baş e.

- Ew ne baş e lê pîstbaş e. Ew mamok û xalokên stranbêj, ew rûyên qencîxwaz, ew rêzdar û birêzên bi awarteyî zêde mêvanperwer, wan hemûyan hem di çîrokan de, hem di şanoyan de û hem jî di jiyana rastîn de carinan bala min kişandiye lê niha ew li ber min dilçepel e. Ew ta gewriya xwe tijî ezperestî û egoîzmê ne. Tişta herî kerixîner di wan de qelewiya wan û xweşbînî û optîmîzma wan e ku hemû serekaniya xwe ji zikê wan digire û ji gamêş û berazan re taybetmendî ye.

Tanya rûnişt ser doşekê û serê xwe danî ser balguh.

- Ev îşkence ye, wê got, û hema ji dengê wê jî diyar dibû ku ew bêsînor westîbû û betilîbû û ku jê re dijwar bû bipeyive. - Ji zivistanê şûnde bîskek bi tenê jî ya aramiyê tine bûye... Ev malwêranî ye, ax, ax Xwedêyo! Ez pirr bi vê yekê diêşim...

- Belê, bêguman ez Herodes im lê tu û bavokê xwe, hûn biçûkokên Misrê ne. Bêguman!

Rûyê wî ji Tanyayê re kirêt û kerixîner dixwiya. Dijminatî û mad û mirûzê tinaz û galte li wî nedihatin. Hê berî hingê Tanyayê hay jê bûbû ku niha tiştek ji rûyê wî kêm bû, tam mîna ku bi kurrkirina porê wî re taybetiyên rûyê wî guherîbin. Tanyayê dixwest tiştek dilêşîn jê re bibêje lê wê xwesteka xerab ew hilceniqand, ew tirsî û ji odeyê derket.

## IX

Kovrîn pişk û kursiya xwe ya serbixwe bi dest xist. Hatibû biryardan ku waneya merasîma vekirina roja duyem a meha berfanbarê bê lidarxistin û daxwiyaniyek jî li ser wê li bersifk û korîdora zanîngehê hatibû daliqandin. Lê wî wê rojê bi birûske û telgrafê ji berpirsê fermî yê xwendekaran re ragihand ku nikare ji ber nesaxiya xwe waneyê bide.

Xwîn ji gewriya wî dihat. Bi kuxînê re her carê piçikek dihat lê di du-sê mehan de bû ew qas ku rewşa wî bêyom xerab bû û ew ket rewşek xewbarî. Vê êşê ew hema qet neditirsand ji ber ku dizanî ku diya wî ya biheştî jî bi qasî deh salan, belkî zêdetir jî, ketibû ber vê vê êşê lê dîsan jî jiyabû; nojdaran jî ew dibawerand ku ew êş ne zêde taloke bû, û ew şîret dikir ku hêrs nebe, jiyanek asayî bijî û kêm bipeyive.

Meha rêbendanê waneya vekirinê ji ber heman sedemê hat paşvexistin û li reşemehê êdî dereng bû ku dest bi kursê bê kirin. Diviyabû ji bo sala bê were paşvexistin.

Kovrîn êdî ne bi Tanyayê lê bi jinek din re dijiya. Jin du salan ji wî mezintir bû û mîna ku Kovrîn zarok be sereguhiya wî dikir. Kovrîn sernerm bûbû; wî bi dilxwazî xwe radestî her tiştî dikir û dema Varvara Nîkolayevna - hevjîna wî - rêwîtiya Krîmê pêşniyaz kir, wî ew jî pejirand tevî ku pêşbînî dikir ku tiştek baş dê pê ve neyê.

Ew êvarê gihan Sevatopolê û li otêlekê rawestîn daku bîna xwe vebikin û roja din rêwîtiya xwe bidomînin Yaltayê. Herdu jî ji ber west û mandîtiyên rêwîtiyê kerixîbûn. Varvara Nîkolayevna çay vexwar, ket nav nivînên xwe û piştî kurtebîskekê di xew çû. Lê Kovrîn xwe pal neda. Hê bi saetan berî ku ji malê bi rê bikeve, nameyek jê re ji Tanyayê hatibû lê ta niha jî bisteyî nekiribû û newêrîbû wê vebike; name niha di paşila wî de bû û bi awayek neşîrîn ew nearam dikir. Bi dilpakî, di kûriya dilê xwe de, wî zewaca bi Tanyayê re wek şaşîtî dihesiband, bi xwe razî û xweşnûd bû ku niha jê dûr ketibû, û bibîranîna wê jinê, ya ku hêdî hêdî bûbû bermayiyek pîroz, a bi dest û bi pî û xwedî çavên biawir, çavên hişmend, - tenê berketin û poşmanî dixist dilê Kovrîn. Destxeta li ser zerfê nameyê anî bîrê ka wî berî du salan çawa bi bêdadî û stemkarî tola valatiya xwe ya giyanî, nerehetiya xwe, tenêtî û bêkesiya xwe û dilnexweşiya xwe li kesên tam bêgune û bêtawan hilanîbû. Di ber re hat bîrê ka wî çawa teza xwe û hemû nivîsarên xwe, yên ku di dema nesaxiya xwe de nivîsîbûn, çirçirandibûn, û çawa pirtikên hûrkirî û avêtî li ber ba pirpirîbûn û bi dar û gulan ve zeliqîbûn.; di her rêz û xetek wan nivîsan de wî armanc û daxwazên sosret û bêbingeh, gef û tehdîdên aqilsivik, bêşermî, dilwasiya meziniyê dîtibûn, û hemû yekê wisan lê kiribû mîna ku ew naveroka guneyên xwe bixwîne; lê ku dawiya dawîn lênivîsk û defter hatibû dirandin û di pencereyê re firîbû derve, wî serdanser hest bi mixabinî û

dilmanê kiribû, çûbû cem jina xwe û pirr tiştên xerab gotibûnê. Ax Xwedêyo, wî bi çi awayî Tanya îşkence kiribû! Carekê, ku xwestibû janê bide Tanyayê, wî jê re gotibû ku xezûrê wî rolek neyînî di pêwendiyên herduyan de lîstibû çimkî ji wî xwestibû ku bi Tanyayê re bizewice; ev gotin bi bêdestî kesekî çûbû guhê Yigor Semyonîç, ew bezîbû hindir, ji ber şaşbûn û bêhişbûna ji sedema van gotinan nikarîbû zimanê xwe jî bigerîne, bi piyên xwe pêqutkane kiribû û nedikarî dengekî ji xwe derbîne mîna ku şelalê zimanê wî girtibe û tele bûbe. Dema Tanyayê li bavê xwe temaşe kiribû, bi dengek dilperitîn qîjîbû. Ev bûyer nikare bê vegotin.

Bi tenê vê destxeta nas ev hemû bîranîn vedijandin. Kovrîn çû şaneşînê; ba nerm û germ bû, bîna deryayê dihat. Ji rûyê kendavoka bi sosret bedew heyv û herwiha şewle û gulopên hawirdor diteyisîn; reng wisan bû ku dijwar e bê teswîrdan. Ew tevheviyek nermîn a keskî û şîniyê bû; geh wisan dixwiya ku avê xwe dixîfand boriyek şîn, geh jî wer dixwiya ku heyv darijiye û li şûna avê wê çivanek û kendavok dagirtiye; - wek giştî ger lê bê nerîn - çi ahengiyek rengan, çi rewşek aram, tena û berz bû!

Dixwiya ku li qata jêrîn, di bin şaneşînê ve, pencere vekirî bûn çimkî deng û kenê jinan zelal û xweş dihat. Îhtîmal e li wir ji bo şevborkekê li hev civîbûn.

Kovrîn dawiya dawîn bisteyî da xwe, name vekir û, ku vegerî hindir, dest bi xwendina wê kir:

"A berî bîskekê bavo mir. Ji bo wê yekê ez spasdara te me, te ew kuşt. Baxçeyê me wêran bûye, niha xerîb û nenasan xwe lê kiriye xwedan, ango tam mîna bavê min ê reben ditirsî qewimî. Ji bo wê yekê jî spasdara te me. Ji hemû dilê xwe te dinifirînim û hêvî dikim ku tu bikevî ber xezebê û ew zû te biruxîne. Ax çi qas derd û kulan dikişînim! Janek bêhesret dilê min dişewitîne... Lanet li te bibare! Min tu wek kesek nerêzî, kesek jîr dihesibandî, min ji te hez dikir lê diyar bû ku tu dîn î..."

Kovrîn nedikarî xwendinê bidomîne, name çirand û pirtikên wê avêtin. Nearamiyekê, ya ku dişibî tirsê, ew girt. Varvara Nîkolayevna li pişt perdeyê raketibû, tenê dengê nefesa wê dihat; ji qata jêrîn deng û kenê jinan ta wir dihat lê Kovrîn wer hest dikir ku ji bilî wî benderuhek di hemû otêlê ve tine bû. Ji ber ku Tanyaya xemê dil lê helandî di nameya xwe de xezeb lê barandibû û hêvî kiribû ku ew biruxe, wî rewşa xwe tengav û dilgivêş hîs dikir û her bîskekê çavên xwe zîqî derî dikirin mîna ku bitirse ku ew hêza nenas, a ku berî du-sê salan ji wî û xizm û lêzimên wî re bûbû sedema belayên mezin, dîsan bê.

Wî ji serboriyan dizanî ku dema mejî nerehet be, baştirîn derman kar e. Diviyabû li ber maseyê rûbine, çawa dibe bila bibe, seqbêrî û hişê xwe bide ser tenê tiştekî. Wî ji gîrfanê xwe yê sor lênivîskek deranî ku karek berhevkî yê biçûk li ser nexişandibû û tam ji bo wê yekê heke bi rê ve bêsebr bibe bi xwe re anîbû. Wî xwe da ber maseyê û dakûrî gelale û miswedeyê; zû wer diyar bû ku rewşa wî ya aram, sernerm û rêkûpêk vedigerî. Lênivîskê bala wî kişand ser pele û eceleya dinyayê jî. Ew fikirî ku divê mirov ji bo her xweşiyek ku jiyan didiyê, yên herî asayî û bêwate jî, çi qas bihayek giran bide. Loma, wek mînak, ji bo ku bikare di çilsaliya xwe de pişk û kursiya xwe bi dest bixe, ji bo ku bibe profesorek sade daku paşî bi zimanek sistopisto, nexweş û giran û di ser her tiştî re jî raman û helwestên biyanî û xerîb bileqleqe, - bi kurtî ji bo ku bigihe pileya xwendayek navincî, pêdivî bû ku ew pazdeh salan bixwîne, bi şev û roj bixebite, li hember nesaxiya giran a giyanî li ber xwe bide, êş û jana zewacek biserneketî bikişîne, pirr celeb bêhişiyan bike û ziyanan bigihîne xelkê ku baştir e niha wan tiştan neîne bîra xwe.

Kêm mabû ku lênivîskê dê dilê wî rehet bikira lê nameya çirandî li erdê bela xwe ji dalepîn û konsentrebûnê venedikir. Ew ji ber maseyê rabû, pirtikên kaxezê civandin û avêtin derve lê bayek sivik ji deryayê ve lê da û ew li ser milbendê pencereyê belav kirin. Dîsan nearamiyê, ya ku dişibî

tirsê, ew girt û dîsan wer dixwiya ku ji bilî wî di hemû otêlê ve benderuhek tine bû... Ew çû şaneşînê. Kendavokê bi çendîn çavên şîn î vekirî, şîn î tarî, rengê pîrozeyî û jîndarî agirîn li wî dinerîn û bala wî dikişandin xwe. Bi rastî jî hewa germ û fetisînok bû, avjenî- û melevanîkirin dê pirr bi kêrî bihata.

Li qata jêrîn li bin şaneşînê serdanser dengê kemanê hat û du dengên nermîn ên jinan dest bi strînê kirin. Tiştek nas di stranê de hebû. Di wê romansê, ya ku dihat strîn, de basa keçek dîn û şêt a bi şevê hin dengên razdar û sirr ji nav baxçe dibihîstin, dengên ew qas bedew û seyr bûn ku wê ew wek ahengek pîroz hesibandin ku ji aliyê me yên mirbar de nayê têgihîn... Nefesa Kovrîn xîrikî, di dil de hestek têrxem hebû lê di heman demê de kêfxweşiyek sosret, kêfxweşiyek şirîn, a ku ji mêj de ji bîr bûbû, di sînga wî de dest bi jenînê kir.

Peykelek reş î bilind, ê ku dişibî bahoz an bazivrokê, li aliyê din ê berava kendavokê xwiya bû. Ew bi lezgîniyek erjeng di ser kendavokê re ber bi otêlê ve dilivî û her bîsk biçûktir dibû; hema Kovrîn negiha xwe ji rêya wî vebide jî. Keşîşê pêxwas, serkol, serspîbûyî, birûreş, dest li ber sîngî, di ber wî re virrî û li nîveka odeyê rawestî.

- Çima ji min bawer nakî? wî bi lomekî ji Kovrîn pirsî lê bi nermî lê nerî. - Heke te bawer bikira ku tu bilîmet î, pêdivî nebû ku te ev herdu sal wiha bi xemgînî û tijîkulî biborandana.

Kovrîn niha dîsan bawer kir ku bijartiyê Yezdan e, bi jîndarî hemû suhbetên wî yên bi keşîşê reş re hatin bîrê û wî dixwest bipeyive lê êdî xwîn ji devî rasterê diherikî sîngî û, ku nizanî çi bike, bi destên xwe sînga xwe gerandin, û xwînê devzendik şil kirin. Wî da xwe ku bangî Varvara Nîkolayevnayê, ya ku li paş perdeyê nivistî bû, bike, tê koşî û ji devê xwe derxist:

- Tanya!

Ew ket erdê û gava rabû ser destên xwe, dîsan bang kir:

- Tanya!

Wî bangî Tanyayê dikir, gazî baxçeyê mezin û gulên wî yên xunavê şilkirî dikir, bangî park, darçamên wê yên rîşgij, bangî zeviya şilêl, zanista xwe ya sosret, xortaniya xwe, bisteyî û wêrekiya xwe, kêfxweşiya xwe, bangî jiyana xwe, ya ku ew qas bedew bû, dikir. Li erdê li rex rûyê wî çavên wî bi lîçek mezin a xwînê ketin û wî di lawaziya xwe ya zûhatî de nedikarî peyvekê jî bi lêv bike lê hestek bextiyariyê ya bêwêne, bêsînor hemû bûneweriya wî dagirtibû. Ji bin şaneşînê ve dengê serenadê dihat lê keşîşê reş ji wî re dipistî ku ew bilîmet e û dê tenê ji ber hindê bimire ku bedena wî ya lawaz teraz û hevsenga xwe ji dest daye û êdî ew nikare xwe li ber barê bilîmetiyê bigire.

Dema Varvara Nîkolayevna şiyar bû û ji paş perdeyê hat, Kovrîn miribû jî û bişirek bextewar î pak li ser rûyê wî mabû.

*1894*

## Kefîsor

Jacob û Wilhelm Grimm

Hebû nebû, keçikek biçûk ya wa şirîn hebû ku her kesî jê hez dikir lê herî zêde ew li ber dilê dapîra xwe delal bû. Dapîra wê herdem diyariyên xweş didanê. Carekê kefiyek sor ya qedîfeyî dayê. Kefî wa spehî bû ku keçikê êdî nedixwest ti tiştek din bike serê xwe ji bilî wê. Lew her kesî êdî navê wê kiribû Kefîsor.

Rojekê dayika wê gotê:

- Ka were vir, Kefîsorka min! Ev pirtek kêkê ye û hin tiştên dî jî yên xweş pê re ne, bilezîne wan ji dapîra xwe re bibe! Ew nesax e û pêdivî bi xwarina saxlemker heye. Niha zû herre hê hewa zêde germ nebûye. Û li xwe hişyar be dema di nav daristanê re derbas dibî û bi rêyê ve bimeşe daku hinda nebî û zembîl jî nekeve. Û ji bîr neke: ji dapîrê re bibêje "Rojbaş!" û ranebe tila xwe bike di nav her tiştî re!

- Ez ê tam wek te gotî bikim, Kefîsorê soz da diya xwe.

Dapîr dûr li nav daristanê dijiya, qederî nîv saetê ji gund. Hê li rexê daristanê gurek pêrgî Kefîsorê hat. Lê Kefîsorê ti hay jê nebû ku gur lawirek şûm e lew nizanî jê bitirse.

- Rojbaş, Kefîsorê, gur silav dayê.

- Rojbaş, rojbaş, guro, Kefîsorê bersiv dayê.

- Kû ve vê serspêdeyê, Kefîsorê?

- Ez ê çim mala pîrê.

- Çi ye di zembîla te de di bin pate ve?

- Kêk û xwarinên din yên xweş in. Me duhî nan pat, û ez ê hinan ji pîrê re bim çiku ew nesax e û bêtaqet e.

- Ka bêje, Kefîsorê, dapîra te li kû dijî?

- Ta mala wê hê bi qasî çarêkekê ji vir dûr e, Kefîsorê ravekir. - Xanîkê wê li bin sê dargûzên mezin e, û li wir hin devî û terraş jî hene. Jixwe noke tu wî cihî dizanî.

Gur di dilê xwe de pûnijî: - Ca ev keçik çi pariyek xweş e. Lê ger ez têra xwe fêlbaz bim, hem ew û hem jî ya pîrejin ji min re ne.

Kêlîkekê ew digel Kefîsorê meşî û paşî gotê:

- Tu dizanî, Kefîsorê, çiqas gulên delal li nav daristanê şên dibin? Çima tu qet li derdorî xwe nanerî? Wa diyar e tu ta nabîzî ka çivîk çend şirîn distirin. Tu wa bilez î dibê diçî dibistanê lê li vir li nav daristanê pirr xweş e.

Kefîsorê li derdorî xwe nerî. Tîrêj di nav çeqên daran re dilîstin, û erd bi gulên rengîn hatibû niximandin. - Bêguman pîrê dê kêfxweş bibe ger destek gulan jê re bibim, Kefîsor pûnijî. - Jixwe niha hê pirr zû ye û ez ê di dema xwe de bigim bineciyê.

Û Kefîsor ji ser rêya xwe bezî nav daristanê. Dema wê kulîlkek xweşik diçinî, yek hê xweşengtir li dûrtir bi ber çavan diket. Ew paşûpêş dibizirî û her kûrtir diçû nav daristanê.

Lê gur firtek li xwe da û xwe gihand xanîkê pîrê û derî qutî.

- Ew kî ye? dapîrê pirsî.

- Kefîsor im, gurî bersivand. - Ez ji te re kêk û tiştên dî yên xweş diînim. Ka derî veke!

- Destikê derî bade! dapîrê bang kirê. - Ez pirr bêtaqet im û nikarim ji nav nivînan derkevim.

Gur destik bada. Derî vebû, û bêyî ti bibêje gur xwe virr avêt dapîrê û ew daqurtand ûrê xwe. Paşî wî cilên dapîrê li xwe kirin, kefiya wê kir serê xwe, çû di bin nivînan ve û perde dan ber.

Di heman demê de Kefîsor li nav daristanê bezîbû û destek gulan yê wa mezin berhev kiribû ku êdî nedikarî hilgire ger mezintir ba. Paşî ew meşî mala dapîrê. Bo wê tiştek seyr û sosret bû ku derî vekirî bû, û wek din jî xanîkê dapîrê li ber wê xerîb dixwiya. - Wey li minê, ez îro çend ditirsim, ew pûnijî. - Bi gelemperî mala dapîrê xweş e û bi kêfa min e lê çima niha wiha ye.

- Rojbaş, pîrê, wê got. Ti bersiv nehatin bîstin.

Kefîsor çû ber doşeka dapîra xwe û perde ji ber vedan. Dapîr li wir paldayî bû, kefî li ser çavan bû û pirr ecêb dixwiya.

- Lê pîrê, Kefîsorê pirsî, çima guhên te wa mezin in?

- Daku dengê te baştir bibîzim, gur bersiv da.

- Lê pîrê, çima çavên te wa mezin in?

- Daku te baş bibînim.

- De çima destên te wa mezin in?

- Daku bikarim te baş bitepînim.

- Lê pîrê, ka bêje, çima devê te wa mezinî erjeng e?

- Daku bikarim te pê bixwim.

Û di heman demê de gur firt xwe ji nav nivînan deravêt û Kefîsorka reben daûrand.

Gurê zikdagirtî dîsan çû di nav nivînan re, di xew çû û tavilê dest bi pixe-pixek bêqam kir.

Wa çêbû ku nêçîrvanek di ber wir re borî. - De welle pîrejinikê xurt dipixe, ew pûnijî. - Divê biçim lê binerim ka derdê wê çi ye.

Yê nêçîrvan çû hindirrî xanî. Dema giha ber nivînan, dît ku işte gur e yê dipixe.

- Ca ez li esmanan li te digerim, tu li erdê bi dest min dikevî, hey gurê gurrî! yê nêçîrvan pûnijî.

Wî tifeka xwe hilda lê di heman bîskê de ket serî ku belkî gurî pîrejinik xwariye û dibe ew niha dikare bêt filitandin. Wî fîşek li gurî neteqand lê li şûnê meqes anî û dest bi dirrandina zikê gur kir. Piştî ku hinek jê dirrand, kefîkek sor diyar bû û paşî keçikê xwe ji zikê gur avêt û got:

- Wey, ez çend tirsîm! Û çend tikîtarî bû di zikê gur de!

Paşî dapîr jî ji zikê gur hat deranîn. Ew sax bû tevî ku bên bi ser ketibû jî.

Lê Kefîsor bi lez û bez çû hin ber û kevirên giran anîn û zikê gurî bi wan dagirt. Û paşî dema gur şiyar bû û xwest bi rê bikeve, kevirên di zikî de wa giran bûn ku ew tavilê şewişî erdê û li wir mir.

Û hemû kêfxweş bûn. Pîstê gur bû para yê nêçîrvan, û dapîrê jî kêka Kefîsorê înayî xwar û pê sax bû. Lê Kefîsor pûnijî:

- Êdî bi tenê qet ji ser rêya xwe neçe ger dayikê li te qedexe kiribe.

## Berfîn

Jacob û Wilhelm Grimm

Carekê li nîveka zivistanê wa qewimî ku dema berfa nerm mîna perrên teyr û tilûran ji nav ewran dibarî, şabanû rûniştî bû û kêlî dikirin li ber pencereya xwe ya milbendên wê ji dara reş ya ebonî.

Dema wê li wir kêlî dikirin û di pencereyê re li derdorî xwe dinerî, wê derziyek kir di tila xwe re, û sê dilop xwîn jê darijîn ser berfê. Dilopên sor li ser berfa spî wa xweşik dixwiyan ku şabanû pûnijî:

- Wey, xwezî min zarrokek heba, spî wek berfê, sor mîna xwînê û reş şibî dara ebonî!

Piştî kurtedemekê keçikek jê re çêbû ku leşê wê mîna berfê çûrr, gepên wê wek xwînê sor û pirça wê şibî dara ebonî reş bû lew navê keçikê kir Berfîn. Lê mixabin dayika wê zû piştî welidîna keçikê mir.

Piştî salekê paşa dîsan zewicî. Şabanûya nû pirr spehî bû lê herwiha pirr zordar û pozbilind jî bû. Wê tehemil nedikir ku ti kes ji wê bedewtir hebe. Wê neynikek sihrî hebû, diçû ber û jê dipirsî:

*Bêje, bêje, awêne,*
*kî ya spehîtirîn e.*

Neynikê bersiv dida:

*Şabanû ya spehîtirîn e.*

Hingê şabanû dilşad dibû çiku wê dizanî ku neynik rastiyê dibêje.

Lê Berfîna biçûk mezin bû û roj bi roj narîntir dibû. Li heftsaliya xwe ew rind bû wek roj û ronahiyê, spehîtir ji şabanûyê bi xwe. Dema şabanûyê carekê ji neynikê pirsî:

*bêje, bêje, awêne,*
*kî ya spehîtirîn e,*

neynikê bersiv da:

*tu bûyî berê bênimûne,*
*niha Berfîn ya spehîtirîn e.*

Vê bersivê şabanû wa bextreş kir ku ew ji çavnebarî zer û kesk bû.

Ji hingê ve şabanûyê ji Berfînê nefret dikir. Kumreşî û hesûdî roj bi roj lê zêde bû û dilê wê dagirt û şabanûyê bi şev û roj hedan û aramî nedît. Rojekê wê bangî nêçîrvanekî kir nik xwe û gotê:

- Keçikê bibe dûr nav daristanê, hew dikarim tehemila wê bikim. Divê wê bibî bikujî û dilê wê û zimanê wê bo min bînî daku piştrast bibim ku ew miriye.

Yê nêçîrvan bi gotina wê kir û Berfîn bir nav daristanê. Lê dema wî kêra xwe derxist, keçikê dest bi girî kir û gotê:

- Wey, nêçîrvanê rind, min nekuje! Ez ê birevim nav dehl û dirrên tarî û êdî ti car venegerrim malê.

Spehîtiya Berfînê nêçîrvan hejand, û wî got: - De ji xwe re bireve, rebenê. Nêçîrvan ji xwe re pûnijî: Jixwe lawirên dirrinde dê aniha wê bixwin. Lê dîsan jî ji wî re dixwiya ku kevirek giran ji ser dilê wî rabûye madem ne neçar e wê bikuje.

Hingê gîskexezalek çargavî nêzî nêçîrvan. Nêçîrvan ew kuşt, dilê wê jê deranî, zimanê wê jê kir û bo şabanûyê birin.

Lê Berfînoka reben tikîtenê li nav daristanê mabû. Ew wa ji ser hişên xwe çûbû ku li pelên hejok yên daristanan dinerî û nedizanî kû ve biçe. Paşî wê dest pê kir bezî û di ser kevirên tûj re, di nav teraşên têrstrî re meşî. Lawirên dirrinde yên daristanê di ber wê re diborîn lê ti ziyan nedigihandê. Ew bezî ta ku êdî piyên wê xwe li ber negirtin û ta tarîtiya êvarê daket. Hingê xanîkek bi ber çavên wê ket û ew çû têve.

Di xanîk ve her tişt biçûk lê pak û bijûn bû. Li nîveka wê mêzeyek biçûk û li ser mêzeyê jî mêzerek sîs hebû. Li ser mêzerê heft sênikên biçûk û li ber her sênîkê jî kefçikek, kêrikek, çetelkek û kûpikek şîrî hebûn. Li ber dîwar li rêz heft doşekok û li ser her doşekê lihêfkek û çarçevek sîs-spî hebûn.

Berfîn hem birsî û hem jî tî bû. Wê piçek nîsk ji her sênîkê xwar, kerikek ji her pirta nanî ve kir û du-sê çip şîr ji her kûpikî vexwarin çiku wê nedixwest hemû para ti kesî bixwe yan vexwe. Û ji ber ku ew pirr westîbû, dilê wê kir rabe binive. Lê ti ji wan doşekan kêrî wê nedihatin. Ya yekem dirêj, ya duyem kurt, ya sêyem req, ya çarem teng bû. Taliyê ew giha doşeka heftem û dibê qey ew tam bo wê hatibû çêkirin. Berfîn hilket ser wê, duaya êvarê xwend û di xew çû.

Bi şev vegerrîn xwediyên malê, heft bejnbost yên bi roj diçûn çiya kanzayan bikolin. Wan heft fanosên biçûk hilkirin û tavilê pê hesîn ku kesek hatibû xanîkê wan ji ber ku her tişt ne wisan bû wek dema ew ji wir çûbûn.

- Kî li ser kursiya min rûniştiye? yê yekem pirsî.

- Kê ji sênîka min xwariye? yê duyem.

- Kê ji nanê min diziye? yê sêyem.

- Kî ketiye ser sênîka nîska min? yê çarem.

- Kê çetela min bi kar aniye? yê pêncem.

- Kê bi kêra min birriye? yê şeşem.

- Kê ji kûpê min vexwariye? yê heftem.

Paşî yê yekem li dor xwe nerî û pê hesî ku şûndewsek li doşeka wî hebû. Ew qîrrî: - Kê li ser doşeka min xwe pal daye?

Bejnbostên din jî li doşekên xwe nerîn. - Kesekî xwe li ser doşekên me jî dirêj kiriye! wan hemûyan hêbetmayî got.

Lê dema mêrkokê heftem bezî ber doşeka xwe, wî Berfîn li ser dît û gazî yên din jî kir. Hemû bejnbost li dor wê doşekê civîn û fanosên xwe bilind kirin ta ku ronahî ket keçika di xew.

- Çi ecêb e, çi seyr û sosret e, keçikek çend naz û nazenîn e! ew bi yekdengî qîrrîn.

Û kêfa wan wa hat ku wan nexwest Berfînê şiyar bikin lê hêla ew bo xwe binive. Bejnbostê heftem, yê ku keçik li ser doşeka wî razayî bû, her saetekê li ser doşeka yek ji hevalên xwe raket ta ku şev li wan borî.

Spêdeyê Berfîn rabû. Dema wê her heft mêrik dîtin, pirr behecî. Lê bejnbost xweşheval bûn û navê wê jê pirsîn. - Ez Berfîn im, wê bersiv da.

- Tu çawan hatî xanîkê me? ew jê pirsîn. Berfînê ji wan re vegot ka çawan jinbava wê dixwest wê bikuje, çawan yê nêçîrvan ew sax hêlabû û çawan ew taliyê bi ser vî xanîkî hilbûbû.

Bejnbost jê pirsîn: - Ma tu dixwazî bermaliya me bikî? Tu dê xwarinê ji me re çêkî, nivînan biniximînî, cilan bişoyî, kêliyan bikî û her tiştî pak û bijûn bikî? Ger tenê bixwazî, dikarî li vir bimînî û ti tişt dê ji te ne kêm be.

- Ji hemû dilê xwe dixwazim, Berfînê bersiv da. Û ew li mala yên bejnbost ma.

Spêdeyan bejnbost diçûn çiyayan li zêrr û kanzayan digerrîn, û êvaran ew dihatin şîvê û nivistinê. Berfîn bi roj li malê dima. Bejnbostên baş ew hişyar dikir û digotê: - Xwe ji jinbava xwe biparêze. Ew ê pê bihese ku tu li vir î. Nehêle ti kes bêt hindirrî malê!

Şabanûyê, ya ku texmîn dikir ku Berfîn miriye, bawer dikir ku êdî bi xwe bûye spehîtirîn jina hemû cîhanê. Rojekê ew li ber neynikê sekinî û got:

*Bêje, bêje, awêne,*
*kî ya spehîtirîn e.*

Neynikê bersiv dayê:

*Tu bûyî berê bênimûne,*
*niha Berfîn ya spehîtirîn e.*
*Ev ji vir dûr e,*
*li nik mêrikên hûr e.*

Şabanû pirr tirsî ji ber ku neynikê herdem rastî digot. Ango yê nêçîrvan şabanû xapandibû, û Berfîn hê jî sax bû. Şabanûyê dest pê kir bipûnije ka çawan keçikê bikuje.

Piştî wê taliyê fêlek peyda kir, wê cilên etarek pîr li xwe kirin û rûyê xwe bi rengan tewizand daku kes wê nenase. Paşî ew di ser heft çiyayan re meşî xanîkê bejnbostan, li deriyê wan da û bang kir:

- Tiştên xweşik bikirrin.

Berfînê serê xwe di pencereyê re derxist û silav kir: - Rojbaş, xanima delal, tu çi difiroşî?

- Tiştên pirr narîn, çît û deziyên rengşirîn, şabanûyê bersiv da. - Ben û dezî û qeytanên tevrengî bo kiras û fistanan. Û wê eşyayê spehî nîşanî Berfînê da.

- Bêguman ez ê bihêlim ev hurmeta çê bêt malê ve, Berfîn pûnijî. Wê derî vekir û gulolikek deziyên delal kirrî.

- Keçika delal, cilên te çendî kirêt in! pîrebokê got. Ka were ez ê qeytanek xweşik bixim çoxikê te!

Bêyî ti xirabî bêt bîra Berfînê, ew li pêşberî şabanûyê sekinî û hêla ew qeytanekê lê bide. Lê pîretewtê kirasê wê wa lê şidand ku hema Berfîn dê fetisîba û mîna mirî be ket erdê.

- De baş bi serê te hat, delalokê, şabanûyê got û lezî derê.

Berêvarê bejnbost vegerrîn malê. Wey, ew çend bizdîn dema wan dilbera xwe Berfîna delal li erdê zerik û bêruh dît! Lê dema wan keçik rakir, pê hesîn ku kirasê wê zêde şidandî ye û qeytana wî piçand. Paşî wê hilm û henaseya xwe anî û bir û hêdî-hêdî bi ser xwe ve hat.

Dema bejnbostan bihîst ka çi qewimiye, wan got: - Ew etarok ji bilî şabanûya şûm ne ti kes e. Dema bi tenê bî, ti kesî bernede hindirr!

Lê dema şabanû vegerrî malê, wê awirek da neynikê û got:

*Bêje, bêje, awêne,*
*kî ya spehîtirîn e.*

Neynikê her wek berê bersiv da:

*Tu bûyî berê bênimûne,*
*niha Berfîn ya spehîtirîn e.*
*Ev ji vir dûr e,*
*li nik mêrikên hûr e.*

Şabanû ji qehrê sor û ji tirsê zer bû çiku ew tê giha ku Berfîn dîsan bi ser xwe ve hatiye.

- Lê ez ê fêlekê lê bikim ku wê bi temamî biruxîne, şabanû ji xwe re pûnijî. Û wê bi hinêra xwe ya sihirbazî şeyek jehrî çêkir. Paşî wê dîsan xwe kir pîrejinek, meşî pişt heft çiyayan nik xanîkê bejnbostan, derî qutand û gazî kir:

- Tiştên baş bikirrin!

Berfînê serê xwe di pencereyê re deranî û gotê:

- Herre ser riya xwe. Nabe derî li ti kesî vekim.

- De hema binere ka min çi heye, pîrebokê got û şeyê jehrî nîşanî wê da.

Berfîn wa pirr bû heyranî şe ku taliyê qane bû derî veke. Dema wan li ser bihayê şe li hev kir, pîretewtê jê daxwaz kir:

- Ka ez pirça te pirr delal şe kim!

Berfîna reben ti hay ji xirabiyê nebû lew bo dilxweşkirina pîrejinê bi daxwaza wê qane bû. Lê dema şe giha pirça wê, bandora jehrê dest pê kir û keçik gêjbûyî ket erdê.

- Niha dawiya te hat, delalokê, pîretewtê got û zû çû ser riya xwe.

Baş bû ku zû bû êvar hat û yên bejnbost vegerrîn malê. Dema wan Berfîn li erdê dirêjkirî dît, tavilê wan şik ji jinbava wê bir, dest bi

lêgerrînan kir û şeyê jehrî dît. Û di cih de ku şe ji nav pirça Berfînê hat hilkişandin, ew hat ser hişên xwe û vegot ka çi qewimiye. Bejnbostan şîret li keçikê kirin ku divê li xwe hişyar be û lê qedexe kir ku qet derî li ti kesî veke.

Di wê navberê de şabanû gihabû malê. Ew rikerast çû ber neynikê û wek adetî jê pirsî:

*Bêje, bêje, awêne,*
*kî ya spehîtirîn e.*

Lê neynikê her wek berê bersiv da:

*Tu bûyî berê bênimûne,*
*niha Berfîn ya spehîtirîn e.*
*Ev ji vir dûr e,*
*li nik mêrikên hûr e.*

Şabanû ji kerb û kînan lerizî û recifî dema ev gotin bihîstin. - Ta ger serê min jî bêt lêdan, divê Berfîn bimire.

Paşî wê xwe vekişand çaviyeya xwe ya dizîkî ku nedihêla ti kes biçiyê, û sêvek çêkir ku tijî jehrek pirr xurt bû. Bi ser ve sêv wa delal bû, wa sor û spî bû ku kê ew dîtiba, dê dilê wî bibijiyayê lê her pirtek jî jê xwariba, dê bêçare miriba.

Dema sêv amade bû, şabanûyê rûyê xwe reng da, cilên jinek gundî li xwe kirin û çû xanîkê yên bejnbost yê li pişt heft çiyayan.

Wê derî qutand. Berfînê serê xwe di pencereyê re derxist û got:

- Newêrim derî li ti kesî vekim. Yên bejnbost li min qedexe kiriye.

- De bi kêfa te ye, jinikê got. - Jixwe ez dikarim van sêvan li derek din jî bifiroşim. Lê de bo tam ha vê yekê ji te re.

- Na, Berfînê gotê, newêrim wergirim.

- Çi, ma tu ditirsî? pîrejinikê hawar kir. - De binere, ez ê sêvê bikim du ker. Kerê sor ji te re û ez ê kerê spî bixwim. Jixwe sêv wa hinêrane hatibû çêkirin ku tenê alê sor jehrî bû.

Dilê Berfînê pirr çû sêva spehî, û dema wê dît ku jinik kerekî jê dixwe, êdî wê xwe ranegirt û destê xwe dirêjî jinikê kir û qedê mayî jê wergirt.

Hê Berfînê pirtek ji sêvê negezandibû, mirî ket erdê. Şabanûyê bi çavên birqok lê nerî, bi bêterzî kenî û tinazî û tirraneyên xwe pê kirin:

- Ey ya spî wek berfê, sor mîna xwînê, reş şibî dara ebonî! Vê carê yên bejnbost dê nikarin te şiyar bikin!

Dema şabanû giha malê, wê ji neynikê pirsî:

*Bêje, bêje, awêne,*
*kî ya spehîtirîn e.*

Û neynikê bersiv da:

*Şabanû ya spehîtirîn e.*

Niha dilê hesûd yê şabanûyê rehet bû. Ew hind razî bû hindî mirovên hesûd bikarin razî bin.

Dema yên bejnbost êvarê vegerrîn malê, wan Berfîn li erdê dît. Bêna keçikê êdî nedihat û nediçû; ew mirî dixwiya. Yên bejnbost ew rakir daku binerin ka tiştek jehrî lê bû. Wan cilên wê vekirin, pirça wê şe kir û ew bi

av û meyavan şûşt. Lê ti tiştî pere nedikir: berdiliya wan niha bi rastî jî miribû.

Paşî yên bejnbost Berfîn danî ser darbestan. Hemû li dor wê kom bûn û bo wê girîn, sê rojan bênavbirr bo girîn.

Paşî wan xwe amade kir ku Berfînê binax bikin. Lê keçik hê jî hênik û jîndar dixwiya û soriyek li gep û alekên wê bû tam mîna dema ew nivistî ba.

- Nabe em wê veşêrin bin axa tarî, yên bejnbost ji hev re got.

Wan tabûtek şûşeyî jê re da çêkirin daku bikarin ji her alî ve wê bibînin. Berfîn di tabûtê de hat bicihkirin û li ser qepaxa wê bi tîpên zêrrîn hat nivîsîn navê wê û ew yek ku ew keça paşa ye.

Paşî wan tabût hilgirt û bir danî ser lêva zinarekî, û herdem yek ji wan nobe lê digirt. Ta firrinde jî li tabûta Berfînê civîn daku li mirina wê bigirîn: pêşî kund, paşî qirrereşk û dawiyê jî kevok hat.

Heyamek dirêj Berfîn bi rehetî di tabûta xwe de paldayî ma. Ew qet neguherrî. Leşê wê hê spî bû wek berfê, gep û alekên wê sor mîna xwînê û pirça wê reş şibî dara ebonî.

Paşî rojekê wa qewimî ku kurrmîrek bi siwarî li nav daristanê digerrî û bo şevê hat xanîkê yên bejnbost. Wî dîtin tabûta şûşeyî li ser zinar, Berfîna tê de nivistî û tiştên li ser qepaxê nivîsandî. Wî got yên bejnbost:

- Vê tabûtê bidin min! Hûn çend pare bixwazin, ez ê bidim we.

Lê yên bejnbost gotê:

- Ger hemû zêrrê dinyayê jî bidî me, em ê wê nefiroşin.

- De pa madem wa ye, wê wek diyarî bidin min! kurrmîr daxwaz kir. - Ez nikarim bijîm ger li Berfînê nenerim. Dixwazim ta hebin rêzê lê bigirim û wê biparêzim.

Dema yên bejnbost gotinên yê kurrmîr bihîstin, dilê wan gelek bi wî şewitî û tabût dayê.

Yê kurrmîr ferman da peyrewên xwe ku tabûtê hilgirin ser milê xwe. Lê de binere ka çi lê hat: dema yên hilgir dimeşîn, ew li qurmê darekê hilingivîn, û hingê pirta sêvê ya jehrî ji gewriya Berfînê vebû. Piştî bîskekê wê çavên xwe vekirin, rabû rûniştinê û matmayî pirsî:

- Ez li kû me?

- Tu li nik min parastî yî, yê kurrmîr got û ji kêfan geş bû.

Û piştî ji Berfînê re hemû got ka çi qewimiye, yê kurrmîr hêvî jê kir:

- Li ber dilê min tu ji hemû malê dinyayê şirîntir î. Bibe jina min û li gel min were keleha bavê min.

Berfîn qane bû, û dema ew gihan mala yê kurrmîr, dest bi amadekariyên dawet û dîlanek şeng û şahane hat kirin.

Jinbava Berfînê jî hat vexwendin dawetê. Piştî wê bihagirantirîn cilên xwe li xwe kirin, ew li ber neynikê sekinî û jê pirsî:

*Bêje, bêje, awêne,*
*kî ya spehîtirîn e.*

Û neynikê bersiv dayê:

*Tu bûyî berê bênimûne,*
*niha bûk ya spehîtirîn e.*

Şabanûya şûm wa qehirî ku êdî nizanî ka çi bike. Pêşî biryar da ku neçe dawetê lê taliyê her nikarî daxwaza xwe ya dîtina bûkê. Lew ew çû dawetê lê dema hat salonê û tê derxist ku bûk Berfîn e, wa qehirî ku ji kelehê bazda, û piştî hingê êdî ti hay ji wê nebûye.

*Wergerandin: 01/2004*

## Xwelîser

Charles Perrault (1628 - 1703)

Carekê zelamek hebû yê jina wî mir û keçikek biçûk bo wî hêla. Piştî çend salan wî zelamî, ku dixwest keça wî bibe hevparî hezkirin û sereguhiya dayikane, dîsan bo xwe jinek anî. Ev jina wî bîjin bû û du keçên têrtemen hebûn. Lê ev jin zor û zalim bû û keçên wê jî ji wê bi xwe kembaxtir bûn. Keçika me ya reben di nav van xizmên xwe yên nû de ketibû belayên mezin. Zirrxwişkên wê hesûdî pê dibir çiku keçik pirr spehî û delal bû û zirxwişk kirêt bûn. Çi ji destê wan hatiba, wan dikir daku keçikê xemgîn bikin. Taliyê ji ber hesûdî û çavnebariya wan jiyana keçikê lê bû barek giran. Wan hemû xwarin bi keçikê dan çêkirin û aman pê dan şûştin. Ji ber ku keçik bi şev û roj di nav tenî û xweliyê de bo wan dixebitî, wan navê wê kir Xwelîser.

Paşayê wî welatî tenê kurrek hebû. Bo paşayî pirr giring bû ku kurrê wî bo xwe jinekê bîne lew wî govend û dîlanên mezin li dar xistin û bangî hemû keç û zeriyên welatê xwe bang kirin daku kurrê wî yek bi dilê xwe ji nav bibijêre. Şahiya wan dê pirr xweş ba û dê sê rojan vekêşaya û hemiyan dixwest biçinê ji ber ku wan dizanî ku dê kurrmîr bo xwe dezgirekê ji nav wan bibîne.

Zirrxwişkên Xwelîserê jî hatin vexwendin. Jin hingê pêve wan ji bilî krias û fîstanên xwe bas ti tiştî nedikir çiku her yekê ji wan bi dizîkî hêvî dikir ku kurrê paşayî wê bistîne.

Dema roja mezin taliyê hat, wan hê zû piştî taştê dest pê kir cilên xwe li xwe kirin. Diviya Xwelîser alîkariya wan bike. Hemû rojê wê pirçên wan şe kirin û bo wan ji vir dibezî wir û di xizmeta wan de bû.

Dema Xwelîserê cilên wan yên ciwan dîtin, dilê wê jî çû govendê. Lê dema wê bi şermokî ji xwişkên xwe xwest ku bihêlin ew jî li gel wan biçe, wan henekên xwe bi wê kirin û pê kenîn.

- Tu û govend? xwişk lê qîjîn. - Ca tu dê li dawet û dîlanan çi bikî, perritiyokê, lewitiyokê! Na, na Xwelîserkê, tu vegerre nav tenî û xweliyê - ew xweş cih e bo te û pindiloşkên mîna te.

û paşî zirrdayik û zirrxwişk bi erebeya li dû du hespan ajot keleha paşayî, û Xwelîser li malê hat hêlan. Ew rûnişt ber agirê kuçkî û dest pê kir hêdîka bo halê xwe girî çiku wê hest pê kir ku pirr xemgîn û bêkes e.

Dema ew li wir rûniştî bû û agir li dor wê gurr bû, wê bihîst ku dengek bangî wê dike:

- Xwelîser, Xwelîser!

Keçikê xwe hilavêt daku binere ka kî ye bangî wê dike.

Li ber kuçkî li pêş wê pîrejineka xwe spartî gopalê xwe hebû. Ebayek dirêjî sor li ber bû, cotek pêlavên binbilind li piyan û kumek reş li serî.

Xwelîserê nikarî bizane ka ev jina nenas ji kû ve hatiye, ne bawer e ku di pencereyê yan derî re çiku herdu jî girtî bûn.

Xwelîser ecêbgirtî ma lew dev ji giriyê xwe berda û rik li wê jinikê nerî.

- Çima digirî? pîrejinê jê pirsî.

- Ji ber hindê digirîm ku dayik û xwişkên min çûne dawet û dîlanan û ez li vir hêlame, Xwelîserê got.

- Ma tu jî dixwazî biçî govendê? pîrê pirsî.

- Belê, dixwazim lê ti bêmifa ye çiku min ji bilî kincirrên perritî ti cil nînin li xwe bikim, Xwelîsera reben kinkinî.

- De ka negirî, keçikê, pîrejinê ji dil gotê. - Ez perî me, parêzera te me. Ger wek ez dibêjim bikî, belkî bikarî biçî dîlanê. Niha bibeze nav bûstanî û bo min xiyarekî bîne.

Xwelîser bezî nav bûstanî û mezintirîn xiyarê dît anî.

- Niha herre xefika mişkan ji bindavê bîne, parêzerê gotê. Xwelîser beziyê. Şeş mişk ketibûn xefikê. Pîrejinê ew xistin pêşiya xiyarî, koremişk kir ajovan û du margîsok li piştê bi cih kirin û paşî destê xwe li raserî wan anî û bir. Hevdem xiyar bû erebeyek pirr şeng û şirîn, mişk bûn şeş hespên spehî, koremişk bû ajovanek xweşeng û margîsok bûn du xizmetkarên dirêj yên porrê wan dondayî û goreyên wan armûşî bûn.

- De va ye, pîrejinê gotê, - ev e erebe daku pê biçî.

- Ax, Xwelîserê got, - ma ez ê çawan biçim govendê! Min ji bilî van cilên kincirr ti nîne!

- Tenê ew? periyê jê pirsî. Wê destek xwe hejand, û kincirrên Xwelîserê bûn delaltirîn cilên cîhanê ku her cûn zêrr û zîv û zirrzirrok û pirrpirrokên bihagiran pê ve dibiriqîn. Morîk û mircan bi pirça Xwelîserê ve çêbûn, û li piyên wê şeng û şirîntirîn şimikên şûşeyî bûn.

- De niha, pîrikê gotê, - niha dikarî biçî govendê. Lê ji bîr neke, berî saet dozde vegerre çiku ger derengtir bimînî, hemû şengiya te dê berze bibe û cilên te dê bibin kincirrên perritî.

Xwelîserê soz da ku bi şîretên pîrika xwe bike. Paşî ew rûnişt di erebeyên spehî de. Xizmetkarê wê derî girt, ajovan şiva xwe veweşand û hesp berev cihê govendê bi rê ketin.

Li hemû eywan û serayê xelk mat û heyirî ma dema keçik giha wir. Dêmê wisan şirîn û erebeyên wa şeng qet nehatibûn dîtin lew her kes diramî ku divê ev keçik dotmîrek be ji dûristanê hatibe.

Hemû berdestiyan û mêvanan xwe da alî daku rê bidin wê. Dema kurrmîrî ew dît, di cih de dil ketê. Hemû êvarê ew li gel Xwelîserê dansî. Di dilê xelkê de ti guman nema ku kurrmîr dê wê bibijêre daku bibe hevsera wî.

Şîreta pîrikê ji bîra Xwelîserê neçûbû lew wê dozde kêm çarêkekê xatir ji kurrmîrî xwest û bi rê ket.

Ew tam berî saet zengila dozdeyê lê bide giha malê. Hevdem hesp bûn mişk, ajovan koremiş, xizmetkar margîsok û erebe xiyar. Dema xwişkên wê hinekî derengtir gihan malê, Xwelîser di kirasê xwe yê perritî de li nav xwelî û teniyê rûniştî bû.

Dotmîra xerîb ya hatibû dawetê pirr bala xwişkên Xwelîserê yên kirêt kêşabû. Hemû roja din ew li ser wê dipeyivîn bêyî ku wan ti hay jê bibe ku ew zeriya bedew xwişka wan ya kêmqedirkirî Xwelîser e.

Êvarê, dema xwişkên Xwelîserê dîsan çûn govendê, tam wek cara berê perî hat nik wê. Dîsan Xwelîser bi erebeyê çû kelehê, vê carê bi cilên hê xweşiktir. Hemû wê êvarê jî kurrmîr bi wê re reqisî.

Lê êvara sêyem kêfa Xwelîserê hind xweş bû ku şîreta pîrikê qet nehat bîrê ta wê tavilê bihîst ku zengila saet dozde lê dide. Hat bîrê ku tam wê bîska zengil bi dawî bêt, cilên wê yên ciwan dê bibin kincirr lew wê bi lez û bez ji dîwanê bazda. Kurrmîr li pey bezî daku bigihiyê. Xwelîser ji tirsan wa zift revî ku kitek şimika wê ya biçûk ji piyî ket.

Kurrmîr sekinî daku şimika ketî rake. Xwelîser jê filitî lê jixwe dem bû jî. Tam dema ew ji hewşa kelehê derket, zengilan hew lê da û pê re jî hemû şengûşoxiya wê hinda bû û dîsan kevnekirasê wê li ber ma.

Dema kurrmîr giha nêrdewanên kelehê, êdî dews jî ji dotmîra narîn nemabû. Dergevanan dizanî ti kes derneketiye, ji bilî keçikek xidam ya bi kincên rîçalok. Kurrmîr neçar bi tenê vegerre nav govendê, pê re tenê kitek şimika şûşeyî wek bîranîn ji zeriya zerîesmer ya dilê wî bi neçarî ketibûyê.

Roja din paşayî hemû peyamber û daholqutên xwe şandin daku ragihînin ku kurrê paşayî dê li gel wê keçê bizewice ya ev şimikê kêrî piyê wê bêt. Lê tevî ku hemû jinên wî welatî xwe li şimikê cerriband, ew kêrî wan nedihat - piyên wan pirr mezin bûn!

Taliyê peyamber hatin wî xanî yê Xwelîser lê dijiya. Pêşî zirrxwişka wê ya mezin şimik cerriband lê qet ne gengaz bû biçe piyan çiku pêçiya wê ya mezin zêde gir bû. Hingê diya wê, ya ku bi coşî li cerribandina keça xwe dinerî, kêr da dest wê.

- Tila xwe ya mezin bibirre, wê gotê, - ca çi ye ger seqet bî madem jina kurrê paşayî bî, jixwe dê her bi erebeyan bigerrî.

Xwişka mezin pêçiya xwe birrî lê bêwec bû, şimik bivê-nevê mezin bû lew taliyê wê dest jê berda û raberî xwişka xwe kir.

Lê bextê xwişka din ne ji yê wê spîtir bû. Erê cihê tilên piyê wê tê de hebû lê paşpanî nediçû tê de. Dayikê xwest ew paşpaniyê bibirre.

- Ca bo çi ye? wê gotê. - Dema jina kurrmîrî bî, ne hewceyî piyan î.

Lê dema wê paşpaniya xwe birrî, şimik êdî zêde mezin bû û kêr nehat lew taliyê wê jî şimik hêla.

Xwelîser bi şermokî hat ji pişt derî yê ku wê xwe lê veşartibû û pirsî ka ew dikare şimikê bicerribîne. Zirrdayik û -xwişk pirr lê enirrîn û xwestin bi lêdan û qutan wê ji wir derbixin lê peyamberan rê nedayê.

- Kurrmîr dixwaze her keç û jina welatî şimikê bicerribîne, wan got û ji Xwelîserê xwest ku rûne û bike piyê xwe.

Û şimik tam kêr wê dihat!

Dema hemû li Xwelîserê civîn, wê kita din jî ya şimikê ji berîka xwe deranî û kir piyê din. Hê ew baş negihiştibû wa bike jî ku kevnekirasê wê lê bû taximek cejnane û ew bû ew zeriya spehî ya dilê kurrmirî li govendê ketibûyê.

Kurrmîr ji kêfa ji hal çû dema ew dît. Wan dawet û dîlanên mezin û şahane kirin.

Lê zirrxwişkên wê wa diqehirîn ku hema dê ji kerb û kînan peqîban. Roj bi roj ew kirêttir bûn ta dawiyê ew wa erjeng dixwiyan ku êdî kesî dil nedikir lê binere. Lê Xwelîser her spehîtir dibû û hemû jiyê xwe jiyanek bextiyarane li gel kurrmîrî borand.

*Wergerandin: 12/2003*

## Rûvî û qirrereşk

Aisopos

Rûviyekî dît qirrek (qijikek) li ser çeqek darê ye û pariyek xweş yê xwarinê di devî de ye, û av bi ser zimanê rûvî ket. Lê gelo rûvî çawan wî parî ji qirrê bixîfîne?

- Ey çengdara pîroz! rûvî bang kirê, - ey firrindeya spehî li ber çavên mirov û xwedayan!

Paşî rûvî pesna şirîniya qirrê, delaliya perr û baskên wê, hinêra pêşbîniya wê û hêjayiyên wê yên dî dan.

- Û ger, rûvî domand, - dengê te jî wek taybetmendiyên te yên din jêhatî be, tava rojê jî ne wek te geş e.

Vê pesndanê wa kir ku qirrê lixavên xwe vekirin daku hinêra xwe ya stranbêjiyê nîşanî rûvî bide. Lê dema devê wê vebû, di cî de pariyê wê ji devî ket, û rûvî ew parî daqurtand.

Paşî rûvî got qirrê: - Min çend pesna delaliya te dabe jî, min bi peyvekê jî ti basa hişmendî û aqildariya te nekir.

## Rûvî û masîgir

Hebû nebû, carekê masîgirek hebû. Wî rojek zivistanê serberfkêşka xwe tijî masî kiribû. Bi dilek xwe mêrik berê xwe da malê. Bi rê ve ew ji dilşadiya xwe stranên kêfî distirandin.

- De ev çi ye li ser rê paldayî? Rûviyek mirî ye!

Mêrikî hespê xwe sekinand û çû nik rûvî. Wî rûvî rakir û danî ser aliyê piştê yê barê xwe yê masiyan û bi xwe li pêşiyê rûnişt. Ca çi kêfa mêrik dihat, wey hawar!

- Kurkê te yê delal, rûvîkê reben, ez pirr hewce me. Ez ê wî bihagiran firoşim, mêrikî ji xwe re digot.

Lê rûviyê fêlbaz qet nemiribû. Kêlîkekê wî xwe li ser barî mit û kirr kiribû. Paşî wî cambazî dest pê kir masî bi rê werkirin. Tavilê serberfkêşk bervala kir. Taliyê rûvî xwe jê avêt û nêçîra xwe berhev kir. Bi dilxweşî wî masiyên tamxweş didan ber dev û lixavên xwe. Firavînek wa çêjdar ev demek bû bi dest Rindoyî neketibû. Yên ji ber mayî jî wî varê kirin û binberf kirin bo dema pêdivî.

Mêrik hemû demê bi ti tiştî nehesîbû, li ser barê xwe rûniştibû û stran digotin. Dema ew giha ber malê, jina wî hat pêş ve.

- Tu li kû bûyî, mêriko, demek wa dirêj?

- De giliyan neke, jinê! Serberfkêşka min miştî masî ye û min rûviyek rind jî aniye. Min ew mirî bi rê ve dît.

Jinik ecêbgirtî li serberfkêşkê nerî lê jixwe ew vala bû.

- Ma tu dîn bûyî, mêriko! Ka masiyek tê de nîne, ca ta rûvî tê de be!

Mêrik pirr ket şermê. Wî serê xwe xwirand û got:

- Welle wa ye. Aniha tê digihim ka wî hîlebazî çi bela anî serê min!

*Çîrokek gelêrî ya fînlendî*

## Sê çîrokên kurt

Aisopos

**Stêrnasek**

Stêrnasek her êvar diçû derve û li stêran dinerî. Dema carekê ew dîsan bi rê ve bû berev derveyî bajar, wî berê xwe dabû esmanan lew hilingivî û ket bîrekê. Rêborekî guh li hawar û gaziyên wî bû, çû nik û gotê: "Wey rebeno! Hind bi sexbêrî li diyardeyên esmanî dinerî ku haya te ji yên sererdî namîne."

**Şêr, ker û rovî**

Şêrekî, kerekî û roviyekî li hev kir û çûn nêçîrê. Dema wan têra xwe nêçîr kir, şêrî got kerî: "Nêçîrê parve bike." Kerî her tişt kir sê pişkên wekhev û tika kir her yek para xwe rake. Lê şêr xeyidî û ker xwar. Paşî şêrî got rovî: "Nêçîrê dabeş bike." Rovî hemû nêçîr kom kir, tenê çend pirtik bo xwe jê rakirin û hemûya dî bo şêrî hêla. Dema şêrî jê pirsî ka rovî ji kê wa elimiye, rovî got: "Ji bextê reş yê kerî."

**Du beq**

Dema av ji lîça jîngeha du beqan hişk bû, ew bo xwe li lêgehek nû gerrîn. Wan bîrek dît û yekê got: "Divê em xwe biavêjinê." Lê ya dî got: "Lê eger ev jî ziwa bû?"